

TORİ Qolinc

# TORİ

Qolinc  
çirokên kurdî

323 TOR 667

4

dengê komal

K.L.64

dengê komal

Institut kurde de Paris

" Ez van çîrokên xwe diyarî zarokên xwe û zarokên tev Kurda dikim ko xwendin û nivîsandina zimanê wana li wana qadaxa bûye."

Institut kurde de Paris

**DENGE KOMAL**

Hejmar: 36/13  
**QOLINC, Tori**

Berpirsiyar  
Redaktör  
Genel Yayın Yönetmeni, **N.BORA**

Navnişan  
Kontakt Adress  
İlişki Adresi,

Amanuensv. 4/320  
104 05 Stockholm/SWEDEN

Postgiro: 477 75 75-4



08/ 16 60 21

Institut kurde de Paris

© Dengê Komal, Tori  
1985/ Stockholm

ISBN 91-86958-01-1

k . L . 64

TORÎ  
Qolinc



çîrokên kurdi

INSTITUT KURDE DE PARIS

ENTRÉE N° 2566

dengê komal

"Ez ji torême. Min dabistana mamos-  
teyîyê qedanad. Destpêka min î nivîsakiyê  
bi helbestan e. Helbestên min di kovarên  
bêjeyî de hatin weşandin. Di vê navîyê de  
pirtukeke min î helbestan di nav weşanên  
kovarekê weşîya. Piştra min dest bi nivî-  
sandina çîrokan kir. Ew jî di çend kovera  
de hatin weşandin. Min qederê du salan di  
rojnameke mazin de jî nivîsandan. Lê tev  
nivîsarê min bi tirkî bûn. Ev sê sal hene  
ko ez bi zimanê xwe yî dêmakî dinivîsim."

Institut kurde de Paris

## PAŞMER

Ismaîl deriyê odê bi hêdika vekir. Serê xwe di ber derî dirêj kire hindirû. Xwe ji dehm de kişand dema ko kesik li hindirû nedît. Qasekê li ber derî rawestî. Di vê navîyê de li şibakê hawîrdora hewşê meyzand. Kesek li ber şibaka jî nedît. Ti deng jî ji hindirûwa nedihat. Bitenê çend mirîşk ji xwe re li wan dera digeriyan. Li dengê derîna, zarokna, an kesna jî hindirû guhê xwe bel kir.

-Tu dibêjî ketine tamara mirinê, got di dilê xwe de. Ev çima deng ji kesekî nayê.

Berî ko bikevî hindirû dîsa li dora xwe meyzand. Bihurî çû li nêzîkî devê deriyê odê runişt. Hawîrdorê odê bi merşa raxistî bû. Di rexê dîwêr de balgihê kelpikî rêzkirî bûn ser merşa. Li balgiha meyzand. Cihê anîşkê milê kesa di ser wan de nedît. Têderxistî bû ko şevê din kes nehata bû odê.

Çend pîr û partalê osman axa hebûn. Qet ji odê kêm nedibûn. Yek ji wana nebana jî, wê yên din li wir bana. Heta ko qenc birçî nebûwana, an demê li-mêjê nehatana, nediçûn malê xwe. Heto derengî şevê xwe li wir gêr dikirin. Li ber çûyinê ji dehm de dirabûn diçûn. Îsmail kengî bihatana odê, wê liqayî wana bibana. Wî ew jî ne li odê bûn.

-Emê bêjin ew kes jî mirin, got Îsmail di dilê xwe de. Ma hemû bi hev re. Çi hewala wana ye. Ew çima ne li vir in.

Qasek bihurt di navîyê de. Osman axa hat odê. Îsmail ji ber rabû, heta ko herî cihê xwe yî hercar rûnî. Lingekî xwe xist bin xwe û rûnişt piştî rûniştina axê. Çavê xwe jê neveqetand.

Destê xwe li doşeka li taništa xwe da Osman axa, de Îsmail bê li ser runî. Bi ken lê meyzand. Îsmail tiştik ji vê cihdan û kenê tê dernexist. Serê xwe tawand û rabû.

-Were cem min, got Osman axa. Wilo ji min dûr nekeve. Min ji zû ve te nedîtî bû. Tu li ku bûyî. Min bêriya te kir.

-Xwedê kêmatîya te nedî, got Îsmail berî ko bê rûnî. Merşê te ji serê me zêde ne. Cihê min baş bû.

-Ev tu li ku bûyî, got Osman axa, piştî ko destê xwe danî ser milê Îsmail. Tu çima xwiya nedibûyî. An tu jî ji min veqetayî. Tu çi dibêjî?

Îsmail ji roja ko xwe dîtî, her car serî li axê dida. Lê ti carî wilo nêzikayî nedabûyê. Çûyin û vegera wîna gelek cara nedîtî bû jî. Lê ew guh nedidayê. Dîsa di çî û di hat. Diva bû ko herkes wî di nav dostê axê de berdîn. Bi vîna wê bi çavekî din li xwe meyizandana. Hingî wê axê banîyana ber çavê xwe, yên ko berî xerabiyê lê bikin. Yan din, diva bû ko ew jî girêdayî deverêkî bî. Xwe li vê deverê biparêzî. Nexwe kes bixweser di vî heyamî de nikari bû xwe biteverênî. Bere axa çûyin û vegera wî nedîtibana. Di hatina wî de bere kesik nederketana ber. Xem nedikir.

-Ez, got Îsmail. Ezê ji te veqetim. Hege xwedê



nivîsandi bî, bere xera bikî. Ez kengî ji te diveqetim. Ko ez zanibim ezê li gund bitênê bimînim, ji ber vê yekê wê mala min di serê min de bihêrîvênin, dîsa ez ji te naveqetim. Min xwe li cem dît. Ma em kurê rojekê ne. Me rojne din dîtî ji vê rojê xeraptir. Me xwe hingî neda alîkî. Vêca emê xwe nûha bidine alîkî. Xwezî te min bikuştana û ew xeber negotana. Mijulîya dinyayê ye. Tu karekî diqedênî, yên din derdikevin. Nexwe ezê çima nehatama.

-Hay xwedê te bihêlî Îsmail. Ma ez te nasnakim. Min ji xwe got. Tu dostê dosta yî. Min heta îroj gelek qenciyê te dîtine. Berî ko ez bêjim, tu têderdixî û digihî hawara min. Herkes vê mêrxasiya te li her deverî dibêjî. Min çend cara di civatê de gotiye gundiyê xwe. Lê ew tê dernaxin. Ew dibejin ko em ji pay axê veqetin, herine deverne din, wê Osman axa qedî. Lê her carî dibînin weke zîçîkekî jipîya me. Tiştîk ji min nayê. Di talîyê de, dîsa ew li tiştê kirî poşman dibin. Divegerin cem min.

Ev ne cara pêşîn bû ko gundiyê ko di benda wî de der jê qerîyan bûn. Giha bûn benda din. Çend mal bitenê li cem Osman axa mabûn. Yên din xwe li Elî axa girti bûn. Yên mayî jî, ji bav û kala, bavikê li cem wa bûn. Ti carî ev bavîk jî wî nediveqetîyan.

Herkes wan bavîkan nasdikir. Zanibûn ko mala wana li mîratê bigerênin, dîsa ji Osman axa nediqerîyan. Lê dîsa der ji wana nediqerîyan. Hecar li wana dixistin, de ew jî ji Osman axa biveqetin, wîna bixwe ser bihêlin. Ew jî her piştî lêdana xwe, diçûn cem axa, gazinê xwe dikirin. De wana biparêzî. Lê her carî bi teqîlik şîreta divegerîyan. Hew kari bû mirovê xwe biparêzî.

-Li min nakevî ko eqil bidime te. Lê ko ez bim, guh nadim tiştê buyî. Bihna xwe farah bike. Tu gundiyê xwe ji min çêtir nasdikî. Tê dît ko ser tiştêkî netişt ji te qehirîn, veqerîyana benda din. Te dît li vir, te dît li devara din. Weke gokê ne. Ji xwe re diçin û tîn. Ev ne carîk bitenê û ne cara talî ye. Ji dema ko tê bîra min ev wilo ye. Edî nûha der ji wana biqere. Qederekê ji xwe re li wana meyzêne. Ma hindîk anîn serê Elî axa. Wana di zivînga, di deşta

de derxistin. Hêj bav u birayê Elîk li destê ne. Ev du sal hene ko Elîk vegerîyaye. Tu dibêjî ne ew bûn ewqas tişt li wan het kirin, an ne ew bûn ewqas tişt li axê xwe kirin. Wî nûha dîsa vegerîyana cem. Dûr, nêzik wê dîsa tiştina bênin serî wî. Ew jî vê yekê xweş zanî. Wî nûha rojê xwe bi wan ra dibûhurênî. Bi eqilê xwe, divê ko cihê xwe qewin bikî. Edî ev wilo ye. Di ka bere qederekê li cem bimînin. Tu dîsa Osman axa, ew jî her tim gundiyê te ne. Maçî bi te bibî.

-Ez vanaqenc zanim Îsmail. Bere jê ra pîroz bin. Bere hawa xwe ji wana bisitênî. Lê gotina min ne ev e. Dilê wana çawa dixwazî, bere wilo bikin. Kesik destê wana negirtî ye. Tu gazina min ji çuyîna wana nîne. Cuwamêrê Elîk jî ji bav û kala axa ye. Vêga darê qentarê di destê kî de bî, yên xurt ew e. Iroj darê qentarê di destê Elîk de ye. Wî nûha ya xwe dikî. Weke ko te dîtî bêminetî ye. Yên ko ji wana bê wê bikin. Ez nabêjim nekin. Derb derba wana ye. Wê derba xwe li me bixin. Lê dema ko kirin. Derba xwe li me dan, divê em nerawestin. Em jî ya xwe bikin. Em xwe û hevalê xwe ji xerabiya wana biparêzin. Ko em destê xwe li wana nehilênin, wê heval û hogirê me gazina ji me bikin. Heye ko yên mayî jî ji me biveqetin. Însana, heye ko li buwerî dordestiya wana xwe nigrin. Ji ber vê yekê divê ko em wana biparêzin.

-Rast e, got Îsmail. Divê ko bitenê nemînin. Her tim destê te li ser milê wana bî. Nexwe weke te gotî, heye ko ew jî hew li ber xwe bidin. Însana. Şîrê xav vexwarîye. Kesnizanî bê wê kengî, çi bikin.

-Wan rojê ha Dalînî hati bûn cem min. Tiştê ko li wana dikin, nayên gotin. Ew e ko xwe li ber wana digrin. Tu zanî ko Dalîn ne weke gundê dî ye. Kesê me yî sê çar gundê dora Dalînê xwe bi hevalê me yî Dalînî digrin. Divên ko wan hevala ji derb bixin û dostê me yî wan gunda jî bikêşinin cem xwe. Ko em arîkariyê nedin hevalê xwe yî Dalînî, wê ew kes ji destê me herin. Dive em destê xwe ji wana jî bişon. Kelihke me ye Dalîn. Divê em wê kelihê ji destê xwe dernexin. Bi gundiyê xwe ez nakevim. Lê gundiyê din ko ji destê me çûn, hingî halê me xerab e.

Birastî hevalê Dalînî hevalne hêja ne. Ne yên ko yek ji wana biqerî. Bê kî wî eqilî kiri bî, cihê derbekî baş neqandîye. Ko vêna bibine serî, wê gelek kesa ji te vêqetênin. Gelek kî ne. Tê tê derxist.

-Cuwamêr xwe xef nakin. Darî çava ya xwe li wana dikin. Tu jî wana nasdikî. Cembelî û sê çar hevalê wî. Ti bêbavî namînî ko bi hevala nakin. Tiştê ko dikin, tu sax bî wan ra dimînî. Hey kesik narabî tiştêkî nabêjî wana, ew e ko hevalê me nakujin.

-Ez Cindîyo û çend hevalê wîna xweş nasdikim. Her yek ji wana weke zahakî mara ye. Zû bi zû nayên qefê. Li ku dera ko tu devê li wir in. Cih û warê wana nîne. Lê biqasî ez zanim, ew û hevalê wî Ziwer axa ne. Li devê wî dimeyzênin.

-Ma Elîk hevalê kî ye. Ew jî xwe bi Ziwer axa digrî. Dîsa bi devê Ziwer axa, wan tiştê dikin. Bi vê yekê Ziwer axa, cihê xwe û cihê Elîk li gunda qewîn dikî. Nexwe Elîk bixweser nikarî waqas tiştê biki.

-Ew jî rast e. Ez gelek cara dibînim. Elîk bi qeflik zilamê xwe ve diçî mala Ziwer axa.

-Çima neçî. Dewlet serê gundîyê min. Piştî ko Elîk li vir xurt bû, derhel Ziwer axa nêzikayî dayê. Nexwe berî nûha ne diçûn û dihatin cem hev. Lê ez dibînim Cembelîyo te jî çavtirsandî kirîye. Tu evqas wasifdana wana dikî.

-Dewlet xwedê û serê te. Ma ez ji kî ditirsim ko ji Cembelîyo bitirsim. Min rewşa wana gote te. De tu wana qenc binasî min got. Nexwe ti dan û sitandina min bi wana ra nîne. Ko bikevin destê, baş e.

-Ma min ji ber çî bakire te. Me tê heta hetayê bi qaçaxkara bilebiki. Xwe li vê deverê jî şanî min bide. Wan derbê xwe yî barazî bê tu li wana jî naxî.

-Ne ew qaçaxîyê nakin. Ev çend sal hene destê xwe ji qaçaxîyê birî ne. Naçin gundê xwe jî. Li bajarê dimînin.

-Ez wê jî zanim. Li deverêkê dizî û şelihandin.

Li deverekê di karê eşirtiyê de ne. Bê berê wana dane ku derê. Ev hemû ji bin serê Zîwer axa derdikevî. Nexwe destê Elîk nedigiha Dalînê. Ew derb yên Zîwer û paşmêrê wî ne. Elîk ji di ber de axatiya xwe dikî. Ew wilo. Yan din. Ma şirte ko kaçaxiyê bikin. Va evqes dizî û şelihandin dibin. Ne dîsa ew vê dizî û şelihandinê dikin.

-Çi darawa bikim. Ez wêna qenc nizamim. Yan din. Dizî û şelihandin ne weke qaçaxiyê ye. Yek zanî qaçaxî wê kengî bê kirin. Wê kî, kîjan rojê, di kîjan rêyî de herî û vejerî. Lê dizî ne wilo ye. Dema ko kes ne bi wana ra bî, nizanî.

-Ma yên ko wana dişiyênî diziyê an şelihandinê jî nizanî. Ne dîsa hin wana dijiyênin. Nexwe diz bi-xweser nikarin tişteki bikin. Divê ko hin wana biparêzênin. Sad derd û belayê şelihandinê hene. Bê paristin kes xwe nadî ber wî karî. Ko dizîya di bizin û çêlekikê bana, rast e. Tê li bin çengê wana bixî û bibhurî. Ya ko ez dibêjim ne dizîke wilo.

Nûha min tê derxist. Wê şelihandinik bibê. Wê ew kes wê şelihandinê bikin. Hin jî wê wana bişiyênî wê şelihandinê. Berî ko wana bişiyênî wê xeberê bidî hikumetê.

-Ha wilo lo. Rehmet li bavê xwe bêne. Bere carna mêjiyê te di van kara de ji bikêr bê.

-Ne tiştik heye, got Îsmail piştî ko qederekê di xwe de hizirî. Tu hêj fermanîyarê cendirma nasnakî. Zilamekî xedar û xwedênenas e. Ko hin li ber dest dihilênin, dîn û har dibî. Tiştik nayê ber çavê wî. Heta ko wana nekuji, der ji wana naqerî. Tu Cembelî û hevalê wê nasdiki. Ko li wana qewimî, rav nayê bîra wana. Heta fişekik bi wana ra bimînî, ji cihê xwe narabin. Ji aliyê desthilandinê kes li ser wana nîne. Wextê ko dest hilanîn, fermanîyar kesî ji wana sax nahêlî.

-Ma ez çi dixwazim malavawo. Ne ez jî li tişteki wilo digirim. De serê wana heft taw bibî û bîkevi cihê derketî. Ko bi razandina hapsê bana, nûha min wana ji zûve razandibana. Wê Zîwer axa di roja roj herane, wana bidana berdan. Hingî wê çi gihî

destê me. Di ser de wê hêj li me dijwar bibin. Di ser de jî wê zanibin ko min li wana kirîye. Lê bi vê yekê kes nizanibî. Wê di navbera min te de bimîni.

-Emê bêjin me ew tişt li wana kir. Ne divê ko yek her tiştî bêni ber çavê xwe. Heye ko yek jî wana sax an birîndar bifilitî. Hingê ezê çi bikim. Di cih de wê bêni li dora rihê min bigerin. Wê tuxmê min jî ser rûwê dinyayê biqelênin. Mala min li mîratê bigerênin.

-Mala te çi ne, got Osman axa bi ken. Te evqas kes di qaçaxiyê de da dest. Hin jî wana hatin kuştin, hin jî wana birîndar bûn. Hemu jî ketin hapisxana. Mala wana li mîratê gerîya. Heta îroj kî bi te çi kir. Çend parsuwê te şikênandin. An çend cara ketine rêya te. Va fermanîyarê cendirma di pişt te de ye. Va ez heme. Ma em herdu têra te nakin. Ko em nikaribin te biparezênin, ma em çima derdikevin holê. Çima em li mala xwe, li ber tifika xwe narunin. Tu qet mitale meke. Ko te jî xwe parist, tiştik nabî. Çawa bî rav karê te ye. Qasekê di vê yekê de jî bazde. Di holê de xuya nebe. Di ser de jî, ne wî tu dibêji fermanîyar yekî jî wana sax nahêlî. Hinî wê kî zanibî ko tu wî.

-Tu divê bere hemû sax bimînin. Bere rihê te jî min ra sax bî. Ma ne rihike. Bere fidî çavê te bî. Jî nav vaqas heval û hogira te bakire min, ew çi bî, ezê bikim. Lê weke min gotî, qaçaxî û ev tişt ne weke hev e. Qaçaxî ne rojik, du roj an carik du car in. Her tim divê ko bê kirin. Aboriya gelek kesa li pišta wî karî ye. Pêwanê kesê ko min wan dest an xwedîya wana, zû bi zû nikarin tiştêkî bi min bikin. Ko tiştêkî wilo kirin, divê di imrê bavê xwe de hew wî karî bikin. An ne divê dengê xwe nekin. Yan din, ne ez bitenê me mixbirê hikumetê. Çend kes din hene. Pêwanê nizanin kî jî me bû. Lê di vê yekê de ezê xwe bidim der.

-Bere rihê te hazar sêlî bî. Tu qet mitala meke. Ez navê tiştêkî bi te bê kirin. Weke ko min got, ko te xwe parist û em herdu bi destê te bigrin. Tiştêkî bi te nayê. Bere vêcarê derbê kurabava bibî-

nin. Bê çi tofan li serê wana dirabî. Lê tiştik dimî-  
nî. Divê ji nûha ve arîkariyê bidime te. Nûha bêje.  
Bê çi ji ra lazim bî, bixwaze. Bere ti kêmasiyê te  
nemînin.

-Bere rihê te ji min ra sax bî. Ti kêmasiyê min  
nûha nînin. Dema ko hebî, ezê bixwazim.

-Edî tu zanî. Ez her tim li ber te me. Ew bi çi  
awa yî bî, ezê xwe bigihênime te.

-Ez zanim.

-Nûha wê li ku bin gelo. Ne çûbin deverne dûr.

-Tu qet mitala meke. Ew li ku bin, wê bêne  
bajêr. Hingî ezê wana bibînim. Van du sê roja bere  
guhê te li min bî.

-Nexwe oxira te ya xêrê bî. Lê bere gelek dûr  
nekevi.

-Ne min got qet mitala meke. Ew li min êdî.  
Nû ko giham bajêr, ezê wana bibînim.

Qederekê serê wana di ber wan de bêdeng man.  
Piştra ji dehm de Îsmail rabû. Xatir xwest û ji odê  
derket. Berê xwe de riya çiyê. Heto ko jê hat ji  
zevî, raz û werza dûr ket di rê de, de kesik wîna  
nebîni. Tiştê ko bi wana wê bidî kirin di rê de anî  
bîra xwe.

Yekser çû dikaneke kesekî nasê wî dema ko giha  
bajêr. Bihna xwe li wir berda. Di vê navîyê de tiştê  
ko wê bê kirin, di kaxezekê de nivîsand. Berda be-  
rika xwe. Rabû, li nav sûkê, li serekê mixbira gerî-  
ya. Wîna jî di dikaneke de runiştî dît. Xwe şanî da  
û ji wir dûr ket. Çû, li devê sikakekê de li berbendî  
wî rawestî. Dema ko di ber de bihurî, kaxez berda  
berîka wî.

Mîrxan û Tehlo li suka jêr, li çayxanê ji xwe re  
pelik dileyistin. Destik ya Mîrxan bû. Kir ko pelika  
bela bikî. Çavê wî li Îsmail ket. Ber bi masa wan  
ve dihat. Mîrxan der ji belakirina pelika qarîya. Pe-  
lik di destê wî de berbendî hatina Îsmail ma.

-Qewet bî ji we re, got Îsmail berî ko kursîkî  
bikişênî bin xwe û li masa wan runî. Kîjan ji we

zora yên dî dibî.

Ma Tehlo karî li ber min dest hilênî, got Mîrxan. Lê wî dîsa ji batalî pê ra dileyizim.

-Na lo, got Tehlo. Te îroj çend cara min bir. Hêj me nû dest pê kir. Tu ji ku zanî ezê li ber te dest hilênim an nahilênim. Hema ko çend hejmar pêş de bî, êdî devê wî vedibî. Di ka min bibe, pişt-ra wasifdana xwe bike.

-Nûha der ji pelika biqere, got Mîrxan. Piştra emê miqeresîya xwe li ser bikin. Nûha xeberne nebihîstî bi xalê Îsmail ra hene. Em gohdarî li wana bikin. Emê hercar wîna li ku bibînin de ixbara ji me ra bêjî.

-Ez jî weke we, got Îsmail. Ma ez diçim ku de ixbar bi min ra hebin. Tiştê heyî em biqasî hevdu zanin. Ne ixbar, lê karekî min bi we re heye. Minê wêna bigotana.

-Ma emê karibin ji bin barê karê ko bidî ber rabin, got Mîrxan. Ne karekî giran bî, tu xwe nadî ber. Heye ko ji me neyê. Tu qenc zanî ko wê ji me bê.

-Wê ji we bê. Weke ko tu dibêjî, ne barekî giran e. Li gora we ye. Xwe wilo li ber min qels nekin. Ez bi we zanim. Ma tiştin hene ko ji we neyê.

-Ne ewqas jî lo, got Mîrxan. Em kesne gundî ne. Ji xeynî kirina barê êzinga û coht çî ji me te.

-Heyla feqîrê xwedê, got Îsmail bi ken. Tu dikî ko dilê yekî li we biêşî. Ma ez kî me ko barê bidim ber we, ji milê we neyê.

-Ko wilo bî, bêje nexwe, got Mîrxan. Ko ji me bê, ser sera û ser çava. Heta nûha te ti kar neda ber me. Polê me nafirî. Bere karekî te jî bi me bê kirin.

-Ne ne li vir. Divê Cembelî û hevalê wê yî din jî hezir bin. Ne karê we herduwa ye û evder ne ci-hê gotinê ye.

-Haylo, got Mîrxan. Nexwe karê bi me hemûwa bê kirin hêj ne giran e. Te xwelî li serê min kiro.

Bi me hemûwa bî, ew ev e ko emê îroj bajêr seri bênin binî.

-Der ji heneka biqere. Birast divê win hemû hazir bin.

-Ew ko ne suxrek bî, got Mîrxan. Tu sax bî em jî bêyî hevala ti karî nakin. Ka bêje me, hege eqle me jê bibirî, emê piştra bêjine wana.

Divê ko hema bê kirin. Lewma divê win bakine wana. Em herine deverekî napandî, li wir biaxivin. Weke ko min gotî, li vir nabî.

-Nexwe bere Tehlo herî bakî wana. Emê li ku hevdu bibînin.

-Hema bere bê xermanên tara wî alî. Emê li wir hevdu bibînin.

Pêşî Tehlo rabû. Di pay de Mîrxan û Îsamîl. Her yek ji wana di rêkê de çûn cihê civanê. Pişta xwe dan hêtê li tanişta xermana. Qederekî din Cembelî, Hutî û Tehlo, her yek di rêkê de hatin. Ew jî pişta xwe dan hetê rêz û runiştin, piştî ko silav dan kesê li wir.

-Tiştê ko ezê bêjime we, got Îsmail. Ew bê kirin an nekirin, divê ko li vir bimînî. Ne min got, ne we ji min bihîst. Ew li we ne xweş jî bê, divê win dilê xwe ji min negirin. Ya min gotineke. Heye li hesabê we bê, he ko neyê.

Piştî axaftina xwe yeko yeko li wana meyizand Îsmail. Kir ko tiştê di ruwê wan de tê derxî. Li berbendî bersiva wana ma.

-Ev çî gotin e, got Cembelî. Ma em zarone. Me digot xalê Îsmail me xweş nasdikî. Lê wî em dibînin ko hêj te me qenc nasnekiriye. Malava em ne bi çavê te li xwe dimeyzênin. Wê gotina te li vir bimînî û çend bost jî wê binerd bî. Tu qet mitala meke.

-Nexwe yeke din, got Îsmail. Di holê de ser sadi heştê kuştin jî heye. Ez vena jî pêşin bêjim. Hege win vê yekê jî didin ber çavê xwe, ezê hingî bêjim. Nexwe dîsa weke ko me hevdu nedît. Emê ji vir ra-



bin, herin malê xwe.

-Ew belkî li gora te bî, got Mîrxan. Tu dibêji ser sadî heştê, belkî li buwarî me dakevî ser sadî bîst. Li gora kesa tê guhertin. Ka tu ya xwe bêje. Hege hêja bî, emê qebûl bikin. Ko ne hêja bî, ma me rihê xwe ji ber besta girtiye. Hingî emê çima xwe bidin kuştin.

-Rihê me ewqas ne erzana xalê Îsmail, got Cembelî. Em xwe ser tiştne netişt nadin kuştin. Hêj em cuwanin. Dinyake sihê wî li ber me ye. Weke ko Mîrxan gotî, divê karê ko te da ber me, hêja bî.

Li Hutî û Tehlo meyzand Cembelî. Diva bû ko ew jî tişteki bêjin. Hutî serê wî li ber, ji erdê zixur didan hev. Bi tapuzka wana diavêt kevîrê di navîva xerman. Zixurin jî di nav tilihê xwe de difirkand. Bihêrs wana di nav tilihê xwe de hûr dikir. Hatina Îsmail ji binî lê xweş nehata bû. Têderxist çavê wî li xerabîya ne ko bi wana bikî. An kesna ji wana bipirsî, bidî girtin.

Hêj berî sê çar roja sê kes di rêya qaçaxê de hatibûn kuştin. Hersê xort gelek hêja bûn. Ew her sê kes hatin ber çavê Hutî. Dilê wî ji nûve li wana eşiya. Kir ku xwe biavêji ser Îsmail, ew nekiri bî jî, ji ber ko mixbir e, bi qirika wî bigrî û biguvêşî. Bîkî ko çavê wî yî belloq ji cihê xwe derkevin. Lê xwe girt. Li berbendî ma ko wê çî bêjî wana. Pişt-ra wê ya xwe bigotana. Ser vê yekê, serê xwe tawand. Domî avêtina zixura kir.

-Nexwe li min bihisênin, got Îsmail. Ez benzînxanê nasdikim. Ev heftik heye ko li ber im. Her roj bi sadan qemyon diçin û tên rêjîyê. Otobos diçin Bexda. Hemû jî wir benzîne disitênin. Ne deh û ne bîst teqşî. Ew jî bi wî awayî. Ji xeynî setandina benzîne, kesê di otobosa de, texsiya de û şifêre qemyona her tim xwarina xwe li wir dixwin. Her yek ji wa, tevlu benzîne, kulmik pira didin benzînxanê. Serê du roja xwedîyê benzînxanê, perê civayî dibin. Işev şeva hatina birina pera ye. De kes tê dernexî, kesik bitenê tê birina pera. Cihê benzînxanê lê gelek baş e. Di bin girekî de ye. Ko yek ji wî girî qulipt, jê û wêde çîya ye. Hema ko em pişt

wî girî ketin, tiştik namîni. Emê têra xwe pera ji wana bisitênin.

-Ew cihê ko tu dibêji, got Tehlo. Ez jî nasdikim. Ji vir gelek dûr e. Lê yên ko ser sadî heştê me bikujin kî ne. Qey pênc şeş kes li benzînxanê bin û li gora ko te gotî, wê yek jî bê de pera bibî. Ev bûne heft kes. Ew bere deh kes bin. Ji serî heya binî bicek bin, dîsa têra me nakin. Veca kuştin li ku ma.

-Ha ez wêna jî bêjim. Min ji serî jibîr kir. Carna cendirmê dewriyê liqemyonê rêjîyê weke rêwingiya suwar dibin. Heye ko di wê kêliyê de dîsa li wada bin. Lewma min got kuştin tede heye.

-Xalê İsmail, got Hutî. Ji kengî ve tu bi wan tiştta mijul î. Tiştê ko ez zanim, tu ne li ser van kara yî. Tu tiştne din dikî. Çawa çêbû, an kî gote te em deverna dişelîhênin. Çima ne hinedî. Ji xeynî me te kesne din nedîtin.

-Ez zanim bê tu çi dibêji, got İsmail. Lê ne weke ko tu zanî ye. Carekê nayê yekî dernekevî, piştra tim wilo dimîni. Carekê min di xortaniya xwe de neyarekî xwe dabû dest. Ji wê rojê ve navê min mixbir ma. Yan din. Ez nizanim win şelihandinê dîkin. Ez vena qenc zanim ko win kesne mîrxas in. Haveyna tirsê di dilê we de nîne. Ji ber vê yekê min gote we. Gotin ji min, kirin ji we.

-Emê bê me qebûl kir, got Hutî. Karê te li nav me çi ye. Em bêjin wê desthilanîn ji te bèn, na. Tê karibî me biparêzî, ew jî na. Di ka vê bêje.

-Te ew rast got xwerzê, got İsmail. Ti desthilanîn ji min nayê. Ez nikarim wê biparêzim jî. Lê ezê şifêrtiyê ji we ra bikim. Jîpa hevalekî min heye. Ezê we heta devereke nêzikî benzînxanê bibim. Li wir berbendî we bimînim. Hege li we ne teqandin, ezê we di wê şevê de we vegeerênim. Hege win ketin şerna, ji xwe winê ji wî girî bigihênin çiyê.

-De baş e, got Mîrxan. Emê bèn. Cihê ko tê li berbendî me bimîni, emê nişe te bikin.

-Ti tiştê li pirsê nemabî, em rabin, got İsmail. Ezê esra dereng jîpê derxim derî bajêr. Li wir ber-

bendî we bîminim. Lê Hutîyo, tu jî wan tiştê di dilê te de, biavêje. Tê derbê xalê xwe îşev bibînî.

-Tu mitala meke, got Cembelî. Em hemu yek in. Em bi ya hevdu dikin. Qerara me dayî, qerar e.

-Ez jî bi wî çavî li we dimeyzênim, got Îsmail li rabûnê. Nexwe nûha bi xatirê we. Emê êvarî dîsa hevdu bibînin.

Cembelî û du hevalê xwe jî rabûn. Hutî bitenê runiştî ma. Ew dîsa bi zixurê ve mijul dibû.

-Xêr e Hutî, got Mîrxan. Hêj zixurê te ne qedîyan. De rabe em herin.

-Ne ko zixurê min neqedîyan, got Hutî. Qeremê min narabin. We qerar da. Ezê biwere bêm. Lê bi şerefa mêrxasa, ew em ji wir sax navegerîyan. Ez gundiye wî bêbavî me. Ji roja roj we mixbirtiyê dikî. Bi xwîn û xerabmalîya xelkê nanê xwe dixwî. Win zanin ko ez ji rihsitên natirsim. Lê ev ne karê mêranîyê ye. Tiştê me qerar lê da, ehmeqîke gelek mazin e û di talîyê de emê nikaribin wê ehmeqiyê rast bikin. Ez weke navê xwe û heft bavê zanim ko berî ko bê cem me, ew çûye xeber daye serekê xwe. Ew jî gihandîye fermanîyarê cendirma. Fermanîyar nûha ji zûve hazîriya xwe kirîye. Dora wêdê bi cendirmê xwe girtîye. Ew ezraîl bavê me bî, em îşev ji wir sax nevegerîyan.

-Emê bêjin ya te rast e, got Cembelî. Me çî bi Îsmailo kir de me bidî kuştin. Di ka wê bêje. Ko qaçaxî bana, emê bêjin wê li gora qaçaxa da girtin pera bisitênî. Wê ji vê yekê çî bisitênî. Ne tiştik nakevî destê wî.

-Hema ez nizanîm. Lê tiştê min gotî, ser sadî sad rast e. Ko tiştik nekevî destê wî jî, bi devê hîna wê vî tiştî li me bikî.

-De rabe mirîyo lo, got Cembelî. Em jî naçin. Me henekîke xwe bi Îsmailo kir. Bere Îsmailê çavbelok heta sibahî li derî bajêr berbendî me bîminî. Hege ko weke tu dibêjîye, wala emê sad bavê wî di tirba reş û tarî de rayênin. Ne wê siba xwîya bibî. Wala em zexelîyê nekin, li rêya cendirma meyzênin,

emê dîsa fendê wî, hege ko rast bî, emê bînin.

Di wê şevê de li buwara benzînxanê, cendirme liqayî kesê ko ji qaçaxê tên dibin. Li wana diqewimênin û yekî ji gundê Selhê tê kuştin.

Institut kurde de Paris

Çayxana suka jêr heta firavîna dereng tiji bû. Bi piranî heta wî demî yên ko dihatin, gundî bûn. Li wir berbenda axa û maqulê bajêr dirawestin. Weke heyama berê hew diçûn malê wana. Civanê wana êdî evder bû. Axa û maqul ji vir didan pêşîya kesê ko karê wana li deriyê hikumetê hebî. Kesik bêyî wana riya saraya hikumetê nedigirt. Herana ji, karê wana nedîqedî. Destlikarê hikumetê guh nedida kesê bixweser hati.

Arifê zani bû nûha wê Haciyê axê li ku bibînî. Nûha ji saraya hikumetê vegeyriyaye. Li çayxana suka navîn, bi çand nasê xwe re, li ser pakêtê cixarê biqunik, bi pelika dileyistin. Nûha çend kes ji li dora wana civî ne. Li berbenda ko dora leyistikê bigîhî wana, de bi Haciyê axê re bileyizin. Di taliyê de bikin ko Hacı wana bibî, de çend pakêta bidinê ko wî dilxweş bikin. Piştra wê Hacı herena malê. Heta derengiya esrê wê razihana. Dîsa wê vegeyriyana çayxana suka navîn.

Tev rojên Hacîyê axê bi vî awayî dibihûrîn. Ti kar û hatina wî nebû ji xeynî vî karî. Aboriya mala xwe bi vî rêyî pêkdianî. Ser navê destlikarê hikumetê bartîl ji gundîya disitand. Hin ji bartîlê dida destlikara, yên din diavêt berîka xwe. Hayê gundîya ji vê yekê nebû. Ji ber ko di ber wan de diçû û dihat minetike mazin li wana dikir. Bi vî awayî cihê xwe yi maqultîyê qewîn dikir. Gundî di bin mineta wî de nediman, bi zembîl û salika meywa, bi sitila şîr û mast, bi têt û turika zad û zevat dianîn jêra.

Arifê yekser çû çayxana navîn, li pay masa Hacî û çend hevalê xwe runiştî rawesta. Qasekê li leyistika wana meyzand.

-Qewet bî, got Arifê, berî ko destê xwe deynî ser milê Hacî.

-Way tu sax bî Arifê, got Hacî. Rune. De tu jî derbê min bibînî. Bê ez çî tofanê li serê wana radikim.

-Ne ez narûnim.

-Tu nerunî tê çawa leyistika min bibînî. Rune de ti jî ji xwe re eqil bigrî. Bê ev leyistik çawa tê leyistin, tu bibînî.

-Ne hewce ye ko ez bibînim. Ez bi derbê te zanîm. Hêj min jîbîr nekirîye.

-De rune lo. Runiştî tê çêtir bibînî. Tiştêkî jî vexwe.

-Ne wextê min li runiştinê nîne. Karekî min bi te ra hebû.

-Xêr e Arifê, got Hacî berî ko pelika ji destê xwe deynî ser masê. Ma karê te jî bi hina ra hebû?

-Ew çima? Her tim karê min bi te ra ye. Ma tu ne mazinê minî jî.

-Ew jî rast e. Lê ma deverin hene ko li ber te girtî bin. Bi qasî ez zanim, tu têra xwe heyî.

-Ne, ne li her deverî. Deverin hene ko destê min gihêjîyê. Ew dever jî wê bi xêra tevbibî.

-Lo aferim ji te ra Arifê. Bi xwedê tu bieqil î.

Nexwe tu navê deverin li ber te girtî bimînin. Yê n ko ji te nehatin, bi arîkariya hine din. Nexwe bi xwedê tu nan ji kesekî ra nahêlî.

-Bi dewlet xwedê û serê te. Ji xwe ez navê min ko karekî min nedîtî bimîni.

-Ne min got, tu bieqilî. Karê kesê xwende ev e. De rune. Ez bi çend destika van cuwamêra bibim. Çend paketne xwe ji wana bibim. Piştra emê meyzênin bê çi karê te bi min ra heye.

-Roj ne qedîyan. Tê dîsa wana bibî. Hema hesê bike ko paketê wana di berîka te de ne. Nûha nebî, siba. Ma tu dibêjî wê ji destê biravin. Qet mitala meke. Wê bi lingê xwe bên li te bigerin.

-Ew jî wilo ye. Lê nûha pakê min nînin. Heta siba ezê çi vexwim? Serê pîrê ez rabim ji berîka xwe perê cixara bidim.

-Dîsa mede heyra. Bere pakê te yî vê rojê ji min bin. Weke ko te min di leyistikê de bir.

-Madem te ev jî da ber çavê xwe, nexwe birastî karê te bi min ra heye. De bêje bê çi ye.

-Ne ne li vir. Divê ko em herin mala min.

-Emê li mala te çi bikin kuro? Tu zilamekî azîbî. Hindîru goşî derve bî. Tu divê em ji vir rabin, herin masake din.

-Tu li azîbiya min nemezêne. Min mala xwe tekkuz kirîye. Bêrî ko bêm, min goştne têr bacan da firnê. Emê xwe têr jî bikin.

-Wala tu xweş dibêjî, lê ev ciwamêrê hanê wê çi bêjin. Wê bi ko ez leyistikê nîvrê bihêlim.

-Ko ji bonî me bî xem nakî, got yek ji kesê leyistikê. Tu çawa bivê, bere wilo bî. Li me nemezê. Weke ko gotî, roj jî li ber me neqedîyan.

-Nexwe de em herin, got Hacî li ber rabûnê. Meyzênim bê çi hewalê te ye.

Hacî da pêşîya Arifê. Baskî mala wî ve çûn pişt ko ji çayxanê derketin. Kir ko karê Arifê wê bidî ber tê derxî di rê de. Lê kir û nekir, tê dernexist.

Arifê mamoste bû. Ji aliyê karê wî yî li hikumetê, bêyî wî jî diqedîya. Di ser de jî mixbirê hikumetê î rêzani bû. Tiştê xef bi piranî jê dihate pirsîn. Hacı bi vê zani bû. Ji ber vê yekê jî, ti karê wî nekirî nedîma. Bi vê mixbirîya xwe di nav xelkê de bû. Lê ti danûsitandina wî bi wan ra nebû. Ew bitênê guhdarî dikir. Carna jî pirsîn ji wana dikir.

-Ew çî bî, got Hacı di dilê xwe de. Wê nûha derkevî holê. Ma ez çîma dilê xwe pê diêşênim.

Arifê da pêşîya Hacı ko nêzikayî dana mala wî. Bîlez çû deriyê girtî jêra vekir. Xwe da alikî de Hacı bibihurî. Devê deriyê mezela runiştinê jî jê ra vekir. Li wir jî xwe da alikî. Di devê mezelê de rawestî Hacı, dema ko çavê wî li zilamê biyan î di hindîru de runiştî ket. Vegerîya li Arifê meyzand Hacı.

-Ez we bidim naskirin, got Arifê de vê holê de. Ev Necdet efendî. Ji Enqera tê.

-Tu bi xêr hatî, got Hacı dema ko baskî zîlam ve çû. Arif hatîna te negotî bû min.

-Ev jî Hacıyê axê ye, got Arifê, dema ko destê hevdu girtin. Ewê ko min qala wî ji te ra kiri bû. Yek ji mazinê bajêr.

-Fermo rune, got Necdet piştî bixêrhatina Hacı lê vegerand. Sandalîk danî ber masê de Hacı runî.

-Xwe ji bonî min şeqî meke, got Hacı. Ez ji malê me.

-Rast e. Mamoste Arif gelek wasifdana te da. Xwîya ye ko gelek hez ji te dikî.

-Ez jî hez ji Arif dikim. Xortekî delal e.

-Win herdu jî ji qenciya xwe dibejin, got Arif bi ken. Lê ezê we qasekê bitênê bihêlim Divê ko ez herim hazirîya taştê bikim. Hey we hevdu naskir. Bawerim ko heta ez bêm win aciz nabin.

-De baş e, got Hacı. Wî em runiştî ne. Lê dereng mekeve. Heye ko mêhvan birçî bî. Ji rêke dûr tê.

-Bi bihna farah, got Necdet. Wî nûha ez ne bir-



çî me. Heta hingî emê qenc birçî bibin. Hingî xwarin wê li me xweştir bê.

-Li Enqera çî heye, got Hacı dema ko Arifê derket.

-Ma wê çî hebî, got Necdet. Tiştê heyî wî di radyoyê di televizyonê de tê gotin. Rojname jî bûyera di roja roj de dinivîsin. Yên mayî jî, karê dewletê ne. Em jî bi wana nizanin. Tiştên xef in. Tiştê heyî li cem we ye. Tu qala wana jî min ra bike.

-Wî te evder dît. Bi qasî qurçikeke tareke Enqere nayê. Wê li vir çî hebî ko qala wê bikim.

-Çawan nînin. Em li Enqere tiştê li vir dibin dibihîzin. Tu çawa bi vê mazinayîya xwe nabihîzî. Nûha ez çawa bawer bibim ko li vir tiştin nabin an neqewimin.

Ser vê pirs û gotinê Hacı qasekî neaxift. Li zilêm meyzand. Kir ko tiştina jî çavê wî tê derxî. Lê tiştik jê halî nebû. "Tiştik di bin zimanê wî de heye, lê çî." got di dilê xwe de. "Di ka emê meyzênin bê çî ye."

-Bi qasî ko ez zanim, li vir tiştik ne bûye an ne qewimî ye, ko bigihî guhê min, an bigihî heta Enqera ko win bibihîzin. Ko hebana, berî herkesî minê bi bihîstana.

-Nexwe bi kurtayî bêjim, got Necdet, berî ko cixarekê pêxî û yekê bidî Hacı. Yek li vir heye. Navê wî Rêzan. Gerek tu wîna nas bikî.

-Çawa nasnakim. Mixaletiyê min e. Ez ne wî bitenê, heft bavê wî nasdikim.

-Nexwe qala wî jî min ra bike. Em di derheqa wî de tiştne nebaş dibihîzin.

-Rêzan, got Hacı, berî ko bi dengê bilind bikenî. Rêzanê me yî belengaz. Nûha tu jî Enqera rabûyî jî bonî Rêzan hatî heta vêdê. Evqas dawestan te jî bonî Rêzan kêşand.

-Kesik dirabî, li vir rêzanîya Kurdîtiyê diajoyî. Em wêna dibihîzin. Weke ko tiştik nebûyî, neqewimî,

em li cihê runiştana, an berî ko rêzan vergerî tevgerê em bihatana ji bingehê wê rêzanê ziwa bikirana. Me kijan ji vana bikirana. Xwe bike cihê me û berciva min bide.

-Ko ez bana. Ez nedihatim.

-Ew çima?

-Ma ne kesin di derheqî Rêzan de tiştin gihandinê we.

-Belê.

-Telefon di bin destê min de bû. Minê ji wan kesan an kesî pirsik bikirana. Li gora wê pirsê minê qerara xwe li hatinê an li nehatinê bidana.

-Hema tu yî. Ev xeber ji te ra hat. Ser vê xeberê te rahişte telefonê. Te ji wana pirsî. Ka dîsa bipirse.

-Minê bi pirsîyana ko ev kesê ko win qala wî dikin, kesekî çawa ye. Çend xwedîyê wî hene. Di nav van xwedîya de gotina wî li çend kesî dibihurî. Ji xelkê bajêr bin, ji xelkê gundî bin, çend kes bi gotina wîna dirabî û dirunî. Pirsê min wê ev bana. Hege bigotana, Rêzan ji van herdu alîya jî xurt e. Gelek kes di pay de hene. Hingî ne ez bitenê, minê Enqere bihêrivandana ser serê wîna. Lê ko bigotana kesekî bitênê ye. Nikarî ji xeynî pîreka xwe kesekî bikişênî alîyê xwe. Hingî ez ji cihê xwe nediqeliqîm. Minê tîrika xwe pêxistana û kêfa xwe meyzandana.

-Em jî zanin ko ev xebat bêyî kesâ nayê kirin. Di vê ko gelek kes di xebatê de bin. Em jî divên vîna zanibin. Ko Rêzan bitênê bana, sehl bû. Menê bihiştana ko şîrê ko ji diya xwe mehtî, ji firnikê wî de beavêjin. Hevalê wî ji me ra pêwistin. Ko me çendik ji wana nas kir, êdî emê di pay de herin. Heto ko em rayê wana ji binê axê derxin û biqelênin. De heta sad bavê wana sax bî hew karibin van tişta bikin.

-Ne dîsa tu têgiheştî gotina min nebûyî. Tu dîsa li gora zaneyîya xwe diaxivî. Gotina min û te ne weke hev in. Ji bonî ko tu qenc halî bibî, ezê bi kurtayî bêjim. Rêzan li vî bajarî kesekî bitênê ye.

Ji xeynî min ti xwedîyê wî li vir nînin. Ko hin bèn di nivê sukê de pêl zikê wî bikin, kesik lê xwedî derkevî. Tev xwedîyê wî li bajarnê din in. Zarokê wî biçûk in. Dimînin ew û jina xwe. Jina wî jî ji bajerekî Tirka ye. Dimîni ew bitenê. Hege bixweser rabî Kurdistankê ava bikî, bihêlin bere bikî. An ne li cehê xwe runin.

-Tu vê na jibîr dikî. Xebata rêzanî ne karê hebûne xwadîya ye. Yan ko tu dibêjî, di eşirtiyê de dibî. Ko eşira te çiqas mazin bî, tu ewqas xurt î. Kes bi karê eşirtiyê ti rêzan ne birîye serî. Emê bêjin hazar xwedîyê wî hene. Hegê ji aliyê rêzanî hemu ne weke hevdu bin, dîsa nikarin tiştêkî bikin. Lê rêzanî ko cih girt, bere tu bitenê bî, tê dîsa bi hazaran kesa di pay xwe de bibî. Nûha yek, siba hazar in. Lewma tu di vê yekê de çewt î.

-Ez vê zanim û vena dibêjim. Rêzanê ko ez nasdikim. Bawerim ko tu qala wî dikî. Iro jîkesekî bitenê ye, wê siba jî bitenê bî. Nabî hazar. Ji ber ko nikarî kesekî bikişênî aliyê xwe. Kesê wêdê ne bi Rêzan dirabin û dirunin. Du bend li bajarê me hene. Kesê me bi rêzanîya van du benda dirabin û dirunin. Ne bi kesekî din.

-Em rêzanîya we yî axatîyê jî, rêzanîya ko Rêzan diajoyî xweş nasdikin. Mercê rêzanîya wê û yan wî jî hev diveqetin. Win bi rêzanîya xwe axatîya xwe diajon. Ew jî girêdayî kesa ye. Ko kesê wê jî nebin, win nikarin axatîya xwe biajon. Ev yek di bin destê we de ye. Lê win nikarin bi rêzanîya xwe, rêzanîya din bixin bin destê xwe. Ev karê dewletê, karê hikumetê ye. Win axa jî di vî karî de, bi teybetî li gel dewletê ne. Dema ko pêwist bû, winê arîkariye bidine me. Xebata ko tê kirin dariçav bikin û di roja roj de bigihêjine me.

Ser daxwazîya arîkariyê zilêm Hacı şaş bû. Berî ko bersivê bidiyê, qasekê li ber xwe meyzand. Li xwe heyifî. Cixarek pêxist. Çend hilmê kûr jê kişand. Pifkire baskî zilêm de. Li zilêm meyzand. Dîsa li xwe heyifî. Ev kesê nezan, serhişk, ewqas sala çawa wana berdest kiri bû. Ne bi xêra axa bana, ma kerî bûn serdestîya xwe li vî gelê belengaz, bêxwedî bi-

kin. Bi xêra wana dewlet û hikumeta wana heta îroj jipîya mabû. Weke ko ev ji wana ra nebes in, dirabin hine din dixwazin. Di ka were ecêbmayî nemîne. Ko zane û şehreza bana, dîsa xem nedikir. Wî tiştê ko dibêjî, ji gava din ve nakevî serê wî. Sad heyf û xebînet li me.

-Efendiyê heja, got Hacî bihers. Ajotina axatîya me ji alikî arîkariya dewletê, hikumetê ye. Ev yek. Yan din. Em ne bi kesa axa an maqul in. Axatî û maqulîya me ji bav û kala ye. Ew em bixweser bîmînin, dîsa em axa an muqul in. Iroj em qels bibin, zanibe, ko em siba xurt in. Ew jî li gora mercê rojê tê guhertin. Hege em jîr bin, em têkiliya xwe bi hikumeta Enqera ra kir, ji xwe ji me xurttir nîne. An ne em têkiliya xwe bitenê bi destlikarê hikumetê î vêdê bikin, em dîsa xurt in. Lê ne weke yan din e. Ev jî girêdayî xurtbûyina hikumeta Enqera ye. Hege ew xurt bî, destê wê bigihî her deverî, hingî em jî xurt in. An ne, em jî qels in. Tu vena bi vî awayî qenc zanibe. Erê, rêzanîya axatî û yan din, li gora dîtina wê ne yek e. Lê em dibêjin, tiştê bêtê me nabî. Her tişt di bin destê me de dihalî. Em nevên, kes nikarî bitevgerî. Rêzanîya rista me weke gera avê ye. Çawa tu qirşekî biavêjî vê gerê, ew qirş hew karibî ji vê gerê derkevî, xelkê me jî wilo ye. Nikarin ji vê gerê derkevin. Ne Rêzan, sad Rêzan bên, heta ko ew ger heye, nikarî kesekî ji cihê xwe biqeliqênî. Lê ko ger rawestî, tiştêkî min li gotinê namînî. Hingî ne Rêzan, herkes karî kesna bi kişênî aliyê xwe û rêzana xwe bi wana ra biajoyî. Lê nûha ne. Ez wê zanim û vê dibêjim. Lê ko te da ser min, ezê hingî bêjim weke te ye. Hingî jî dîsa hertişt weke ko min gotî wê herî, lê hingê emê hevdu xapênin. Winê rabin tiştina bîserê xwe, li gora zaneyîya xwe bikin. Ev yek jî enceq wê bikêrî veqetandina me û we bikî. Yekîtî di nav me de namînî. Ko yekî-tî nebî, winê dest bi gazina bikin. Ko ez bim, bi ya min bî, ezê ji binî der ji Rêzan qerim. Bere tiştne xwe bêjî, weke yên berî xwe. Di talîyê de wê ji gotina xwe birawstî û li cihê runî. Ez çend kesa nas dikim. Ew jî weke Rêzan li hewayê difirîn. Lingê wana ne digiha erdê.

Rojik hat, got rap û ketin. Wî nûha li cihê xwe ru-  
niştî ne. Ji ber ko kesik bi ya wan nekir. Di dilê  
xwe de ji xelkê xeyidî ne. Taliya Rêzan jî ev e.  
Min ev gotin jê ra jî got. Lê ew jî weke te got.

-Ne axayê delal, ew tiştê ko tu dibêjî doh bû.  
Ji wê rojê ve gelek tişt hatin guhertin. Edî kes li  
devê axa û rista civakî ko tu dibêjî neman. Rêzanê  
Marks û qapîtalîzmê hene. Xelk êdî bawariya xwe  
bi wana dikî. Bi hejmarê çardeh rêzan li vada hene.  
Helbet wê yek ji wana karibî wê gera avê bi ra-  
westênî. Hingî emê çi bikin. Ev dewlet, ev hikumet  
ya me hemuwa ye. Carekê neherivî. Emê hemu di  
bin de bimînin.

-Na, tiştik bi me nabî. Ne çardeh, sad û çardeh  
rêzan rabin, nikarin wê gerê birawestênin. Şartê  
rawestina wê hene. Divê pêşî ev rist serobuno bibî,  
piştra. Ew jî girêdayî mercne girîng in. Hêj ew  
merc di holê de nînin. Ji ber vê yekê, tiştik nahêri-  
vî û kesek di bin de namînin. Bimînin jî, dîsa wê Re-  
zanê me di bin de bimînin.

-Nexwe tu ewqas êminî.

-Eminî û hew. Weke çawa zanim navêmin Hacı  
ye. Ne tiştikî din e. Ez vena jî wilo zanim. Tu jî vê  
gotina min li anîşkê mêjiyê xwe binivîse. De qenc  
di serê te de cih bigrî ezê tiştêkî kurt ji te ra bê-  
jim.

-Fermo.

-Kesin ji xelkê me ji bonî aboriya xwe qaçaxiyê  
dikin. Kirina qaçaxiyê ne sehl e. Divê mirinê, keti-  
na hepsê, birindarbûnê bidin ber çavê xwe. Kesin  
diziyê, şelihandinê dikin. Di kirina vê de jî mirin  
her tim li ber çavê wana ye. Ev kes diçin qaçaxiya  
xwe, dizî an şelihandina xwe dikin. Wana diçin di-  
firoşin. Ji serî heya talî xebera me ji wan kesa  
nîne. Ew kes li serê çiyakî xalî, an li qurçikê diru-  
nin, de tiştê gihastî destê wana leva bikin. Divê le-  
vakinê de axayê xwe jî dixin nav levakirinê. Behra  
axê jî diveqetênin û jê ra tênin. Nûha tu bêje. Di  
cihê me de dewlet an hikumet habana, wê ev kes  
behra dewlet an hikumetê bi veqetandana. Çima ev

kes, neditî, nebihîstî behra me diqetênin.

-Ez nizanim bê çima behra we diveqetênin. Lê ez zanim ko di cihê we de hikumet bana, ew kes behra hikumetê ne diveqetandin. Evqas kesê bi zaneyîya hikumetê bazirganîya xwe dikin, bi melyona pere dikevî destê wana. Ev kes bêşa hikumetê nadin. Wê çawa ev kesê ko karê xwe bi dizî dikin wê behra hikumetê veqetênin û bi destê xwe bên bidin hikumetê.

-Ha wilo. Rehmet li bavê xwe bêne.

-Nûha tu nabêjî bê ev gera ko tu dibêjî çawa digerî. Çawa ev kes nikarin ji wê gerê derkevin. Win çî li wana dikin de evqasî bi we bên girêdan.

-Em tiştêkî bi kesekî nakin. Carekê ev ger hatîye danîn. Ji ber xwe digerî û kesa dikişênî hembeza xwe.

-Ne ko ji ber xwe digerî. Dîsa win digerênin. Lê win çawa digerênin, ez wêna divêmin binasim.

-Ma tu zanî bê bavik çî ye?

-Na, nizanim bê bavik çî ye.

-Meyzê hêj tu nizanî navê wê rast bêjî. Ne bavik, bavik.

-Her çawa bê gotin. Ez nizanim bê çî ye ko ne vê rast bêjim.

-Nexwe ka kaxez û qelemekê bide min. Ezê bi wî awayî bi te bidim halîkirin. Bi gotinê tu tê nagihêjî.

Sê xelekê mazin xîşk da Hacî, ser kaxeza ko Necdet dayê. Xelekke mazin jî di nav wan hersê xeleka danî. Pêşî wan xeleka bi xîşkna bi hev ve, piştra wana bi xeleka navî î mazin ve girêda. Nava wan xelekê bi xelekna din biçûk dagirt.

-Ev xelekê mazin ko tu dibînî, got Hacî, heryek ji wana malek in. Xelekê biçûk î di nav wan xeleka de, kesê wê malê ne. Hersê xelek, tevlu xeleka navîn, ji bavkî tèn. Hersê xelek, weke ko te dîtî, pêşî bi hev re, pişt ra bi xeleka navîn ve girêdayî ne.

Xeleka navîn, mazinê bavikê ye. Ev herçar xelek bavikik bitenê ye. Vêca van bavika zêde bike. Wana bi bavikne din bigirêde. Va xeleka bibe gunda. Li gunda jî vê ristê çêke. Tevlu xelekê bajêr bigirêde mazinê bavikkî li bajêr. Ev bavik, bavika axa ye. Vêca vî axayî bibe bigirêda hikumete Enqera. Kesê me ji heft salî, heya heftê salî di nav vê xelean de girêdayî ne. Hedê bavê kî ye ko jî vê xelekê derkevî. Bêyî bavikê xwe tiştêkî bikî. Wê hingî tev kesê bavikê li ser serê wî kesî bicivin û wîna bênin rayê. De ka vêca bêje min. Rêzanê me yî feqîr wê çawa kesa jî nav van xeleka derxî û di pay xwe de bibî. Tu li ya rast meyzênî, Rêzan bixwe di nav vê xelekê de ye. Divê ko jî vê gerê derkevî, lê ne di destê wî de ye.

-Tu dibêjî kesê vêde girêdayî mala xwe, mal girêdayî bavikê xwe. Bavik girêdayî malek jî bavikê xwe. Ew jî girêdayî we ye. Kes bi vî awayî di tevayîya rêzana rista we de ne. Rêzan jî yek jî van kesa ye. Tiştin di dilê wî de hene, lê nikarî bibî serî. Min ev nas kir. Lê hevalê ko pê ra çawa ne.

-Ew jî kesin weke Rêzan in ko hebin. Ez wana nasnakim. Bitenê Rêzan nas dikim. Kesekî gelek hêja ye. Rabûn û runiştina xwe zanî. Bi çavekî xerab gerek em lê nemeyzênin. Hevalê xwe jî dîsa hine jî weke xwe neqandine. Qey jî xwe re li deverêkê runin, di gotina bêjine hevdu, hevdu bi wan gotina qasekê bixapênin û vegezin mala xwe. Tu dibê wê bajarna, gund na serobuno bikin.

-Hema evqas.

-Kêm û ne zêde.

-Ne divê raporekê derheqa wan de bidim. Ezê çî bêjim di wê raporê de.

-Hema tiştê ko em axaftin binivîse. Bêje ko, ti xebat, ti tevger bêyî xelkê nabî. Wî nûha xelk di cihê xwe de ye. Ji xeynî pêkanîna aboriya xwe tiştêkî nayênin bîra xwe. Heta pêncih salî kesek bi vê xebatê nikarî wana jî cihê wana biqeliqênî. Ji ber vê yekê, ser piştê xwe razin û li kêfa xwe meyzênin. Wî Arifê me û çend kes weke wî li vir in. Ko

tiştik bibî, wê gihênine we.

-Nexwe ez vana binivîsim.

-Tu û dilê xwe. Tu divêyî tiştne din pê ve bike. Lê ko ez bana, minê tiştê ko min gotî binivîsandana.

-De baş e, got Necdet. Malî ava.

Piştî taştê bi hev re derketin. Hacî ji ber derî ji wana veqetîya. Dema ko ji ber çayxana ko Rêzan û hevalê wî Bareş lê runiştî bihurîn, Arifê wana şanî Necdet da.

Institut kurde de Paris



Şîrîn rêza ko ji farahiya zeviyê dest pê kiri bû, di nivê zeviyê de hişt. Cehê ko bi herdu desta dirutî nêzikê hev kir. Qunikê wana li hev xist, de axa qunikê wana dawêşin. Piştra di destê rastê de civand, kir baq, danî tanişta xwe. Serê xwe zivirand. Pêşî li baqê dirutî, piştra li cihê zeviyê î nedirutî meyzand. Li rabunê çirisk avêtin ber çavê wê. Dilê wê ji paleyiya xwe kêfxweş bû. Hege ko bi vî awayî paleyiya xwe bikirana, berî ko simbil qenc hişk bibin û bi seridin, wê paleyiya xwe bi qedandana û bikişandana xermana. Pêwanê wê soza ko dayî mêrê xwe, berîko herî welatê xerîb û xurbetê, banîyana cih.

Zeviya wana ji gund qederekê dûr bû. Jibonî ko bi derengî nekevî, berî ko hawîrdor ronahî bibî bigihî zeviyê, di hinkayiya sibahê de teqnik ceh bidiruyî, bi berbanga sibahê şiyar dibû. Di rahişte kurê xwe Usif, wîna bi çavlixew li pişta xwe girêdida, bi destekî di rahişte girêka nanê xwe, bi destê din sitila dew, riya zeviyê digirt. Nexwe dor nivrokî germayî dest pê dikir. Heta danê esrê paleyî bi dilê wê xweş nediçû. Ji germê, ji xuhdanê laşê wê şiş dibû. Destê wê nediçû de paleyiya xwe bikî. Piştî esrê hînayî dest pê dikir. Hingî paleyî xweş ji ber diçû, lè disa ne weke hînkayiya sibahê.

Wê sibahê jî weke sibahê din şiyar bû. Dîsa kurê xwe li piştta xwe girêda. Rahişte girêka nan î sitila dew, riya zevîyê girt. Li derî gund gavê xwe şidand. Bayê sibahê li ruwê dida, di ber biskê wê de xwe berdi gerdena wê, di ser singa wê de bela dibû, hêz didayê. Di pêşîya wê de, dengê gundîyê wê dihat. Ew jî diçûn zevîyê xwe.

Hînikayîya sibahê gêjîtîya xewê ji nav çavê wê bela bibû. Hemet dabûyê. Haveyna dawestana doh li ser laşê wê nehişti bû. Hingî doh dawesta bû, piştî şivê xewa wê hati bû. Nan û dewê xwe î dohtira rojê bi zehmetî hazir kiri bû. Mefer nema bû ko herî ser livîna xwe. Xwe li ser merşê gêr kiri bû. Heta nivê şevê nêzikê devê deriyê mezelê razayî mabû. Kurê wê jî bi wî awayî xwe li ber gêr kiri bû. Nivê şevê bi kurê xwe ra çibû ser livînê.

Li hatina zevîyê kurê xwe li bin dara beru wê nivê zevîyê de razand. Girweka nan, sitila dew bi çiqulekî darê î têrpel daleqand. Ser çoka û bi desta paleyîya xwe dikir. Giraniya xwe ji ser kabokê dida kaboka din, bi wî awayî li ber rêza diçû û dihat. Guh nedida tavzînokê paqê xwe û êşa kabokê xwe. Lê wî dema taştê hati bû, û zikê wê jî qenc birçî bibû.

Li rabûnê ji ser fistanê xwe ve paqê xwe firkand. Kabokê xwe guvaşt. Piştta xwe tawand vî alî wî alî. Rayê piştta xwe terqand. Di pay de çû binê siha dara bewê. Kurê wê hêj di bin siha dara baruwê de razayî bû. Sitila dew, girêka nan ji çuqula darê daxist. Rahişte qelpaqa sitilê, dew valakiriyê. Girêka nan vekir. Alîk nanê tanurê î cehî çend nav dew. Firdikîk ji xwe re çêkir. Qirşikê nanê cehî derketin ser ruwê dew. Bi kefçiyê darî firdik tev da. Qirşê nanê cehî din nav pariya de winda bûn. Dest bi xwarinê kir. Xwe ji firdikê têr kir. Rabû dîsa gireka nan, sitila dewê mayî daleqand. Xwe li ber kurê xwe gêr kir.

Axa binê dara berûwê hînik bû. Bi vê hînikayîyê laşê wê şist bû. Kir ko herî xew. Tirsiha ko razî. Rabû runişt paqê xwe dirêj kir. Wa dîsa firkand. Pehniyâ lingê wê yî rastê diêşîya. Lingê xwe danî

ser kaboka lingê çapê. Li pehniya xwe meyzand. Ji pêxwasî, ax pehniya wê xwari bû. Di pehniya wê de qelşne kûr vebibûn. Ax û zixur ketibûn nav wan qelşa. Pehniya wê ji wan zixura diêşiya. Qelşa yeko yeko paqij kir. Rahişt kulmik axa hûr, qelşê pehniya xwe bi wê axwe dagirt. Bi destê xwe ax li ser qelşa dewisand. Disa paqa xwe dirêj kir. Bi wî awayî li pehniya lingê meyzand. Pakij kir û bi axa hur dagirt. Delingê derpiyê xwe heta kabokê kişand. Kir ko paqê xwe ji ser taziyayê bi firkênî. Çavê wê li muwê paqê wê ketin. Serê xwe du sê cara hejand. Dilê xwe bi xwe şawitand. Di nav vîqas karî de der jî xwe qerîya bû. Jinîtiya wê ji binî ne hatibû bîra wê. Ev çendik heye ko xwe ne şuştî bû jî. Şehkirina pora xwe yî zer î zêrîn jî jibîr kiri bû. Der ji bihn û bixara cilê xwe ji xuhdanê qerîya bû. Lewma cilê lê bibûn weke qemuşka.

Di ber xwe de hizirî. Lê bere wilo bana. Ma çi xem dikir. Wê waqas tiştê ji kî re bikirana. Hey mêrê wê ne li vir bû. Bi bihna farah. Helbet wê ferzenda şuştinê rojekê biketana destê wê. Ma ne her havîn heta taliya xermana halê wê ev bû. Ji alikî ew, ji aliyê din mêrê wê. Kî zani bû ko nûha ew di çi halî de bû. Ji destpêka beharê heta serê zivistanê. Li welatê xerîb û xurbetê. Ji paleyiyê bigre, heta eşêf û berhevkirina pambû her kar dikir. Nûha hirt hirta wî bû di ber kar de, de perene bidî ser hev, zivistanê xwe pê derbas bikin. Wî du zevî çandî bû. Genim û cehê wana wê ji van herdu zevîya derketana. Di man tiştê din. Wê wana jî bi perê anî pêk bikirana. Di vê naviyê de ne şuştin, ferzenda razana li ser doşekikê ne diket destê wî.

Ne mêrê wê bitenê bû di vî karî de. Ji gund enceq sê çar mal hebûn ko mêrê wana li gund diman. Ne diçûn karê derve. Zilamên din hemû derî gund bûn. Yên ko çandîya wana nebin, bi maliyê xwe ve diçûn. Kesê kal û navser li gund diman. Pêşî bavê xwe li çûyinê diti bû. Ew û diya xwe karê malê havîneke sihhê dikirin. Nûha jî mêrê wê çûbû. Disa kar pê mabû. Ji dema ko xwe diti karê wan ev bû. Iroj jî ew kar dom dikir.

Siha darê beruwê xweş bû. Ji xewa wê yek têr

nedibû lê jêra nediqediya. Bihna xwe berda bû. Zikê xwe jî têr kiri bû. Diva bû ko rabî. Li ber xwe da rabû. Çû rêza nîvrê mayî derxiste serî. Vegeriya dest bi rêzke din kir. Serê kêlikê jî li kurê xwe dimeyzand. Şiyarbûna wî nêzîk bibû. Berî ko şiyar bibî, wê xwe çend cara xwe bi vegerandana wî alî, vî alî. Piştra wê ba bikirana diya xwe. Wê diya wî herena firdikkê jî jê ra çêkirana, deyniyana ber. Piştî ko xwe têr kir, wê rabûwana bihatana cem diya xwe. Pêra ber rêzê paleyîyê de wê biçûwa û bihatana. Wê tiştne bêqun jê bipirsîyana, di nav çûyin û hatinê de. Ko aciz bû, wê dîsa vegeyriyana binê siha dara beruwê. Wê li wir heta dîsa xewa wî bê, wê ji xwe re bi axê bileyztana. Dema ko dîsa şiyar bû wê dîsa herana cem diyâ xwe, ji wir dîsa vegeyriyana binê siha darê. Karî wî heta êvarî ev bû. Ko bû êvar, wê bidana pay diya xwe, herana malê.

Xwêhadana ko di eniya wê de civî bi tiliha xwe paqij kir Şîrin. Dawêşande erdê. Serê xwe rakir. Li tavikê meyzand. Roj teqnik bilind bibû. Gavekî din wê bihatana ser serê wê birawestana. Wê hingî xwêhdan ji bin pora wê bi herikana ser çavê wê. Wê cilê wê ji xwêhdanê bi laşê wê ve bizeliqîyana. Ji germê wê hew karibana paleyîya xwe bikî. Bêyi dilê xwe wê der ji paleyîyê biqerîyana. Herana binê siha darê. Heta ko tavik vegeerana rojava, hingî wê dîsa dest bi paleyîya xwe bikirana.

Xwe li dirutinê şidand. Diva bû ko çend rêzne din li ser bixî ji bedêla runîştina germê. Hingî ti kêmayî ne dima di demê kar de.

Ser qedandina rêza ko di ber de, dengê dewsa lingekî gihaste ber guhê wê. Dewş hino hino nêzika-yî didayê. Li xwe nevegerî, de der ji paleyîya xwe neqerî. Kir ko kesê hatî bê heta cem.

-Qewet bi ji te ra Şîro, got yê hatî.

-Malîava Çeço, got Şîrin dema ko lê vegeyriya. Tu bixêr hatî.

Cehê dirutî di destekî xwe de civand. Danê ta-nîştî xwe. Ser runîştinê dîsa xwêhdana xwe paqij kir.

-Xêr e wilo. Tu ji kar mefera ditina dora xwe nabînî. Wexte ez pêl te bikim, haya te jê nîne.

-Ma ez çî bikim, got Şîrîn bi ken. Kesin nayên de paleyîya min bikin. Disa li ber min e. Va îroj siba paleyîya genim bê. Divê ko ez di ceh de dereng nemînim.

-Tu li ku, paleyîya genima li ku. Hêj salik jêra divê. Me nû dest bi paleyîya ceh kir, tu dirabî qala hatina paleyîya genim dikî.

-Ma tu vê germayîyê nabînî. Di bin vê tavikê de genim xwe nagrî. Di çend roja de te dît ko genim dest bi bûyinê kir. Nabêjî ev hermet hêj paleyîya cehê xwe ne qadandîye, ez berbendî bimînim. Wê seridî û bi wêde herî.

-Nexwe tu ji ber vê yekê nehatî paluta dirutina cehê min.

-Bi xwedê min jibîr kiri bû. Lê bihatana bîra min jî, ezê çawa bihatana. Wî tu min dibînî. Ez keseke bitenê me. Ko ez rabim bê m paluta te, ezê çawa bixweser ji bin vî barê giran rabim. Ha va paleyîya genim tê.

-Yên ko nizanibin, wê bêjin nivê zevîyê gund yê wê ne. Malxerabê ne serî û binî du zevîyê te hene. Ew jî heryeku ji du cohta, çar coht dikin. Yek karî çavgirêdayî du zevîyê te bidiruyî.

-Bi vê jîniyîya xwe jî wê karibî?

-Hema sad carî bere jin bî. Bi vê cuwanîya xwe tu çawa van xebara dibêjî. Yê ko nizanibin wê bêjin belkî pîrebiyeke, pişt a wê kuz bûye. Piştî ko tu bi vê cuwanîya xwe bêjî û neyê paluta min, ezê çî bikim.

Ezê herim li gunde dore me arîkarîyê bixwazim. Ez bêjim, hawara cîranno, gundîye min der ji min qerîyan, dextlê min li erdê ma. Werin bi xêra xwe dextla min ji erdê rakin. Win vena ji min dixwazin.

-Tu rast dibêjî. Divê ko em arîkarîyê bidine te. Ko ji deverne din bêne arîkarîya te, disa kêmasî ya me ye. Lê wî tu min dibînî.

-Ne nizamim bê çi bi te bûye. Yê ko hatin palutê, nivî ji wana weke te ne. Ne tu bitênê yî mêrê wê li derve. Ew jî weke te xwedî kar in. Lê dîsa ji xwe re mere rahiştine dasê xwe û hatin arîkarîya min. Tu bi-

tenê nehatî. Ma ev bi te ra bû. Saleke sihhê ez li ber we bazdidim. Lingekî min li bajêr, yek li nehîyê, yek li gund. Qerekol, dadxane, nifus bî ez diçim. Min derîzgeha hikumetê ji bonî we mehand. De ti karê we nedîtî nemênî. Ji şerê bendê din ez we diparêzim. Evqas pere li ber we diçin. Tiştik namînî ko ez li ber we nakim. Li gora veqas tiştî ji we re dikim, win çi ji min ra dikin. Ev e. Di salê carekê çend roja paleyî, rakirina xerman û çend roja paluta êzingê min î zivistanê. Ji xeynê vena win ji min ra çi dikin. Di kawêna bêje. Ez dirabim berî rojekê xeberê ji te ra dişiyênim. Tu nayê. Xêr e. An tiştin hene ko ez nizamim.

-Wê çi hebî. Tiştik nîne ko tu bê nizanibî. Ew e ko min gotê te. Ev jî besê di hesabê min de ji bonî nehatinê. Rojê xwedê neqedîyan. Helbet wê Temirxan vegeerî. Hingî çi suxra te hebî, pê bide kirin. Qenciya te li cem xwe nahêlî. Va wê pera jî bînî. Bi çi li behra wî ket ji pera, wê bidî.

Ji xwe wê bidî. Ma bi xêra bavê xwe didî. Ez rabim salekê li ber we herim û bêm, di ser de jî rabim ji berîka xwe xwe pera bidim. Te ev li ku dîtîye. Nûha der ji vê biqere. Ez çi di pirsim, tu çi dibêjî min. Dîkîko pîrsa min bi min bidî jibîrkin. Min doh xeber şiyandi bû de tu bêyî paluta min. Tu çima nehatî. Wêna ji min ra bêje. Ewqas cuwamêr hatin. Ji sibaha xwedê paleyîya min dikin. Ma di dilê xwe de nabêjin, gelo çima Şîro nehat. Ma nabêjin, me der ji karê xwe qerîya û em hatin. Ew çimanayê. Ma ehmeqê xwedê em in. An ma nabêjin, axatî û maqulîya Çeço li ku ma. Wî Şîro jî wîna nahesibênî.

-Tu rastî. Divê ko ez bihatana. Lê doh derengîya şevê, li ser razanê gotine min. Lê hingî ez dawestîya yî bûm, nikarî bûm ji cihê xwe biqeliqim. Li min bi-buhure.

-Tu sibahî bihatana zevîyê. Te li wir bigotana min û bivegeriyana. Ma wê binê lingê te bi mehiyana. An te riya zevîya min nas nedikir. Piştî ko tu hatî, min nedigot hîlo bîlo tê bimînî. Helbet minê tiştê bigotana. Hingî tiştê nedihat bîra yên din jî. Ji sibahî ve çavê min li riya Şîro, ha hat, ha wê bê. Ez li ser êgirim, ne xema Şîro ye. Di ser de jî, te min anî ber piyê xwe. Ez nûha cehê ko te dirutî li serê te bikim kom û agirekî berdimê. Çi li te bikim. Di ka wêna bêje.

-Hema dilê te çawa bixwazî, wêna bike, got Şîrîn bi ken. Heqê te heye. Lê hatina zevîya te nehat bîra min. Min di got, li vegeê ezê herim mala wî bêimê. Lê dîsa dibêjim. Divê ko tu li min bibhuftî. Ez zanim ko Temirxan li vir bana, wê bihatana. Li gora ko ne li vir e, diva bû ez karê wîna pêk benim. Lê wî min nekir.

-Ma hema wîlo bisehlî ezê te ji lapê xwe berdim. Divê ko ez te bicerimînîm. Pêşî cirma xwe bide, piştî ra bêje li min bibhure.

-Cirma te li ser serê min. Hema te çiqas xwest, ezê bidime te. Di ser de jî, li vegeê te çi kar da ber Temirxan, ezê jî pêra bêm. Hema ko dilê te xweş bî.

-Tu here bi vê gotinê bavê xwe bixapêne. Ma yê xapandinê me. Divê ko tu cirma xwe di cihê cih de bidî. Hema li vir. Li piştî vî hêtê ha.

-Te çi got Çeço?

-Min got hema li piştî vî hêtî.

-Na lo. Ez dibêjim ewder dûr e. Wê kî herî heta wêde. Hema li vir. Ma çi hewceyî wêde ye.

-Vêca tu henekê xwe bi min dikî Şîro. Ya kê m ev mabû.

-Heyf li te Çeço. Min hêvîya vê gotinê ji te nedikir. Ez çiqas ehmeqim ko min te xiste cihê cuwamêra û min der ji karê xwe qarîya, bersiva te da. Tu nabêji bi nêtekî xerab tu hatîya vêdê. Ma ko min zanîbana, ma min bersiv jî dida te. Min got belkî tu insanî. Min jî rabû weke insana bersiv da te.

Bihêz ji cihê runiştî rabû. Vegerîya, dest bi pale-

yîya xwe kir. Ji hersa laşê wê dilerizî:

-Şîro nûha tu vêna ji dil dibêjî?

-Na lo. Ez delalîya xwe li te dikim. Ne bitenê ji dil, ji gurçika di dibêjim.

-Keçê xwedê ji te sitandî ye. Ma ez ew kesim ko tu min navêyî.

-Nuha xwedêhebîna tu xwe çî dihesibênî. Ma mêt ji ser ruwê dinyayê qelîyana ko ez te nevêm. Tu kî yî nûha ko evqas xwe qure dikî. Hevqas xwe mazin dikî. Tu axa bî, maqulê gund bî. Di axa tî û maqultîya xwe de bimîne. Di talîyê de herkes ji bavê xwe ye. Kesik ji qulê hêta derneketîye.

-Lê yên din wilo nabêjin. Li sîsika çavê min di-mezyênin de ez tiştêkî bêjime wana. Bibaz tên cihê ko ez dixwazim.

Nexwe van gotina nebêje min. Here bêje wan dêli-ka. Bere ew bêt xwe bikewênin. Bê kî ji wana xwe di bin te dirêj dikî, bere ew bê. Ev tişt ne karê min e.

-Ma ne xebînetê vê xweşkayîya te ko tu havînekê berbandî Tamirxan dihêlî. Li ya xwe mezyêne ehmeqê. Ev çî hirt hirta te ye li ber vê paleyîyê. Carekê çavê xwe vegeerîne ser xwe. Bibine bê ev laşê nazik çawa dirizî.

-Na lo. Nexwe ezê wi eqilî ji te bigrim. Te navê suxre kire palute. Tu me bi darê zorê bibe paleyîya xwe. xermanê xwe bi em bide rakirin. Êzingê xwe bi me bide kirin. Me hemuwa bide bêşandin. Li kefa xwe mezyêne. Piştra were li dora me bigere. Wala em bi axayê xwe xeriqîn.

-Ne tu xwe nebînî. Ev gotin qet li devê te yî xweşik nayê.

-Ma xweşkayîya min bi serê te mayê. Ev ji te nayê pirsîn. Bes vê mortmortê di serê min de bike û bi edeba xwe rabe here. Ez keseke jixwefihêt im. Nexwe rabûna tofanik nedîtî li serê te de rakirana.

-Na lê. Ma bi gotina te ye. Tu evqas girêdayî namusa xwe bana, her şev karê Birho wê li mala te çî bana.



-Lo situwê Birho di bin di bimîni. Ew jî tawlazik weke te ye. Bi situwê şikestî, dibî xwedîyê mêrê min jî. Bi saloxa tê de min biparêzî. Lê weke sa devê xwe li min dimirçênî. Piştra dirabî, dîsa weke sa diçî. Ma tu dibêjî bi hatina wî tiştik dikevî destê wî. Win hemu wilo ne. Tuwî, ew e, Mecu ye, Ekremo ye. Ko mêrê me ji gund derketin, ji we ye ko em li hine din digerin. Ne ne wilo ye lo. Mercê mêrxasiyê ne ev e. Erê em feqîr in. Bav û mêrê me sê behrê salê li welatê xerîb û xurbetê ne. Lê em ne qehb in. Hema xwe bixin cihê mêrê me û bêjin. Ko hin wilo li jinê we bikirana ma wê li we xweş bihatana.

-Qet mitala meke. Ne em dikevin cihê mêrê we û ne kes li dora jinê me wê bigerî. Win li xwe meyzênin.

-Ma ezê çi bêjime te Çeço. Tê carekê bênamusî daye ber çavê xwe. Nûha rabe weke mêrxasa vegere zevîya xwe. Ne te tiştik got, ne min tiştik ji te bihîst. Dûr nêzik wê Temirxan bê. Hingî tu ê ew yê hev in.

-Hema wilo Şîro. Ti gotinen te yî din nînin ma? Nexwe nûha ez rabim destevala vegerim. Tu piştra li xwe ne heyîfî ha.

-De rabe çapalo lo, got Şîrîn. Lo qeda li vî canî bikevî ko li te biheyîfî. Lê hêvîya min ji xwedê, win jî rojekê heyîna xwe winda bikin, wi jî bikevin welatê xerîb û xurbetê, de hin li dora jina te jî bigerin. De hingî bibînin gerana li pay jinê cuwamêra çawa ye.

Bi hêrs cehê ko çinî avête erde. Der ji paleyîyê qerîya. Rabû û bilez çû binê dara beruwê. Berî ko ku rê xwe şîyar bikî, firdikik jê ra çêkir. Kurê şîyar kir de firavîna xwe bixwî.

Sê zilam di reşayîya şevê de baskî aliyê tara sarincê ve çûn. Hersê jî biçek bûn. Çekê wana di destê wana de bûn. Di pay hev de dimeşin. Dema ko hatin ber hêtê hewşa xaniyê yektabaq, bela bûn. Yek ji wana xwe da ber hêtê hewşê. Berê devê çeka xwe li devê deriyê xênî rast kir.

Her duduwê mayîn, baskî deriyê xênî ve çûn. Yên li pêş, derî şanî yên li paş da bi destê xwe. Di du qevza de xwe gihande derî yên li paş. Çend cara bi kulma xwe li derî da. Piştra bi dengê bilind bakir.

-Şeroo, got. Wa Şeroo.

Şero û malîyê xwe ji êvarî ve raza bûn. Hemu di mezelekê de bûn. Ew û jina xwe di livînekê, hersê kurê wî jî di livînekê de bûn. Ew, berî dê û bavê xwe, di anîşkke mezêlê de raza bûn.

Ser dengê lêxistina derî, pêşî jina Şero şiyar bû. İngişkik li Şero da, de Şero şiyar bibî. Ji cihê xwe hilçenî Şero bi ingişka jina xwe. Pêşî Şero, piştra jiwî rabûn, di nav lîvîna xwe runiştin. Bi hev re guhdarî derî kirin.

-Ew kî ye, got Şero dema ko carekî din li derî xistin, ji nav cihê xwe.

-Ez im, got yê li derve. Fexro. Ma tamara mirinê daketîye ser çavê te. Em ji êvarî ve li derî dixin.

-Wî ez têm, got Şero berî ko ji cihê rabî.

Şero dengê Fexro di cih de nas kir. Bi lez çû derî jêra vekir. Destê xwe da ber singa xwe û xwe li ber tawand.

-Tu ser serê min hatî, got Şero. Fermo.

Di pay Şero da jina wî jî ji nav livîna derket. Ra-hişte pişta xwe û xwe da alîkî pişta derî. Piştî ko pişta xwe girêda, çû lamba pêxist.

Di vê navîyê de kure wa yî mazin şiyar bû. Ser livîna xwe runişt û kaboka xwe kişand bin zenîya xwe. Ew jî Fexro nas dikir. Xerabîya ko dikir gelek cara dîti bû. Hin ji wana jî bihisti bû. Zanî bû ko ji bonî werabîkê hati bû mala wana. Bi tirs gohdarî li axaftina wana kir.

-Erê ez fermom, got Fexro. Ka halo were.

Bi vê gotina xwe ra, bi barstika Şero girt. Wî bi-hêz ji devê derî kişand, daxist hewşê. Bi vê kişandinê herdu pişkokê kirasê Şero ji cih hilbûn. Barstika wî heta navika wî vebû. Tazîtiya wî derkete holê. Şero bi destekî barstika xwe girt. Fexro dîsa destê xwe avêt barstika wî. Ji cihê barstikê, muwê singa wî gihastin ber destê wî. Bi muwê singa wî girt vêca. Wî di pay xwe de kişand. Şero ji êşa rihê xwe, xwe siparte nav destê wî. Heta anîşka xanî di pay de çû.

-Nûha bêje, got Fexro. Tu zanî bî ez kî me?

Bi vê pirsê ra, bi herdu destê xwe bi herdu milê Şero girt û pişta wî bihêz li hêtê xênî xist.

-Erê ez te nas dikim, got Şero di ber vê lêdanê de. Tu Fexro axa yî.

Di vê holê de li zilamê li pay Fexro meyzand di ber kevîya çavê xwe. Weke ribanekê, çend gav ji wana û wê derawestî bû. Devê tifinga xwe li Şero rast kiri bû.

Yên li pişta hêtê hewşê çend cara kuxînde Şero wî bibînî. Ew jî devê tifinga xwe li Şero rast kiri bû.

Çavê xwe ji ser Şero ne divegerand.

Bi dîtina van herdu kesê biçek dest û lingê Şero sar bûn. Xofik ket ser dilê wî. Têderxist ko wê wîna nakujin, lê wê wîna li ber malîyê wî pîs bikin.

-Min navê xwe ji te nepirsî, got Fexro. Herkes navê min zanî. Min got ma tu min nas dikî. Tu zanî bê ez bi meriva çî dikim.

-Belê. Ez wê jî xweş zanim. Zanim bê tu qala çî dikî. Bi wî awayê ko tu dipirsî ez te nas dikim.

-Ha wilo. Di ka nûha bêje. Berî ko win herin dizî-ya Behwarîya, win bi kî şewirîn. Win bixweser çawa van tiştê dikin.

-Min dizîya gayê kesekî nekirîye ez xulam. Tu rast dibêjî, lê yên ko gotî te darawa dikî.

-Xwe wilo xaşo maşo meke. Berî ko diranê te hilkim, ya rastî bêje min. Ma ez ew yekim ko bi ya darawa xelkê bikim.

-Win mazinê me ne. Win çî li me bikin, fidî çavê we. Lê bi tirba rehmetîyê bavê te, haya min ji gayê kesekî nîne.

-Kuro sayîbav, dudîrêj meke. Min li vir newexirê-ne. Karê min ne tu bitênê yî. Sad karê din berbendî min in.

-Tiştê nekirî ezê çawa bêjim. Nuha ez jî rabim, dûrî te, darawna ji te ra bikim, ne wê derkevî holê. Yan din, tu zanî ko em bêyî we tiştêkî nakin. Ya talî, êdî tu zanî.

-Nexwe tu ya talî ji min dixwazî. Lê berî talîyê vêna bibîne.

Xwe gavik xwe da paş Fexro. Sê çar kulm di ser hev de li arguşka Şero da. Bi kulma ra serê wî li hêt ket. Her carî ko kulm lê dixist, Şero serê xwe bi qehr dihejand. Serê wî li ber diranê xwe lê dizîqand.

-Heyf, got Şero. Heyf ko heta îroj te me nas nekiriye. Ma em yên va roja ne. Ji dema ko tê bîra min em yên hevin. Di vaqas salan de hêj we me nas nekiriye. Yan din, îroj em xwînîyê we ne. Pêşî xwedê,

piştra me xwe li we girtiye. Ma Behwariyê ko tu dibêjî ji benda din in û neyarê me ne. Tu dirabî ser gotina wan neyara vana li min dikî.

-Ma kerê girêdayî, wê neyarê wê bèn gilihê we li ber me bikin. Ma xwe bi em digrin de bèn cem me û ez rabim bi ya wana bikim, bêm vêdê. Min ji deverne din dizîya we bihist. Ez wêna ji te dipirsim. Ma evder bêxwedî ne lawo, ko win dirabin bixweser tiştina dikin. We ji xwe re negot, wê dûr û nêzik bê bihistin û wê ji me bê pirsîn. An we zani bû, we me neanî hesabê.

-Heşa yî we. Em çawa we nahesibênin. Em evqas xurt bana, ma karê me li vada çi bû. Emê nûha li gundê xwe, li ser malê xwe bana. Wî tu dibînî bê bi çi rebenîya em li vir in. Di ser vê rebeniyê de vêca em ramazinê eşîrekê neheshbênim.

-Nexwe ez darawa dikim. Ez hatime ser tişteki netişt tadeyîyê li te dikim.

-Haşayî te. Ma ez kî me ko bêjim tu darawa dikî. Lê bi şerefa mêrê qenc, min dizîya kesekî nekirîye û ne haya min jê heye. Tiştê ko ez zanim, bêbextîk û dijminîk li me hatîye kirin. Cuwamêr îroj xurt in. Her tişt ji wana tê. Di meyzênin hew destê wana digihî me de xerabîne din li me bikin.   
di meyzênin ko dewlet xwedê û serê we, em li vir parîk nan dixwin, çavê wana li me bar nabî. Hey me bi darê zorê, bi darê kotekê ji gund derxistin, divên ko win ji vir berdinê me. De dilê wana li me qenc hînik bibî. Vêna dixwazin.

Şero serê xwe zivirand rexê gundê xwe Behwarê. Rayê herdu ceynikê wî situr bûn. Ji qehra kir ko xwe bixwî. Herdu kulmê xwe bi hev re şidand. Lê wî nûha tiştik jê nedihat. Li ber destê Fexro bû û ya dilê xwe pê dikir.

Ser sitandina mixtarîyê, li gund herdu bend rahisti bûn hevdu. Di pevçûnê de benda wan qels keti bû. Bi kevir û dara, benda wana ji gund derxisti bûn. Berî ko bêne vir li hev giha bûn û êrişekê din dabûn ser gund. Di vê êrişê de jî zora wana biri bûn. Darî çavê wana firaxê wana ji malê wana talan kiri bûn. Xaniyê hina ji wana xera kiri bûn. Heta derengîya şevê li dora gund

mabûn. Piştra, ji neçarî, tevlu malîyê xwe hatibûn bajar. Xwe li axê girti bûn. Piştî çend miha benda wana vegefiya bûn gund. Şero û çend malê pismamê wî li vir mabûn. Rê qedabûn wana de vegevin gund. Di ser de jî, tev zeviya wana î çandî ji xwe re diruti bûn. Raz û werzê wana qurafti bûn.

-Ez çi di pirsim, ew çi bersivî didî min. Kuro lawo ez wana ji te napirsim. Tu qala gayê ko we dizî ji min ra bike. Te çi kir ji wana. Te firotin an hêj di bin destê de ne. Wêna ji min ra bêje. Ji min ra çiroka nebêje. Ez wana ji serî heya binî zanim.

-Bi sund haya me ji gayê Behwarîya nîne. Ji roja ko em ji gund dereketin ve, hêj min ruwê xwe nedaye baskî gund. Ko ji me bihatana emê herana dizîya wana. Menê jî malê wana talan bikirana, razê wana biquraftana. Lê ji me nayê. Ko ji me bihatana ma me heyfa xwe li erdê dihişt. Wî tu dibînî ko li vir jî karine me. Li ku ma kirina dizîya wana. Vêca emê çawa xwe qerêsin, bêjin me dizîya wana kiriye.

-Bê çiqas xwe reben dikî. Yê ko we nas nekî, wê bê rast e. Lê ne wilo ye. Ew tu rabî pelê mishefê biqetênî, ez ji te bawer nakim. Di vê yekê de ne keskî din, win in. Lê nûha serborîya gaya hev ji te dipirsim. Ew bere bimînî carekî din. Dûr nêzik ezê cihê wana derxim holê. Hingî ezê herdu çavê te derînim. Lê ji ber ko te ev dizî bêyî min kir, ezê te cirimênim. Tu û pismamê xwe, wînê her yek pênc hazara bidin.

-Cirma te li ser serê me û bavê me. Lê bi rastî ev ne cirimandin e.

-Ne cirm bî, ma çi ye lawo. Ez ne ji te ditirsim û ne fihêt dikim. Ew çi bana, minê wêna bigotana. Heqê we cirimkirin bû, min we cirimand. Cirma din, heya ko ga derkevin holê. Hingî ezê tiştêkî bêjime we.

-Ez feqîrê xwedê ji ku zanim. Ko me tiştik bikirana, hingî cirimandin heq bû. Lê nekirî, nexwarî. Ev neheqî ye. Nûha emê heryek pênc hazara ji ku bênin. Di çend miha de ew pere nakevî destê me.

-Nexwe ez neheqiyê li we dikim? Ez dibêjim hêj te neheqî nedîtiye. Di ka nûha neheqiyê bibîne. Te gelek dudurêj kir.

Xwe da alîkî Fexro, berî ko bi tiliha xwe Şero şanî zilamê xwe bidî. Zilam di cih de tifinga xwe vege-rande Şero berî wî xwe avêt pay Fexro. Ber çû li hê-tê xênî ket. Çîrêsk ji hêt avêt tarîyîya şevê.

Dengê bera tifingê li tara sarincê de di cih de bela bû. Pêşî cîranê Şero ser dengê tifingê şiyar bûn. Piştra xelkê tarê ji nav livînê xwe guhdarî derve kirin. Qederekî din lihêfê xwe kişandin ser serê xwe.

Kurê Şero î mazin ji ser cihê rabû. Bi lez çû ber devê derî. Kir ko derkevî derve. Diya wî di ber derî de rawestî, de kurê wê dernekevî derve. Bi destekî milê kurê xwe girt. Herdu kelogirî bûn. Bi tirs guhdarî li derve kirin.

-Ne min tiştik negot, got Şero di pay Fexro de. Ya min gazinik bû ko min kir. Piştî ko te wilo xwest, bere ya te bî. Em li vir ber we ne. Kîjan rojê em ji gotina we derketine.

-Berî ko tirs bigihî te, te wilo nedigot kurê sayê xwe. Te qala feqîrtîyê ji min ra dikir. Ka dîsa wê gotinê bêje de ez qama te bibînim. Kî neheqîyê li te dikî. Wêna bêje.

-Ne min got. Ya min gazinik bû, min kir. Piştî ko destê we li ser me bî, ma kî karî neheqîyê li me bikî.

-Ha wilo. Weke mêrxasa bi min ra bi axive. Nûha here pênc hazarê xwe bêne. Yên mayî jî siba ji te dixwazim.

-Xwezî hebana. Lê bi tirba bavê re, ko tu nûha bê ka sad wereqeyî, nînin. Em aborîya bi kirina qaçaxî dikin. Lê ev çend mih hene ko riya qaçaxê girtî ye. Em hemu runiştî ne. Tişteki me li firotinê jî nîne. Ko hebana minê bifirota û bidana te. Lê her tiştê me li gund ma. Nûha erdeke hişk, azamanake bilind. Ez karim bi deyn ji xwedîyê ko em qaçaxîyê jê ra dikin, bixwazim. Tu zanî em qaçaxîyê ji xwe re nakin. Dîsa bi perê cuwamêra em vî karî dikin. Ew enceq heqê lingê me didine me. Bi wê jî em enceq aborîya xwe dikin.

-Ez wîqasî nizanim. Berî ko we dizî kir, we banî-

yana ber çavê xwe. Lê belê, bere dîsa qencî ji min bî. Ezê du roja xwe berbendî we girim. Roja sisêya, berî nîvroj divê ko di destê min de bin. Hema ko piştî nîvroj ket, ez hew dixwazim û hesabê xwe li êvarî bîkin. Hingî bextê min ne ji we ra ye. De vêca em herin zarono, zilamê xwe Fexro berî ko ji wir dûr bikevî.

Şero qederekê di pay wan de meyzand. Piştra serê wî di ber de kete hindiru. Çû li ser livîna xwe runişt. Jina wî di pay de derî girt û çinçal avêt pay. Ew jî çû li ser livîna xwe runişt. Hêstirê çavê xwe bi zendîka kirasê xwe paqij kir.

-Heyla şeş top li malê ketî, got jina wî. Ev dara-wa mezin ji ku li hev anî. Ma li gotinê tişteki nema-bû. An kesekî din nebû ko herî girê xwe li wana bidî. Piştî vaqas tiştê li me hatî kirin, veca başa Fexro. Emê vaqas pera ji ku bînin bidinê.

-Ne ew jî zanî ko me ti dizî nekirîye, got Şero di ber xwe de. Ev e. Hat başa xwe ji me dixwazî. Qey van roja kesekî berçav nedît, ko herî başê jê bisitênî. Di xwe de hizirî, em hatin bîra wî, rabû hat. Nexwe ne tişteki din e.

-Ma axa ew e ko dirabî kesa dicirimênî. Ne berî wî Ferzen axa heye. Ev ne birayî wî, pismamê wî ye. Me cirimandin lê dikevî.

-Di ka were bêje. Ko pismamê wî bitenê bana, xem nedikir. Menê salê carekê an du cara başa xwe bidanê. Heta xulamê axê Ehmedo başa xwe ji xelkê disitênî. Ma tu dibêjî aborîya xwe bi çi dîkin. Ne zevî, ne sewal û bazirganî. Karê wana ev e. Ma tu dibêjî Fexro li ber dizîya gayê xelkê ketîye. Qey van roja perê wî nemana. Di zigurde da pay xwe û hat. Lê ma xwedê.

-Ez qurbana xwedê. Ma kevir li me barî. Ma me çi kir ko ev tînen serê me. Ma hema rojekê em nabêjin oxyay.

-Ne, ne ya wî ye lê. Em ne bi wî li vir in. Ezê sibana herim cem Ferzen axa. Ezê meyzênim bê ew wê çi bêjî. Helbet wê rêkê bidî ber me.



Heta derengîya şevê serê wan di ber wan de, li ser livîna xwe runiştin. No ko riştik ne dihat bîra wan de biaxivin. Hemuwa di dilê xwe de dihiştin. Ya baş ew bû ko bibî sibah û herin cem Ferzen axa. Ew ma ko razin.

Ferzen axa vê sibahê jî weke sibahê din dereng şî-yar bû. Civata wî weke her şevî heta derengîya şevê dom kiri bû. Di vê navîyê de der jî kesê li civatê qerîya bû, bihurtî bû mezela din, çend qedeh vexwari bû. Çavê wî, jî serxweşîya êvarî warimî bû. Berî ko rabî çavê xwe firikand. Qasekê li ser livinê gêrkirî ma. Piştra rabû. Çû deriyê mezela xwe vekir. Ji xeynî xulam Ehmedo, kesek li eywanê nebû. Kêfxweş bû ko ji nûha ve kesekî li berbenda xwe nedît. Bihurî mezela runiştinê. Ehmedo pêşî qehwa wî, di pay de firavîna wî anî danî ber.

-Çi heye, çi nîne Ehmedo ji sibahî ve, got di nav firavînê de.

-Saxîya te, got xulam Ehmedo. Wê çi hebî. Ev sibah jî weke her sibahî. Wî Şero û çend pismamê wî jî sibahî ve li ber derî ne. Bê çi hewala wana heyî, bi lez hatine.

-Wê çi hebî. Qey dîsa rahiştine hevdu. Ka baka wana bê çi hewala wana heye.

Ehmedo rahişte fincana qehwê î vala û derket. Di pay de gaveke din Şero û pismamê wî ketine hindiru. Li pişta derî jipîya rawestî. Rojbaşî dan axê.

-Bibhurin runin, got Ferzend axa. Jipîya nemînin.

-Xwedê kêmatîya te nedî me, got Şero berî ko bibhurî ser kursîkî.

-Xêr e Şero, got Ferzen axa. Çi qewimî dîsa.

-Tu sax bî. Ma serê me ji qerqesuna halî dibî. Di vê navîyê de em te jî bi xwe re reht dikin. Tifaqê xwedêne. Yek nizanî bê wê kengî û çawa bên. Te dît ko wî hatin, bi qamçira te girtin. Em evqasî xwe jî wana dûr digrin. Lê dîsa tèn me dibînin. Nexwe me jî nediva bû em serê te bi xwe re biêşênin.

-Serî bê qerqesûn nabî Şero. Wê her hebin. Win jî

dema ko buwarî wan qerqesuna, tifaqa neçar man, ji xwe winê bênc cem min. Win neyin vir, winê herin ku derî. Cihê hatina we ev der e.

-Em jî vêna wilo zanin. Ji bav û kala cihê me ev der e. Lê Fexro axa bi vî çavî li me nameyzênî. Me bi ser hine din ve berdidî.

-Çawa?

-Tu sax bî, şevê din derengîya şevê, ew û du zilamê xwe hatin mala min. Bi saloxa me gayê Behwarîya dizîye. Ser vê yekê tiştik nema ko bi serê min nekir û di ser de me heryekî bi pênc hazar banqinotî cerimand. Di roj jî mihlet da me. Ko em nedin, wê dîsa bê. Vêca tu zanî. Wî tu halê ko em têde xweş zanî. Tu çawa di bêjî, emê bi ya te kin.

-Te got Fexro axa şevê din hat mala te.

-Belê ez xulam. Fexro axa şevêdî hat mala min.

-Kuro tu şaş bî. Nûha tu qenc zanî ko ew bû.

Çawa ez şaş im ez xulam. Ma ez Fexro axa nas nakim. Fexro axayê ko ez wîna jî çend sala û vêde nas dikim. Bi tirba bavê te ew bû. Du zilamê biçek jî pêra bûn.

-Heyla ecêbê. Ma kesik li bajêr nema bû ko bi şiyênî pay te. Ew çawa di rabî tê heta mala te. Şaşîya min jî vê yekê ye. E, piştra.

-Va ez û pismamê xwe li vêde ne. Em li ber te ne. Lê em vêna jî bêjin. Bi tirba bavê te yî delal me dizîya kesekî nekirîye. Tu zanî bê em aborîya xwe bi çi awayî dikin. Ti têkilîya me bi dizîyê ra nîne.

-Ne hewcêyî gotinê ye Şero. Ez zanim. Lê, li tara sarincê ne win bitenê ne gundî. Tar sihhe gundî ne. Pîranîya wana jî dostê me ne. Çima ji vaqas kesa hat ber derîyê te. Çima neçû ji kesekî din nepirsî. Xwîya ye ko tiştêkî zanî ko hat ber derîyê te.

-Ez jî ku zanim. Lê ez dibêjim ko kî karî kî ye. Nexwe çima ne hine din? Weke te gotî jî vaqas kesa çima te bi qirika me digrî.

-Meyzê Şero, got Ferzen axa biqehr. Ev ne karî karîbûnê ye. Ko bê wê yekê, em dest li ser destê xwe de nabînin. Lê ko hate insantiyê, em kêmê herkesî ne. Lê ne wilo ye. Helbet Fexro axa tişteki zanî ko dibêjî. Dema ko got jî rast e. Divê ko win gotina wî bînin cih.

-Hege tu li me ne bawerî, me bide sunda. Ne sund jî heq in. Ku dera ko tu bivê emê herin li ber destê wî sund bixwin.

-Ezê ji bonî kî we bidim sundan. Winê sund bixwin û Fexro axa darawîn derxin. Tişteki wilo ne ez dikim û ne ji min bixwazin. Nûha der ji sunda biqerin û herin malê xwe. Ezê piştra tişteki bêjime we.

-Ma Fexro axa. Emê çi bêjinê.

-Ne min got rabin herin.

-Malî ava. Xwedî zarokê te ji te ra bihêlî.

-De ji we re oxir bî.

Li derketina Şero û pismamê wî de, qeflekî din ketine hindiru wê axê. Kî zanî bê çi hawalê wana hebû.

## QOLINC

Kerik, tevlu cehşika xwe nêzîkî devê şewla Meymunîyê, di keviya rê de rawestî bûn. Hastuwê kerê di bin çermê wê de xwiya dikir. Cehşik diya xwe dimeht. Weke ko ker ne şîr, rihê xwe dida cehşa xwe. Weke ko hino hino, piço piço rihê wê dikişand bi mehtinê ra. Bi her kişandinê laşê wê divamitî, ji êşa canê xwe dirailî.

Ciwan, teqşîya lê siwar ji kerê û wêde rewestand. Daket wêna kerê tevlu cehşika wê kişand. Çend mal ji rê xwar de, di nav du besta, darê bî û spîndara bû. Berê mekîna wêna vegerand ser wan mala. Kir ko wênê wana jî bisitênî. Teqşîya di pay wan de hatî, di wê navîyê de hat li ber Ciwan rawestî. Yekî nas serê xwe ji teqşîyê derxist.

-Tu çi dikî loo, got bi hêrs.

-Wêneyê vada digrim.

-De zû siwarbe ko dibê ez wêneyî vada digrim. Ti karê te yî din nema ji xeynî girtina wênê vêdê. Di ka serê xwe rake û li kaşê ser xwe ve meyzêne. Piştra wêneyê vada bigre.

-Li kaş çi heye, got Ciwan, berî ko serê xwe bas-kî kaş ve rakî.

-Berqa devê çend keleşinkofa li çavê Ciwan ket. Ji tavikê lulê devê wana diçîrisîn. Berê wana vegeyayî ser wana bû. Ciwan bilez li teqsiyê suwar bû. Teqsiya din ji zû ve ji wêde dûr ketî bû.

-Ew min çî kir, got şifêrê teqsiyê bihêrs. Emê bê-jin haya te ji tiştêkî nebû, tu bi rewşa veda nizanî. Ma ez çîma li vada rawestîm. Min hişt ko tu wêna ji vada kişand.

-Xêr e bavo, got Ciwan. Ma çî qewimî. Me li talanê kesekî nexist, mala kesekî xera nekir. Du wêna bûn min kişand. Ma cebilxanen li wêde hebûn an cih-ne xef. Ma cihekî evqas giring e. Şewlekî xalî û çar pênc mal di devê wî şewlî de. Çend mirîşk û dik di devê wan xaniya de. Min çiyî din kir ko we vê tofanê li serê min rakir.

-Emê çîma tofanê li serê te rakin. Yê n ko tofanê li serê te rakin, li serê kêş bûn. Em bitenê tirsîyan. Me tîrsa xwe gote te. Ko tiştik bihatana serê te wê xelk çî bigotana min.

-Wala ew kî bûn lo. Çî hewalê wana ye li wir. Çîma kişandina wênê min li wana xweş nedihat?

-Nûha tê bêjî ez xwediyê vî şewlî û vî gundî jî nas nakim.

-Çawa nas nakim. Herkes zanî ko şewlê Meymuniyê û gundê lê, yê axayê Rama ne.

-Tu zanî ko axayê Rama û rêzanke xortê Kurda rahiştine hevdu. Heta îroj çend kes ji hevdu kuştin.

-Belê, ez wê jî zanim. Lê çî têkilîya rahiştina hevdu û kişandina wênê min heye.

-Ma tu dibêjî axayê Rama nuha li ku derê ne. Ew kesê li serê wî kaşî li wir çî dikirin. Ma derziya diya xwe li nav wan lata winda kiri bûn.

-Biqasî ko ez zanim, axayê Rama li Batmanê diru-niştin. Çend mal ji wana piştî vê qerqesunê xwe ji pevçûnê dan alîkî, çûn li Istanbulê bicih bûn. Ez wana li wêde dibînim. Li wêde yek ji wana bazirganiyê dikî. Yek ji wana jî, telsizik di dest de di nav polisa de, arîkariyê didî wana. Yê n din nizamim bê çî dikin.

-Lo bavo Batmana çi, halê çi. Piştî ko ew û rêza-  
na xorta rahiştine hevdu, vegeŕiyana vir. Li vir asê  
bûn.

-Li serê vî çiyayî?

-Wî te zilamê wana dît. Devê şevl girtin e. Ma kî  
karî nêzikayîyê bidî wana. Ma karî bûn li Batmanê bi  
vî awayî xwe biparêzin. Nahêlên tayr bi tayranîya xwe  
di ser wan de bifirî. Tu jî rabûye wênê wana dikişênî.  
Cihê wana bi wêna darîçav dikî û ew wê tiştêkî bi  
te nekin. Tu ne mêrê diya wana yî. Ew e ko li te  
neraşandin. Hingî minê bersiva zarokê te bi çi awayî  
bidana. Ma nedigotin te bavê me bir li wada da kuş-  
tin.

-Nexwe wilo?

-Wilo lê.

-Çima tu nabêjî ez ji destê wana erzan filitîm.  
Nexwe ezê nûha li wêdê dirêjkirî bana. Kes ji tirs  
nedihat laşê min jî ji wir ranedikir.

-Erzan û hew. Xwîya ye ko diya te, te di rojeke  
baş de anîye dinyayê.

-Nexwe ji nezanî wexte min tiştin bianîyana se-  
rême. Tu nabêjî halê me xerab bû.

-Ne min gote te.

-Emê bêjin ya min carek bû. Bihurî çû. Kî zanî bê  
ezê dîsa vegeŕim vada. Lê win her roj di vê rê de ne.  
Her roj di vê tirsê de ne. Ew çawa dibî. Nûha zirav  
bi we re nemaye.

-Em diçin û tîn, lê tu ka were wêna ji me bipir-  
se. Destê me di ser dilê me de em dibihurin. Ha li  
hev qewimandin, ha wê qewimênin, û emê di nav  
wan de bimînin. Tirs me ev e. Nexwe zanin ko em  
ne neyarê wana ne. Tiştêkî nabêjine me. Ew jî biroj.  
Ko bû êvar ew kesê ko te di serê kêş, di nav wan  
lata dîtî, dadikevin xwar. Hingî bibe mêr û ji vir bib-  
hure.

-Wala win hingî çi dikin. Ez dibêjim ji esrê û pê-  
de darnekevin rê.

-Çawa. Em dîsa diçin û tèn. Lê hingî dewriyê cendirme me li devê şewlê Meymunîyê de dirawestênin. Heta neh deh teqîsî, qemyon û yên din bi civin. Ko civîn, dewriya cendirma didin pêşîya me û me ji şewl dibuhêrênin. Dewriyeke din jî, li devê şewl î din e. Ew jî bi wî awayî yên ko jî wî aliyî hatî tênin. Ew jî heta yazdehê şevê. Piştî hingî ko tu beyî devê şewl, wê te li wir heta sibahî rawestênin. Hingî dewriyê cendirma jî nikarin ji şewl bibhurin. Şevl hingî dikevî destê paş mêrê axayê Rama.

-Biqasî ko min bihîst, axa û xort ji zû ve rahiştine hevdu. Axayê gewr ji hingê vê li vir asê ne. Ma tu nabêjî çî dixwin û çî vedixwin. Ne ko çûn Batmanê an bajarê din xort li wir in. Wê rihê wana di cih de bisitênin.

-Heyla tu çavêmin î. Ma axa li xwe diheyirin. Piştî duwazdehê şevê, dewlemendê Batmanê bi teqsiyê xwe ji wana ra her tiştî tênin. Bi kîsa şekir, birinc, arvan û xwarinê din. Heta fişêka, bi sendoqa ji wana ra tênin. Kengê dewlemend axa birçî dihêlin. Ko ji bêdela axa xort di vir de asê bana, hingî heqê te hebû. Wê ji birçîya diranê wana qîç bibana. Nikarî bûn xwe li vada bigirtana.

-Nexwe vilo?

-Vilo lê. Lê wala ez çima vana ji te ra dibêjim.

Tu vana ji min bi çend qeta çêtir zanî. Ez jî rabûme weke ehmeqa çîroka ji te ra dibêjim. Nûha te di dilê xwe de têra xwe henekê xwe bi min kir.

-Heşayî te. Ez henekê xwe bi te nakim. Ez bitenê yekbûyina axa û devlemenda zanim. Lê min yên di nizani bû. Wî te ew jî gotine min. Yan din, ev çend sala ez ne li vada me. Ezê ji ku zanibim.

-Wî te bi çavê xwe dît êdî. Ez bawerim ko tu carekî din bê vada, tê bi salawata ji vir bihurî. Tu narahêjî makîna xwe û nabî çerq çerqa te bi kişandina wêna.

Salawat û hew. Berî ko ez ji malê derkevim, divê ko ez wasêtiyê xwe jî bikim, got ciwan bi ken.

Ji wir û wê de êdî hew axaftin, heta devera ko wê Ciwan lê paya bibana.

-Bêje xuha xwê, got şifêrê teqşiyê. Bere îşev xwarinekê ji feqîra ra derxênî, ji bo ko tu sax gihayî vir.

-Ma ne heq e, got Ciwan berî ko teqşiyê birê bikî.

Xwe ji riya derî bajar berda nav sukê. Baskî mala xuha xwe ve çû. Ser dengêkî li nivê sukê de rawestî.

-Ciwan, got yek ji dikanekê. Waaa Ciwan.

Baskî dengê ko hat meyzand Ciwan. Di devê xwarinxanê de hevalkî wî biçukîyê rawestî bû. Lê dimeyzand û dekenî.

-Cindîyo ew tu bûyî, got Ciwan berî ko herî cem.

-Ez bûm lê. Ma yek li dora xwe nameyzênî. Weke kesikî biyan sere xwe berdaye berxwe û diçûyî. Ma te ne got di nav vaqas nasa de bê şilav ezê çawa bibhurim. Em zanin ko te bêriya xuha xwe xwarzîkê xwe kirîye. Lê mitala meke. Tiştik bi wana nehatiye. Mala wana jî di cihê cih de ye. Bere çavê te me jî bibînî.

-Tu rastî, got Ciwan, berî ko rahêji destê wî. Min ji ku zanî bû ko tu li vada yî. Min digot belkî tu jî weke min ji welat terqîyayî.

-Tu bi xêr hatî. De rune. Berî runiştinê bêje bê tê çî bixwî, piştra em halê hevdu bipirsin.

-Ne ez ne birçî me. Tu sax bî.

Der ji saxbûyîna min biqere. Xwarinxane yan min e. Dilê te çî bixwazî, bêje.

-Xwarinxana te pîroz bî. Lê dilê min naçî tişteki. Hey ezê çend roja li vir bim. Hingî ezê bêm xwarinke te bixwim.

-Nexwe şîranîkê bixwe.

-Ha ew bû. Ezê şîranîkê bixwim. Lê ez gelek pê kêfxwaş bûm. Kar çawa diçî.

Tu sax bî bira. Deriyê aboriya me ye. Wî nûha ez pê mijul dibim.

-Tu qenc dikî. Ma ji runiştinê wê çî bigihî destê



te. Pîreka te, zarowê te çawa ne?

-Hemu baş in. Yên te çawa ne?

-Yên min jî weke ko tu zanî. Ma wê çawa bin.

-De baş e. Hema ko baş bin, bese. Li bajarê ko tu lê çi heye, çi nîne?

-Wê çi hebî. Bajarekî mazin. Weke hutekî ye. Têrbûna wê nîne. Em jî tê de digindirin. Me jî bi yên din ra dihêrî. Ma li vada çi heye. Win çi dikin?

-Meyzê vêna bi tenê nepirse. Şagirtiyê te her roj ziravê me diqetênin.

-Ew berdestikê te loo.

-Ez ji gotinê te halî nabim. Bêyî virde wêde bêje de ez zanî bim. Berdestikê min kî ne.

-Xwe wilo ji nezaniyê newêne. Berî te û çend hevalê te kî hebû ko li vir Kurdîti dikir. Piştî we ev xort ked dan. Hingî ma nabin şagirtiyê te.

-Heyla mala te nevirîtî. Tu qala şoreşgera dikî. Min digot bê şagirtiyê min kî ne. Lê ez li ku, şagirtî û berdestiktiya wana li ku. Ez jî bi hevalê xwe re şagirtiyê rêya rast bûn. Ew jî ew rê dîtî, nûha di wê rîya rast de diçin. Hostayê me yek e. Em hemu şagirtiyê wî hostayî an hostaya ne. Lê win çima ji wana ditirsîn? Ma ne hemu zarowê ve ne. Ez bawerim ko kurê te jî di nav wana de ye. Ma yek ji zarowê ditirsî?

-Erê bavo. Em ji kêfa xwe ji wana ditirsîn. Tê hêj wana nedîtîye, tu wilo dibêjî. Di ka bibîne û piştra bêje. Di dema we de, win ji medîtirsîn, de kes ji me neçî gilihê we nekî. Win ji siha xwe ditirsîyan. Lê ma ev wilo ne. Nizanin rahêjin kefçiyê darî, her yek keleşînkofik di destê wana de li wada zîtirka diavêjin. Yan din, win di nav xwe de yekker bûn. Rêzanîke we hebû. Kes deynedikir yên din. Lê nûha vare meyzêne. Tu bi guhê kîjan ji wana bigrî, wê navê rêzanîkê ji te ra bêjin.

-Wê jixwe hebin birayê delal. Erê min got rêke me bitenê heye, lê dîtina herkesî di derheqa çûyina di wê riyê de ne weke hevdu ye. Herkes li gora xwe wê rêyê dibîni. Lewma wê rêzan jî hebin. Her tişt di

destpêkê de wilo ye. Piştra her tişt zelal dibî. Yan baş, yan qenc û yan hêja wê hingî derkevî holê. Heta ko dora xwe bibînin wê ev wilo herî.

-Ne ne wilo lo. Tarê bajêr li nav xwe leva kirine. Kî wêrî yek ji wana herî tara din. Wê têra wî lêxin. Ko hin dijî hine din bana, xem nedikir. Bere tiştê ji wana hat bikirana. Ne hemu qala Kurd û Kurdistan dikin. Vêca ev levakirina tara çî ye, ev lêdan û kuştin çî ye. Tê bîra te. Berî nûha axayê vir tar di nav hev de leva kiri bûn. Tara wî alî û tara vî alî. Qehwexanê hev jî ji hev veqetandi bûn. Yek ji vê tarê nikari bû herî li qehwexana tara vî alî rûnî. Hingî kuştin jî nebû, ji xeynî şerê di nav benda de dibû de. Ew bû ko nêzî-kayî nedidan hevdu. Wî nûha hemu biçek in. Hema ko nebî êvar, te dît ko qeflê xorta, çek di destê wan de, nehortiyê li tara dikin. Ez wî mêrî bibînim ko bişev ji mala xwe derkevî.

Meyzê ev yek li min jî nexweş hat. Gerek ne wilo bana. Rêzan bi darê zorê naçin serî. Erê wê ya xwe dîsa bêjin. Bikin ko gelek kes bigihin rêzana wana, lê ne bi darê kotekê, bi xweşî, bi halîkirinê ne. Kîjan ji wana rêzana xwe ji yên din qenc dan nasandin, rêya xwe zelal nîşeyî wana kir, wê gelek kes bigihine wana. Hingî wê rêzanê din jî ber xwe ji holê rabî. Hingî wê xelkê me jî bi dil û can piştgirtinê bidin wana û wê rêzana xwe bibin serî.

-Na bavo. Ew ne mihtecî xelkê ne. Ko hebana wilo li me nedikirin.

-Li gora gotina te, ez dibêjim tiştik bi te kirine. Nexwe tu evqas bi dilekî şawatî nedixiftî. Di ka wêna bêje min.

-Ez bêjim de tu henekê xwe bi min bikî. Ne wilo? Tê têra xwe bi min bikenî rabî herî. Ez nabêjim.

-Ko ne tiştêkî li kenê bî, ez ne henekê xwe bi te dikim û ne dikenim. Lê tiştêkî li kenê bî, ezê kenim. Lê dîsa henekê xwe bi te nakim.

-Lo kuro ne ew tişte ko yek pê nekenî. Ji alîkî kenê yekî pê te, ji aliyê din dilê yekî pê diêşî. Ev xortê bi saloxa xwende, wê çewtîyê bikin, yek bi wê diêşî.

-Ne min gote te. Ev hêj destpêke. Weke qolinca zayinê î darawîn e. Tê dît ko qolinc hat, lê pîrek ne za. Ev jî wilo ye. Tu çi bêji, ez bawerim ko hatîye kirin. Kes nikarî bêjî tiştê hatî kirin ser sadî sad rast in. Wê çewtî hebin. Lê ew çewtî wê ji alîyê wana jî bê dîtin. Roj bi roj wê wan çewtîya biavêjin. Di talîyê de ya baş û ya hêja wê minî. Di ka bêjê bê çi bi te kirin.

-Kuro berî du sê roja bû. Rêwingin hati bûn xwarinxanê. Heta derengîya şevê man. Pêwanê ez jî dereng çûme malê. Di riya mala min de çend xortê nenas û biçek, min di devê sikakî de rawestandî. Berî ko bi min ra bîaxivin, xwestin ko ez berê xwe ji wana vegeênim. Min berê xwe ji wana vegeand. Min dêhna xwe dayê ko barê min vegeandine alîyê qubletê. Min di ber xwe de got Mihemed salawat. Bi xwedê wê ev kes wê min kujin. Pêwanê berê min vegeandî qubletê. Min gomana xwe ji xwe birrî. Ez berbendî kuştina xwe bûm êdî. Min dît ko dengê yekî hat.

-Nûha bêje, got. Tu kî yî?

-Ez Cindî me.

-Ma tu jî axa yî?

-Axayê çi, halê çi bavo. Ez li ku, axatî li ku. Di bêjine min Cindiyê Mehmudê. Ma we axa di navê Mehmudê de bihistîye. Ez xwediyê xwarinxanekê me. Heta êvarî weka kera ji bonî parîyê nanê xwe dixebitim. Çend rêwingî xwarin dixwarin, pêwanê ez dereng mam. Nûha ji wir têm.

-Nexwe tu xwînmij î. Tu keda karkerê li cem xwe dixwî. Bi vê yekê tu ji axa kirasekî kê m pîstirî.

-Lo bavo ti karker li cem min nînin. Ji çêkirina xwarina, heta paqijîya xwarinxanê ez bitenê me. Ezê li ku keda karkera bixwim. Kure kî min biqasî we heye. Ew ji weke we ye. Di nav rêzankê ye. Ez rûwê wî jî nabînim. Carna tê têra xwe û hevalê xwe pera dibî û diçî.

-Kurê te di kîjan rêzanê de ye. Navê wî çi ye?

-Wala ez rêzana wî napirsim. Lê navê wî Besîm e.

Ser vê gotina min xwe dan alîkî. Bi piste pista wana di nav xwe de. Piştra pirsne din ji min pirsîn. Bê çi gotine hevdu, der ji min qerîyan. Ez bi baz çûme malê. Ez çûm, lê were tirsî ko min buwart, ji min bipirse. Ji wê rojê ve, ew zani bim ezê melyona bisitênim, li derengiyê namînim. Berî bibî êvar deriyê xwarinxanê digrim, ji êvarî ve dikevîm malê.

-Nexwe berê te dan qubletê, got Cıwan berî ko têra xwe bikenî. Di nav wê tirsê de te çawa dît ko berê te dane qubletê û tu salawata tênî.

-Ma ez ji ku zanim. Dema ko mirin hate bîra min, qublet jî ber çavê min xuya kir.

-Nexwe heqê te li tirsê heye, got Cıwan dema ko carekî din kenî.

-Çima ne. Heqê te li kenê heye heyran. Te hêj tiştêkî vilo nedîtêye û li gora dilê te bi min kirine, tu çima nekenî.

-Na kekê min. Na birayê min. Ne ko bi dilê min kirin. Tu ne kesekî vilo tirsonek bûyî, kenê min li tirsî te ye.

-Madem ne bi dilê te ye, nexwe tu çima tiştêkî nabêjî wana? Çima tu çewtîyê wana dadî ruwê wana. Hege nêta wana li kirina tiştêkî hebî, bere zordestîyê li me nekin. De em bi dil û can piştgirtinê bidine wana. Nexwe bişeref nikarin ji vir û wêde gavekî din bavêjin. Wê bên weke çuka wana berhev bikin û kes ji me serê xwe nazîvirênî alîyê wana.

-Heyla tu bave min bî. Ma ez kîme ko tiştêkî bêjîme wana.

-Qet nebêje, min der ji van tiştî qerîya. Ez bawer nakim. Nexwe tu nikarî tiştêkî bêjî wana?

-Ma yen ko namus di serê wî de heyî, der ji daxwaziya azadî û serxwebûna gelê xwe diqerî. Ma heta ko ev rih bi min ra bî, ez der jê diqerim. Lê ez bêjim jî, kes guhdarî li min nakî. Ew girêdayî komelekê ne. Pêwanê bi ya min nakin. Qey rêzana komela wana ev e. Tevgerê xwe li gora wê rêzanê dîkin.

-Ma tu ne hostayê wana yî. Te nivê imrê xwe di

Institut kurde de Paris

vê riyê de bihurand. Ji xeynî salên ko tê bibhurênî. Evqas keda te di vê riyê de heye. Evqas ked li ku ma.

-Ne min gote te. Ez ne hostayê kesekî me. Em hemu şagirtiyê hostayên vê riyê ne. Em bi ya wan hostaya bikin, bese. Hingî kes ji me çewtîya nakî.

-Hema sed carî bêje ko ez ne hostayê kesekî me. Ez bi vê nazanîya karim bêjim ko ti hoste ji te pêştir nîne. Hebin jî, hostayê bejik in. Ne hostene xas in.

-Bere kesekî din vê gotina te nebihizî gidî, got Ciwan biken. Hingî berê te nadin qubletê jî. Wê ti mirar bibin ceneta kera.

-Na yabo. Na qurban. Ez kengî tiştên wilo li ber kesekî dibêjim. Ji ber ko em heval in min got. Nexwe min nedigot. Dîsa min tiştik negot. Ma min çi got.

-Raste, got Ciwan biken. Te tiştik negot. De nûha bi xatirê te. Heta çend roja ez li vêdê me. Emê dîsa hevdu bînin.

-Tu ser serê min hatî, got Cindî. Ez li ber bendî te me. De em xwarinekê bihev re bixwin û qala rojê xwe yî berê bikin.

Xwarzîya Ciwan Gulîzer bi tenê li malê bû. Dema ko çav li xalê xwe kir, şaş bû. Bi lez çû destê wî. Wî runiştand. Kir ko xwarinê jêra bêhî, Ciwan nexwest.

-Der ji xwarinê bi qere, got Ciwan. Were li cem min rune. Ez dibînim ko tu mazin bûye. Bêje bê tu çawayî, çi dikî?

-Ma ezê çawa bim xalo. Weke ko tu dibînî me.

-Tu baş xwîya dikî. Ko yên din jî wilo bin, gelek baş e.

-Ew jî baş in. Li nav bîstan kar dikin.

-Tu jî karê malê dikî nexwe.

-Belê.

-Nexwe çiyî din?

-Xalo, got Gulîzer, berî ko milê fistanê xwe nîşeyî

Cindî bikî.

Bêje diya xalê xwe.

-Ma tu nabînî, got berî ko milê xwe qenc rakî.

-Ez tişteki nabînim, got Ciwan. Çi heye?

Ala Kurdistan li milê fistanê xwe nekiş kiri bû Gulîzer. Diva bû ko wêna şanî xalê xwe bikî de dilê xalê wê xweş bibî. Ciwan jî weke nedîtî, nenaskirî dikir de wêna bidî axaftin.

-Ma tu ala rengîn nasnakî xalo.

-Ezê ji ku nas bikim. Min tiştin li milê te de dît, min nizani bû bê çi ye.

-De henekê xwe bi min meke xalo. Tu çawa ala Kurdistan nas nakî. Ne diya min digot. Lawo ev riya xalê te ye.

-Heyla tu diya min bî, got Ciwan berî ko xwarzîya xwe hemez bikî, herî enîya wê. Nexwe te ev ji bonî xalê xwe li milê xwe neqîş kir. Ma te zani bû ko ezê bêm.

-Na, min nizani bû. Di milê fistanê min î din de jî heye.

-Ma diya te tişteki nabêjî te.

-Ma wê çi bêjî min. Hêj kêfxweş dibî. Ma kes maye ko ne daxwaz bî.

-Nexwe rast e. Te ne ji bonî ko ez kêfxweş bibim ala xwe li milê xwe neqîş kir. Tu jî di nav wan daxwaza de yî. Ez te pîroz dikim xwarzê. Ma bavê te jî tişteki nabêjî te.

-Ma tu nabêjî nûha bavê te li ku ye.

-Ne te got li bîstan in. Nûha li wir avdanê dikin.

-Avdana çi. Min ji xwe got li bîstan in. Ne li bîstan in. Neh deh welatpariz li bîstanê me yî dûr xwe diveşêrin. Bavê min her roj xwarinê ji wana ra dibî. Dîsa xwarin ji wana ra bir.

-Ma diya te jî pêra ye?

-Na, ew jî ji yekî din ra xwarin bir. Ew jî di şî-

kefta li ser razê me de ye.

-Tu çima nabêji me der ji karê xwe qerîyaye, em welatpariza xwedî dikin. Ma tu jî tiştina nakî?

-Ez jî arî diya xwe dikim. Xwarinê çê dikim. Ma ne bese?

-Çawa nebase. Tu çavê xalê xwe yî. Ez ji bedêla wana jî tême çavê te.

-Xalo min çayek ji te ra çêkirana. Diya min digot, xalê te gelek hez çayê dikî.

-Ez hez çayê dikim lê. De rabe çayekê halo tîr ji xalê xwe re çêke.

-Ne dût, berî çar sala, her sê xuhê Ciwan bi çavêkî ji girî warimî hati bûn mala wî. Pêşî di dilê xwe de gotî bû, qey mêrê wana tiştik gotiye wana. Di çavê wana de pêşî ev tê derxisti bû. Tu nabêji, ji devê xelkê hew hedara wana hatî bû. Ko herana kîjan malî, seba Ciwan li ber xuhê wî kiri bûn. Ji komunistiya wî, heta Kurdîtiya wî. Ew jî rabû bûn, hati bûn de Ciwan der ji van tiştên bîqerî û wana ji devê xelkê biparêzî. Wî nûha dibîni ko ji ber xwe arîkarîyê didin welatpariza. Ew jî dil dabûn azadî û serxebûna Kurd û Kurdistan. Daxwaziya dilê xwe êdî der dabûn. Daxwaziya wana vergeriya bû tevgerê.

-Xalo, got Gulîzer ji navmalê. Va dê û bavê min hatin. Xwe veşêre de ez xelatêke mizgîniya hatina te ji diya xwe bisitênim.

-Ne hewceye ko diya te xelatê bidî te. Ezê wê xelatê bidime te. Di ka bêjê bê tu çi dixwazî. Nûha ezê xwe li ku veşêrim.

-Ew tu bi kî ra diaxivî, got xuha Ciwan keça xwe, di devê derî de. Ew çaya di destê te de ji kî ra ye?

-Mizgîniya min li te, xalê min hat, got Gulîzer.

-Heyla nemayê. Ew tu çima nehatî pay me.

Bi lez şalika li navmilê xwe avêt navmalê. Çû çav û ruwê Ciwan. Wî runiştand. Li cem runişt. Dest bi pîrsa kir. Di vê naviyê de mêrê xuha wê



kete hindiru. Ew jî turikê li milê wî xwe de avêt anîşkekê. Rahişte destê Ciwan, berî ko ew jî runî.

-Tu wastayî xwîya dikî, got Ciwan mêrê xuha xwe.

-Wastîyayî û hew. Me malik li xwe xera kir. Ev du miha here û were. Ew jî hêja bana.

-Gulizer gote min. Ma ji vê hêjatir. Ev ji te tê, tu vêna dikî. Gerek te gazin nekirina.

-Lo bavo ez çawa gazina nekim. Me got li ber wan xwînmijê axa rubûne, hatine xwe li çiyayê me girtine. Em pê kêfxweş bûn. Me rabû parîyê devê zarokê xwe bi wana ra leva kir. Bi dilekî xweş, bi şahî me arîkarî dida wana. Ez îroj çûm çî bibînim. Wî hazîrîya xwe li vegeerê dikin. Tu nabêjî axa zordestî li dê û bavê wana kirîye. Ew jî hatinê kurê xwe ji rê kirine. Hiştine ko nerahêjin axa. Wê nûha herin dîsa bikevin davika axa.

-Ma tu nabêjî bê ew axa kî ne?

-Axayê Hesarê ne. Ji bav û kala axa ne û tiştik nema ko li serê gundîyê xwe û gundîyê girêdayî wana nekirî. Min got nûha wê ev xort wê mala wana li mîratê bigerênin. Ev du miha çekê wana di destê wana de, li dora axa digerin de derbekê li wana bixin. Di vê navîde min malik li xwe xera kir. Ma ez ew kesim ko deh kesa li çiya xwedî bikim.

-Qey nikari bûn li ber ruwê dê û bavê rabin, lewma der ji serhildanê qerîyana. Nûha axa darawin jî bi wana ra kirine, ew jî rabûn çûn.

-Ne divê di roja roj de vêna bidana ber çavê xwe. Gerek zanî bana ko yekê çuyî masîya, wê qun lê şil bibî. Ma ev karê zaroka ye. Îroj li ber axa rabe, siba li darawê wan axa bixape, rabe vegere. Ne ev nebû. Daxwazîya arîkarîyê di dilê me ked dabû, nûha ew jî nema. Di ka were piştî vê de arîkarîyê bide hine din. Ne wê di talîyê de tiştne din bêqun bikin.

-Di destêkê de wê tiştne wilo bibin. Xem nakî. Ez bawerim ko siba ev nabin. Lewma tu dîsa daxwazîya xwe yî arîkarîyê biparêze. Şoreş ne karê roj û miha

ye. Karê sala ye. Di van salan de elbet wê çewtin bên kirin. Bihna xwe farah bigre. Carekê lat ji cihê qeliqî. Edî hew xwe di cihê xwe de digrî. Wê rojekê di serê wan axa û hevkarê wana dewleta xwînmij bigindirî. Wî nûha tu li ber keda xwe yî du miha dikevî. Lewma tu ji wan xorta qehirî ye. Tê siba jibîr bikî. Di ka bihna xwe berde, emê piştra dûr dirêj biaxivin.

-Axaftina çî halê çî. Li min û sad bavê min heram bî, ko ez navê wana bêjim û qala tevgera wana bikim. Piştî nûha berê xêra xwe ji axayê xwe bibînin. Axa kuro.

-Ki zanî bê te çî gote wana. Nûha te suravka du miha ji serê wana derxistî ye.

-Ma mîne teksîr bikirana. Çî hat ber devê min, min gote wana. Ma çî heqê wana li min hebû. Min got win û axayê xwe ji hev re pîroz bin. Nanê ko ez bidime we qedîya. Dûr û nêzîk wê axa di rihê we de bêjî. Hege ko siba we nedana destê cendirma, ji xwe ez naaxivim.

-Hema ez dibêjim, nanê te birî te neda wana?

-Bere serê marê kor bixwin. Wê herana xwe teslîmî axa bikirana, Minê rabana xwarin bidana wana.

Serê xwe berda ber xwe Ciwan. Hew gohdarî li mêrê xuha xwe kir. Ti gotina wî li gotinê nema bû.

## JİYANA ŞEPİRZE

Sîyamend bi destê xwe cih li ber sifrê nişe Silêman da, de bê sifrê. Piştra cilika sifrê kişand ser kaboka xwe.

-Di ka were pêşî em firavîna xwe bixwin, got Sîyamend. Piştra em herin karê te yî li sukê birê bikin.

-Weke ko dawestina te li ber me de ne bes bû, em te bi xwarina xwe jî bixisirênin. Ma ev bû, got Silêman piştî ko hat ber sifrê. Ew jî cilik kişand ser kaboka xwe, dest bi xwarinê kir.

-Bi xwarinê kes naxisirî, got Sîyamend. Xwe qenc têr bike. Li ber karê we jî ez na dawestim. Em xwedîyê hevîn. Divê ko em arîkariye bidine hevdu. Kî yî te li bajêr heye ko tu herî cem.

-Bere rihê te ji me ra sax bî. Jixwe em tên. Ne tu nizanî bê çiqas xweşe ko xwedîyê yekî li her deverî hebin. Ew xwedî li hev xwedî derkevin û piştgirtinê bidine hevdu. Pişta wana her tim bi hevdu qewîn bî. Tî tirsê wana nebî ji sad qeda û bêlayê dinyayê.

-Tu rast dibêjî, got Sîyamend, berî ko çaya xwe ji nûve dagrî. Nexwe nûha têra arvanik genim ji te ra pêwist e. Nivê pera nûha, yên mayî di hatina carekî din tê bidî. Ezê bêm bêjime firotkarê genim de xwe li ber te bigrî heta hatina te yî careke din.

-Min ne diva bû ko ez te li buwarî kesekî kêm bikim, lê enceq têra du cara çêkirina nana ard li mal maye. Pêwanê ko tu bê xwe bidî ber min, ezê gelek kêf xweş bibim, got silêman dema ko xwe ji ber sifrê da alîkî.

-Ez ti kêmanîyê têde nabînim, got Sîyamend berî ko rahêjî qedeha çaya xwe yî nîvrê û xwe ji ber sifrê bikişînê paş. Herkes bi vî awayî dan û standina xwe dikî. Hew bi kesekî ra pere hene de hemuwî bidin. Dema ko firotker bi qerz tiştik da, divê ko bawerîya wî li wî kesî hebî. Ew nasê wî bî an kesekî nasê wî bi xwe re bibî. Bi gotinê devê min namehî. Ezê bi te ra bê û bêjimê. Wê firotker bi dilekî xweş bidî. Ne wî em du kes li ber in. Ew kengî bî, zanî ko wê perê wî bê dayin. Edî çi din dimîni.

-Ew jî rast e. Lê hema qerzdarî ne xweş e. Zivistaneke duvdîrêj di ser me de bihurî. Tiştik bi me ve nehişt. Te çi bibinî di bin destê xwe de, de tu bifiroşî. Hêj berx û kehrê me biçuk in. Ne dema qusandina kej û hirî ye jî. Ew e. Di heftiyê de çend cara, çend bar êzing, çend sitil mast em dibin bajarê xwe, difiroşin. Bajarê me jî ne weke vêdê ye. Hema bêje ji me ne dewlemendtir in. Nîvbajarek e. Ew jî bi piranî ji bonî dan û standinê têne vir. Edî hatina me yî gundîya di zivistanekê de ev e. Di ka vêca ji payizê dest bi kiryarîyê bike, heta derengîya beharê. Rih bi me ve heta hingî namîni. Hingî heta biqasî ko tu devê em şepirze ne. Edî ev ne salik û ne du sal. Tev jiyana me bi vî awayî dibuhurî.

-Ma hema heta kengî ev şepirzetî, ev belengazî. Ma win carna vê pirsê ji xwe nakin?

-Hema me ji xwe pirsî. Wê çi bigihî destê me ji vê pirsê. Emê ji bibine serî.

-Hema pirs baş in lo. Pirs li ser pirs. Heya ko ev pirs rojekê we aciz bikî. Win xwe li tiştina biqelibênin an xwe li bin guhê deverna xin. Ya devê kêrê, ya pişta wê. Em hingî bibînin bê wê çi bibî.

-Ma tu dibêji em ne aciz in. Wala ew e ko em ji acizbûna rihê xwe na fatis in. Lê ka em çi bikin. Hema me çû xwe li deverna qeliband, serê xwe li hê-

tna xist. Bi vê yekê emê çî bibin serî. Di talîyê de wê bejin, ev kes dîn bûye. Ev ji me re eyb û fihêtayî ye. Em ne ew kes in ko xwe li dîntîyê bixin. Emê bêjin çêrîya gundê me heye. Me rabû sevalê xwe di qet sê qet kir. Emê wana bifiroşîne ku derê. Dîsa emê bêjin, gundê me avî ye. Me şînayîya xwe deh qet bîst qet bêhtir kir. Emê bibine ku bifroşin. Wî tu dibînî bajarik bitenê û bi sadan gund li dora wî bajarî. Wê kîjan ji me karibî wan tiştî li vir bifroşî. Ne wê dîsa di destê me de bimînin. Piştra emê çî bikin li wî sewal an şînayîyê.

-Ne divê ko dîsa win tiştêkî bikin. Wilo naçî serî. Biqasî ko min dîtî û ji berî hingî ve, win wilo ne. Tiştîk nehatîye guhertin.

-Ne, ne wilo lo. Ne weke tu dibêjî ye. Çawa tiştin nehatine guhertin. Haya te jê nîne. Mala xwedê ava. Em pê xerîqîn.

-Xêr e. Win bi çî xerîqîn, got Sîyamend, berî ko Silêman ya xwe bêjî. Hema ez dibêjim we xezînen ji xwe re dît?

-Ma çîma ne. Çawa ne xêr e. Wî qemyon êdî tê heta gundê me. Em barê xwe tavêjinê û li pişta wê siwar dibin, di niv seatê de me diavêjî bajêr. Em dan û sitandina xwe bi rehetî dîkin. Karê heyî em diqêdênin û danê esrê divegerin malê. Ma berî nuha wilo bû. Em piştî nivê şevê şîyar dibûn. Me dida pay kerê xwe. Dibû hirtê hirta me di pay keran de, heta ko em bèn bajêr. Bi sad rezîlî em dihatin. Hêj me karê xwe nedîtî, te dît ko demê vegerê. De vêca dîsa bide pay kerê xwe û piştî êvarî vegere mala xwe. Îroj edî ne wilo ye. Wî tu dibînî, berî firavîne ez hatim. Hema bê min te ji xew şîyar kir.

-Hela malê, got Sîyamend biken. Çî xerîqîn bavo. Kuro heyra ma ew qemyon ji bonî te tenê wêde. Ew rê ma jîbonî te hatîye çêkirin. De tiştê di destê we de hêj çêtir ji we bisitênin ew rê çêkirin û ew qemyon tê heta gundê we. Hege bi hatina qemyonê wê hêj behtir bifiroşîna, gotina ras bû. Lê wî te bi devê xwe got ko, di çandin, kirina we de tiştîk bi ser neketîye de win hêj bêhtir bifiroşin. Ne win, ew bi we

dixeriqin. Toza ko we di pišta qemyona de qurpand, li wê fêde dimînî.

-Li qirêja şefqa Silêman meyzand Sîyamend. Li ti-lîhê lingê wî yî ji gora derketî, li cakêtê wî yî ko tu bi takî bigrî, wê çend pîne bi hev re jê bikevin meyzand.

-Kurê min, got Sîyamend, dema ko bakire kurê xwe.

-Fermo yabo, got kurê wî di ber hazirîya xwe yî dabistanê de. Ma te tiştik ji min xwest.

-Wî cakêtê min î qehweyî û cohtik ji wan gorê min î situr bêne, de xalê min Silêman wergerî.

-Ne, ne hece bû, got Silêman. Wî cakêtê min heye.

-De xem nakî, got Sîyamend. Vana jî li xwe bike. Hey ez wî cakêtî ji zûve li xwe nakim. Ji bedêla ko li wir daleqandî bimînî, bere li te bî.

-De malî ava, got Silêman, li ser rabûnê.

Bi hev re ji malê derketin. Di ber eresa bajêr ve bihûrin. Berê eresê ji pîrekê mastfiroş ra veqetandî bûn. Çavê xwe li nav pîrekê mastfiroş, li keça xalê xwe yî Selhî gerand. Ew jî, di nav pîrekê gundî de, di ber sitilê xwe yî mast runiştî bû. Destê xwe jê ra rakir Sîyamend. Nişana vegeêrê jêra kir.

Li vegeêrê, berî Sîyamend çend zilamê bajarî hati bûn eresê, bi pîreka ra mast bazar dikirin. Pêşî bi çembilê sitilê digirtin. Di hejandin. Li siturîya mast, li tuwikê ser dimeyzandin. Bi tiliha xwe ji keviya sitilê mast dibirin devê xwe. Li tama mast dimeyzandin. Ko li hev hatin, pîrek di rahişte sitila xwe, bi zilam ra sitila xwe dibir mala wî.

Sîyamend di pay keça xalê xwe ve zîvirî. Çû li pay rawestî. Destê xwe danî ser milê wê.

-Tu bi xêr hatî xuha min, got Sîyamend, dema ko keça xalê wî serê xwe lê zîvirand.

-Xêra xwedê li te, got pîrek. Tu çavê min î.

-Pîrek rabû şipîya. Du gav xwe ji sitilê xwe da paş. Çû milê Sîyamend.

Tu çawa yî lê. Ev tu çima hev xwîyadikî?

-Çawa ez xwîyanakim. Ez herroj li vir im. Ew e ko em hevdu nabînin.

-Ez zanim ko tu her roj li vir î. Lê çima em hevdu nabînin. Ez dibêjim te rîya mala min jibîr kir.

-Ez ji ku zanim. Hema ez nehatim, got bi tawandîna serê xwe re.

-Pêşî serê xwe rake, got Sîyamend, berî ko tiliha xwe bikî bin zêniya wê û serê wê rakî. Piştra bêje çima hema tu nehatî.

-Di serma û seqema zivistanê, di bin baran û berfê de, dilê te nehila ko ez bi wan cilê şil, bireil, li eresê, li ber sitila mast runim. Te kir ko her sibah mastê xwe ji we re bênim. Lê ez zanim ko nûha win ji xwarina mast kerrixîn. Hew dilê we diçiyê. Min xwe ji we qenc aciz kir. Wî em derketin beharê. Edî hew li min sar e. Baran hew ewqas dibarî. Ji sermayê jî nareilim. Lewma ez hew hatim.

-De meyzê bê çi tiştê tînî bîra xwe. Kî got ko te me ji xwe aciz kir. Ma kes ji keça xalê xwe aciz dibî? Ne hêj hewa germ nebû ye. Hêj sibahê baharê sar in. Hete derengîya rojê hewa germ nabî. Dîsa wê li te sar bî.

-Ez zanim bê tu çi dibejî Sîyamend. Ez zanim ko dilê te bi min ve ye birayê delal. Lê ne rojik û du rojin. Sal duwazdeh mih, hêj ji keçkanîya xwe ve ez di vê riyê de me. Emê bêjin te min vê zivistanê ji sermayê parist. Ma zivistana bê. Salê li pêşîya me. Wê hingî çawa bibî. Di vê navîyê de ti heqê te û min li zarokê te nîne ko em wana herroj mecburî xwarina mast bikin. Ew jî gunehin bavê min. Ya baş ew e ko ez dîsa mastê xwe li eresê bifiroşim û serê çend roja serîkî li we bidim. Firavineke we bixwim û çayeke we wexwim. Ma nebese. Tu jî ji malbata bavê min î. Ha mala te, ha bavê min. Çi ferq heye. Tu çavê xuha xwe yî.

Bieqila birayê xwe. Ez jî zanim rizgarbûna te ne bi kiryarîya mastê te yî rojik, du roja ye. Ne tu bitenê yî û ne bitenê gundê te ye jî. Sê parê pîrekê-

gundê dora bajêr herroj mast tênine firotinê. Win he-  
mu di bin vê şilî û şapalîyê de, di bin berf û barana  
zivistanekê de, di ber vê ba û bahozê û di wê seqemê  
de, qonaxa du seata, di du destê we de du sitilê mast,  
hêj bajarî di xew de win tèn, nivqafilî, bireil li ber  
sitilê mastê xwe dirawestin. Heta ko efendîyê bajarîya  
şîyar bibin, bèn mastê we bikin. Ne roj û mih. Bi  
salan halê we ev e. Dema ko ez te li vir dibînim, tiş-  
tin ji hinavê min diqetin.

-Ma em çi bikin birayê delal. Ko ne ji vî mastî bî,  
emê aboriya xwe yî zivistanekê çawa bibhurênin. Ma  
em jî navên weke pîrekê bajarîya di germayîya mala  
xwe de bin. Bitenê karê malê xwe bikin. Lê tu dibînî,  
nabî. Qey qedera me wilo ye.

-Ez nabêjim pîrek bitenê ji bonî karê malê ne.  
Weke bajarîya yek kes ji malê kar bikî û yên din  
bixwin. Dîsa ya baş win dikin. Herkes li gora karîbûna  
rahêjî karekî û bêşdarî aboriya malê bibî. Lê ne wilo.  
Ne bi şepirzetî. Rênin hene ko winê karê xwe bi  
xweşî bişahî bikin.

-Ma ka xwedooo. Ka ew roj ko bèn.

-Hatina wan rojan ne karê xwedê ye. Xwedê ko tê  
derxî win li berbendî wî ne, wê xwe hêj li we giran  
bikî. Ev karê bav, birâ û mêrê we ye. Karê gundiya  
ye ko bihevreyî pêk bikin.

-Mêyze nûha nebû. Ko em berbendî mêrê xwe bi-  
mînin, em piştta situwê xwe bibînin, em wê rojê nabî-  
nin. Ew kengî serê xwe bi me diêşînin. Hey em diçin  
û tèn bajêr. Karê malê jî tê kirin. Ma kengî tiştina ji  
me ra dikin. Ew e ko hin wî tiştê ko tu dibêjî ji me  
ra bikî.

-Ew tişt bi kesan jî tê kirin. Ne ko nabî. Ya baş  
ew e ko win bikin. Ko hine din wî karî kirin, wê bibin  
beşdarê parîyê we. Winê kesne din bi keda xwe dew-  
lemend bikin û li serê xwe bikin beg.

-De bavê xuha xwe. Bê tu tişteki wilo ji me ra  
nadî kirin. Wî kekê min Hacı Seîd li aş e. Here bê tu  
naxî serê wî. Jixwe divabû ko te bibînî. Ew jî digot,  
min ji zû ve Sîyamend nedîtîye. Gelo çawa ye, digot.



Him hevdu bibînin, him wî tiştî bêjiyê. Gelek bawer-wiya wî li te heye.

-Nexwe ez çûmê, got siyamend. De nûha bi xatirê te. Lê dîsa tu were mala min. Tiştina neyêne bîra xwe.

Destê xwe li milê keça xalê xwe da berî ko ji wêdê dûr bikevî. Di sikaka pêş xwe de zivirî baskî aş. Çend pîrekê Ezîdî, di bin piştîyê hejika de, du taw bûyî, di serê sikakê de berbendî kiriyara bûn. Ew jî ji terqîna sibahê ve di bin wan piştîya de bûn. Hêz di paqê wan de nema bû di bin wî barî de. Siyamend di nav wan de bihurî çû devê êş. Du zilam di devê êş de, ketibûn qirika hevdu. Ser tiştêkî miqeresî dikirin.

-De here Kurmancê pîs, got yek ji wana.

-Ez Kurmancê pîs bim, tu çi yî lawo, got yên din.

-Ez bajarî me lawo.

-De tu li devê wî meyzêne. Ko dibêjî ez bajarî me. Ku dera te bajarî ye. Ko yek bi runiştina bajêr bibu-wana bajarî, ker jî wê bibana bajarî. Wê ew jî ji kerîtiya xwe derketana. Tu jî weke kerê bajara yî lawo. Çi ferqe te ji kera heye. Hêj partalê ko li gund li te ne. Edî nizanîm bê ku dera te bajarî ye.

-Wala te xweş got, got Siyamend bi ken.

-Ma tu nabînî lo, got zilam bi hêrs. Ew jî Kurmanckî weke min e. Heta par, ew jî li gund bû. Wî nûha bi runiştina bajêr xwe li min diqerêsî. Henekê xwe bi Kurmanctîya min dikî. Ko te bigotana, heqê te hebû. Lê ew?

-Tu li hevalê xwe nemezêne. Hema ez dibêjim nizanî bû ko çi bêjî. Ew hat ber devê wî, wêna got. Nexwe ew jî zanî ko Kurmanc e. Bi runiştina bajar an gunda ji Kurmancbûne dernakevî. Em hemu Kurmanc in. Ya rastî, em hemu Kurd in. Hîmê me ev e.

-Ew çima, got zilamê pêşî axaftî. Bajarî ji ku Kurmanc in.

-De here lo, got Siyamend. Te çi zû aslê xwe winda kir. Ko tu herî nav Tirka, nexwe tê bibî Tirk?

-Ew min qebûl nakin. Ezê çawa bibim Tirk.

-Nexwe weke cuwamêra bi hevalê xwe re biaxive, got Sîyamend, berî ko bibhurî hindiruwê êş.

Kurê xalê Sîyamend di anîşkke aş de, ser barê arvanê xwe runiştî bû. Berbendî dora xwe yî hêrandinê de bû. Sîyamend çû cem. Rahîştine destê hevdu. Ew jî li ser barê arvan runişt.

-Tu çawa yî, got Sîyamend. Jinxala min, malîyê te çawa ne.

-Hemu baş in. Diya min tê çavê te. Zarok û malîya te çawa ne?

-Hemu baş in. Têne destê te. Win ji zû ve xwîya nakin. Me bêrîya we kir. Jinxala min carna serî li me dida. Wî ew jî hew tê.

-Ne tu jiyana gunda biqasî me zanî. Tiştik di holê de xwîya nakî, lê dîsa serê me ji kar ranabî. Mijulîya dinyayê ye. Ne ko tu nayê bîra me. Ha îroj em herin serîkî lê bidin, ha siba. Bi ti awayî pêk nayê ko em bên.

-Belê, ez bi karê we zanim. Lê carna jinxala min dihat. Me bihna xwe pê derdixist. Hey win nikarin bên. Car car wêna bişiyêne.

-Diya min ket xwarzê. Ne weke berê ye. Li xwe kasile ko derkevî derî malê.

-Ne demê ketina wê bû. Ne di wî imrî de bû ko bikevî. Lê ez dibêjim ev riya bajêr wê qedand. Serma û seqema sala wê qedand. Nexwe ne ya ketinê bû. Nûha jî keça wêna, pîrekê gundîya li ber qedanê ve diçin.

-Diya min ev deh sal hene ko ji bonî firotina nayê bajêr. Piştî bavê min ew bû sermiyana malê. Çuyin û hatina wê yî bajêr, bitenê jibonî danûsitandinê bû. Xuha min û pîrekê gundîya jî ne bi hemdê xwe tene bajêr. Hatina wa yî bajêr alîk ji karê wana ye. Sê behrê aborîya me î zivistana ji firotina mast e. Em salekê li ber zevîyê xwe didin. Ençaq têra ervanê nanê me û savara me genim derdikevî. Bi firotina sevala, hirî, kej û mast ençaq abor dibin. Pîrekê me ko neyin û neçin, emê çi bikin?

-Ne bêyî hatina bajêr î pîreka winê karibin mast

û runê xwe bifiroşin. Ne pêwiste ko win bênine bajêr.

-Hema tu jî yek ji gundîyê me. Bibe mêrê çê û bêyî hatina bajêr mast û rune xwe bifiroşa de ez te bibînim.

-Ne bi min bitenê nabî. Divê ko ji kêmasî nivê gundîya an jî di destpêkê de neh deh mal bi min ra bin. Nexwe ez jî bitenê nikarim.

-Hema bêje em deh mal bi te ra ne. Di ka bêje bê emê çawa mastê xwe bê çuyîna pîreka î bajêr bifiroşin.

-Ko deh kes bi min ra bin, ezê kooperatîfkê vekim. Wê avayîke kooperatîfê li gund hebî. Ezê firaxê me-yandina mast û derxistina run deynim wê avayîyê. Piştra ezê ji van firaxê naylon kirim. Ji tera sad giramî heta kêlokî. Ezê şîr bixime wan firaxa. Bimeyênim. Piştra ezê bêm dikanekê li bajêr bigrim. Yek an du kesa li wê dikanê de runênim. Ew mastê di wan firaxe naylon de bêmim deynim wê dikanê û li ber runim. Sibahî ko bajarî ji bonî kiryarîya mast ji malê xwe derketin, rast wê bêm ber dikanê, li gora pêwistîya xwe mast kirin û vegerin mala xwe. Her roj wê karê xwe bi vî awayî bibim serî. Ev jî kareke. Lê karekî weke insana ye. Ev çi rebenî û şepirzetîya pîrekê wê ye ji salan û vêde.

-Wala tu xweş dibêjî xwarzê. Lê ka ew gundîyê ko bêm bikevin ew tişta ko tu dibêjî. Xwe nadin ber tiştê ko pê nizanin. Ew e ko yekî bajarî bê tiştêkî wilo vekî û bibî serî. Nexwe ne ji me tê, ne kesik xwe didî berê. Hingî emê şîrê xwe bidine wana. Ew çawa bivên, bere bi wî awayî pê karê xwe biqedênin.

-Ne hingî winê destikî din bixin nav xwe û bajarîya. Wê ew jî tiştêkî ji bonî xwe ra biavêjî ser. Bi vî awayî ne bajarî, dîsa winê xisirin.

Nexwe nebêje.

-Divê em bêjin xalo. Bê gotin nabî. Hema tu yek ji wana. Sê mêrê sê keçxalê min hene. Em bi we dest pê bikin. Zehmetîya me heta firotina dû sê cara ye. Piştra wê hine din ji ber xwe bêm. Ev yek ji bonî bajarîya ra jî baş e. Ji bedêla serî heftîyê carekê si-

tilik mast bikirî, wê bê herroj yek an du ji wan firaxwe mast bikirî.

-Ma ev tişt bê pere diçî serî. Ne pere jêra lazim in. Di ka emê wan pera ji ku bênin.

-Ne, gelek pere jêra nepêwîst e. Kiryarîya wan firaxê naylon, û dolabik ji van dolabê ko bi cereyanê sar dibî wê bê kiryarî. Yê din winê pêşî ji malê xwe bênin, heta ko win karibin wana jî bikin. Hema ez dibêjim wê evqas pera bi we re hebin. Ko nebin jî, çend sewalê xwe yî sitawr an çend golik we firot, eva bû.

-Wî nûha bi deva bû. Edî ma xwedê. Wê helbet delîlekî şanî me bidî.

-Lo bavo ev kar ne ewqas mazin e ko win arîkariyê ji xwedê bixwazin. Wî wê daxwaziyê ji karne ji milê we neyê ra bihêlin. Weke ko min got, gelek sehl e.

-Ne dîsa bêyî xwedê nabî xwarzê. Divê ko xwedê bi me ra bî. Nexwe di cih de wê sitiwê me bişikî, emê nikaribin tiştê di dest de bikin.

-Qet mitala meke xalo. Ne xwedê gotîye rabe, ez bi te ra me. Hêj ji roja roj gotîye ez bi kesê rabûyî ra me, ne bi yê razayî ra. Nexwe bi we ra ye. Qet mitala meke.

-De ma xwedê. Nexwe roja yekşembê ezê li mal bim. Naçim kar. Tu jî were. Emê nasê xwe bicivênin. Tu wan tiştê ji wana ra jî bêje. Heye ko bikevi serê wana jî.

-Nexwe ez roja yekşemê li gundim. Lê divê ko tu arîkariyê bidî min.

-Di ka were. Hingî arîkarî sehl e. Hema ezê bêjim bi çend sewala li ber xwarzîyê xwe xisîrîm. Ma wê tofanin li ser serê min rabin.

-Serê te hazar salî bî xalo, got Sîyamend. Ne çend sewal, ez nahêlim tu bi giskekî gurî bixisîrî.

Qederekî din bi hev re man. Bi kêfxweşî ji aş derket. Berê xwe da eresa mast, De mizgînîyê bidî keçxala xwe.

## BEŞDARÊ KEDÊ

Rojbaşî da yên li binê siha dara tuwê runiştî, di ber vekirina werisê barê kerê xwe ve. Singa xwe alîkî têrê, werisê aliyê din hino hino şist kir. Barê nîska ji dehm de daxist. Rahiştê bar, bir danî ber qentarê. Xwihdana enîya xwe bi zendika îşlikê xwe paqij kir. Tawîya weris. Ji erdê da hev. Bir ser kurtanê kerê girêda.

-Qasim, got, bi labitandina milê xwe ra, di bin îşlikê xwe yî ji xwihdanê şilbûyî. Piştra domî axaftina xwe bike. Ka barê min bi kişênê, de ez herim. Heye ko ez heta êvarî barekî din bênim.

-Way ser serê min, got Qasim biken. Ma te çî got ko heta îroj min nekir. Derhel ezê kişênim.

Axaftina ko bi yên dora xwe re dikir nîvrê hişt. Rabû barê zilêm î nîska kişand. Li deftera xwe yî ko ji cem xwe kêm nedikir de nivîsand.

-Tu bi yên hine din ra tevluhev nekî, got zilam, berî ko li deftera li destê wî de meyzênî.

-Weke ko tu bi xwendinê zanî li defterê dimeyzênî, got Qasim. Lê mitala meke. Herkesekî rupelekî wî heye. Min yên te li rupela te de nivîsî. Bi vî awayî tevluhev nabî.

-Ma ji zanîbûna min î xwendinê min meyzand. Hema min ji xwe re meyzand. Tu zanî ko malê feqîra di çavê wan de şîrîn e.

-Ne malê feqîra bitenê ,got Qasim. Malê herkesî di ber çavê wî de şîrîn e. Kî divê ko malê wî winda bibî. Tu bêne. Ew libik jê winda nabî.

-Kes navê. Lê ko winda kir û di destê wî de tiştik nemînî ko cihê yên windabûyî dagrî, hingî wê çî bikî, got zilam bi valakirina barê xwe re, ser nîskê civayî.

-Çend barê te man li anînê?

-Hema ez dibêjim wê du bare din derkevî. Lê bê çî derket. Yên heyî ezê bênim.

Ew e. Bê çî derket e. Tu jibîr nekî. Bêje gundiye xwe. Wê siba qemyona birina nîska bê. Bere destê xwe sivik bigrin. Ko man qemyonekî din, wê perê xwe dereng bisitênin. Yên ko berî nûha nîskê xwe anîn, bere bèn perê xwe bisitênin.

-Ezê bêjime wana, got zilam.

Têra vala avêt ser kerê. Ji erdê rahiştê darê xwe. Ji wir dûr ket. Li zilêm meyzêne, got di ber xwe de. Li tîla wî xweş nehat ko min li defterka wî meyzand. Weke cuwamêra, perê min di cih de bide min, de ez li defterka te nemezênim. Va tiştê bêqûn dikî. Ji xwe eqlê min jê nabirî. Ezê nîskê xwe bênim bidimê. Wê ew bişiyênî nizanîm ku derê. Piştî nîskê min çuyî ra wê perê min bişiyênin. Wê bakî min. Ezê bêm perê xwe bisitênim. Ev ne tu kar e, lê wî dikî.

Ev çend sal hene ko di zik hev de Qasim dihat gundê Xelîla. Her sal cara yekemîn, ser qediyana perê gundiya dihat. Perê ko ji bazirganê mazin sitandî, belayî nav xwedî paz û xwedî zad dikir. Wana ji zivistanê bi xwe ve digirêda. Di hatina duyemîn de û yên din de hirî, kej, eyar, behiv nîsk û nehk berhev dikir. Bi qemyona dişiyand Entabê. Bezirganê Entabê î girêdayî bazirganê hêj mastir î Adanê, di hemberî tiştê ko Qasim şiyandî lê divegerand, ew jî belayî gundiya dikir. Di nav wî û bezirganê mazin de ser sadî nizanîm çiqas behra Qasim jî hebû. Di talîyê de Qasim diçû, behra xwe ji bezirgan disitand.

Qasim di nav gundîya de gelek dewlemend hatibû naskirin. Ko ne wilo bana, kengî perê wî têra kiryarîya vaqas tişta dikir. Lê tê dervedixistin bê çima heta vegera qamyonê perê wana nedida wana. Nizani bûn ko quruşikî Qasim di holê de nebû. Ji gundîya disitand, dişiyand, difirot, perê wana dida wana. Ew jî aborî ya xwe bi vî awayî û bi sad qetî gundîya dikir. Gelek cara gundî ji nedana perê wana pêşin, jê diqehirîn. Lê nedihîştin ko de tê derxwî. Çend roja perê wana bi derengî biketana jî, di talîyê de perê xwe tamam disitandin. Ji alîkî jî, hema bê mecbûr bûn ko bi Qasim ra bi vî awayî dan û sitandinê bikin. Ji xeynî çûn û hatina bajêr î qonaxa rojekê sihhê, bezirganê wêdê ji Qasim neçêtir bûn. Ko Qasim herî, hine din di dewsa wî de bên, wê jê neçêtir bana. Berî Qasim yekî din hati bû. Pêşî perê wana tamam dabû wana. Lê di talîyê de perê nofatalî nedabû wana. Ji xwe ji wê rojê ve xwîya jî nedikir. Ji ber perê wana bazda bû. Lewma dengê xwe li buwarî Qasim dervedixistin.

Çend gundne din hebûn li hawîrdora gundê Xelîla. Xelîla bi mazinbûyina xwe navendîya wan gunda dihat zanîn. Di nav wan gunda, gundik bitenê, Gundik Hacî Mirad avî bû. Yê din hemu bej bûn. Ava vxwarinê jî ewqas nebû. Yan heyî jî, ava baranê bû. Ji zivistanê çal û sarincê xwe ji ava baranê dadigirtin. Ew û sewalê xwe havîn û payizik ji wê avê vedixwarin. Salin baran kêr dibarî têra dagirtina çal û sarincê wana nedihat. Hingî mehteşî dest pê dikir. Ji malê kesik an du kes, çêr, teneke û meşkê xwe diavêtin ser pişta kerê xwe û têra ava mala xwe yî rojî dianî.

Tevlu Xelîla, tev gundê herêmê di çiyê de bûn. Pêwanê zevîyan wan gunda î çandiniyê kêr bû. Hema bêje herkes, ji xeynî çend mala, wek hev xwedî zevî bûn. Zevîyên bikêrî çandiniyê neyê, kiribûn raz. Ji aliyê hatina tirihi, dims û behîv, raz ji zevîya çêtir ber didan. Berî çend sala û wêdê, gundîyê dora Xelîla û Xelîlî, tirihe xwe dibirin gundê Cizirê, Şirnaq û Silopî û rexê Sêrtê, bi dexil û xwe diguhertin. Têra xwe dexil ji wan gunda, ji Sêrtê ketibû destê dewletê, gundî hew kari bû bi tirihe xwe biguherênî. Edî bi pera dikirin. Lê dîsa domî bi guhertina dexil dikirin. Bi tirihe mazrona jî dimsa xwe çêdikirin. Her mal ji

xwe re çend cêr, den û meşk dims çêdikirin. Ew jî têra wa yî zivistanek û havînek dikir. Gelek danê xwe yî xwarinê bi dimsê dibihurandin.

-Qasim, got keyayê gund, di nav axaftinê de. Xwî-ya ye ko tu gelek bi eqilî.

-Tu jî cuwamêriya xwe dibêji, got Qasim. Lê te bi çi tê derxist ko ez gelek bieqil im.

-Hema wilo. Tu ne bi eqil bana, ma te ev kar dikir. Tê tiştne din bikirana. Di salê carekê were perena bide xelkê. wana bi xwe girêde, nehêle ko tiştêkî bidin bezirganê din. Piştra were rune. Qent-  
ra ke biavêje vêde. Bere xelk barê xwe bînin. Ba-  
vêjin ser qentarê û valakin ser nîskê civayî. Tu bi-  
tenê rabe li darê qentarê meyzêne. Binivîse defter-  
ka xwe. Tiştê hatî bisipêre xwe. Berê qemyon bê.  
Tiştê civayî bibin. Perê ko şifêr anî belayî xwediyê  
nîska bike. Piştra pal bide bin siha dara tuwê. Çaya  
xwe deyne ser êgir. Pakêtê cixarê biqunik deyne  
ber xwe. Bere kesê weke min bere dayî bîn li dora  
te bicivin. Heta êvarî jî wana ra biaxive. Ma jî vî  
karî sehlîr karne din hene.

-Dinya li ser dan û sitandinê hatiye avakirin bi-  
rayê delal. Hin wê din, hin wê sitênin. Karê min  
sitandin e. Sitandin jî weke ko tu dibînî ye. Ma  
cohartî ye ko ez rabim rahêjim halet û gêsîne xwe,  
tavr û berê xwe, herim zeviya xwe. Heta êvarî bibî  
hirte hirta min. Di dawiyê de jî, weke adetê bere  
zikê min têr nebî. Lê weke ko min got. Dinyaye  
divê ko bazirgan jî hebin, cohartî jî.

-Ne min got lo. Tu bi eqil î. Lê yan rastî, ev  
tiştêkî neheqî ye. Weke to gotî, bere salekê bibî  
hirte hirta me di zeviya de, dîsa bere zikê me têr  
nebî. Tu rahêje darê qentara xwe û qederê mihekê  
lê meyzêne. Piştra, mihê mayî piştezik raze. Ma ev  
bû.

-Bi wî aliyê xwe ve bezirganî sehl e. Bi aliyê  
xwe yî din ve, biqasî ko neyê bîra te zehmet e. Şî-  
yarî jêra divê. Divê ko çav û guhê te her tim vekirî  
bî. Sêhra vir û sêhra dinyayê divê ko tu jî ber ça-  
vê xwe dûr nekî. Dema ko em zivistanê pera belayî



xelkê dikin, em ti sêrî nabêjin. Em ser sêhra pêşî ko hatî danîn ya xwe dideynin. Li ser vê sêhrê herkes perê xwe disitênî. Heta taliyê jî em ser sêhrê dirawestin. Weke ko we dîtî, sêhr jî di cihê xwe de namîni. Te dît ko di cih de ket an rabû. Te dît ko ev jî hat guhertin. Te dît ko kete bin sêhra ko tu pê dikî. Bi miha wilo dimîni. Di vê naviyê de win perê xwe zanin. Ketina sêhrê ne xema we ye. Ne di rojekê de, di seatekê de kes pê dikevin. Sermîyana wana î heyî, ji destê wana diçî. Ew dewlemdî çem û çem diçî. De vêca bêje. Ku dera bezirganiyê sehl e.

-Hema ez dibêjim ko xisar dîsa li me ye.

-Min tê dernexist. Ew çima xisar dîsa li we ye. Ez perê we didimi we. Ew sêhr bikevî ew rabî win perê xwe zanin. Vêca xisara we li ku dimîni?

-Bêlê, win pêşî sêhra tişteki nadeynin. Bê sehra rojê çawa bî, li gora wê sêhrê win pera didin. Heta vêdê rast e. Ev jî di kiryariya hirî, kej, eyar û behiva de wilo ye. Dan û sitandina wan tiştî di çend rojan de diqedî. Ko hate buwarî nîsk û nehka win wilo nakin. Ko sêhr ket, win sitandinê di rawestênin. Dema ko sêhr ketî, we ke ko min got, win hew disitênin. Win me li hêviya sêhrê dirawestênin de heta ko dîsa rabî. Em dibînin ko sêhr narabî. Win divên ko em li sêhra ketî de nîskê xwe bidine we. Hey we têra perê li kesa belakirî di wan du roja de paş disitênin. Edî ko nedine we jî, ne xema we ye. Ne dîsa sêhr di destê we de ye. Win zanin ko em ji zivistanê nû derketine. Em hewceyî pera ne. Em mecbûrin ko nîsk û nehkê xwe bidine we. Win sêhrê dikevênin. Divên ko em li ser sêhra ketî malê xwe bidine we. Em dirabin malê xwe didine we. Heta ko malê me qedî, te dî ko sêhr di seatekê de rabû. Hingî dema firotina we tê. Di wî demî de êdî win piştî pera dişikênin.

-We dît ko sêhr ket. Win jî nedin. Bihêlin heta ko sêhr hewakevî. Di wî demî de win jî piştî pera bişikênin.

-Heyla tu çavê min î. Em çawa di sêhra ketî de nedin. Tu dibêjî nûha berikê me tijî pere ne. Bi

bihna farah. Kengî sêhr hewakevî, em hingî dest bi firotinê bikin. Ma em xwedî gund, xwedî bi hazaran coht zevî ne. Enceq ew kes tiştê ko tu dibêjî dikin. Ew, ne mihekê, salekê li berbendî hewaketina sêhrê birewstin, ne xema wana ye. Ko we sêhr ketand. Ew jî deriyêanbarê xwe didadin. Libekê dernaxin derve. We di pay xwe de dibazênin. We mecbûrî hewaxistina sêhrê dikin. Bi vî awayî, ew jî bi we ra têra xwe pera disitênin. Situwê wan î situr, hêj si-turtir dibî. Yên ko dixisirin, weke ko min gotî, ji roja roj em gundî ne. Heta par min jî vê nizani bû. Mamosteyê gundê me got. Piştra min meyzand ko rewş, weke ko wî gotî ye. Ne weke gotina te ye.

-Madem mamosteyê gund bi vaqasa zanî, çima nayê bazirganîyê nakî. Bere der ji mamosteyîyê bi-qerî, bê bazirganîyê bikî, de ez wîna bibînim.

-Ne te got ko zaneyî jêre divê. Ew jî van tiştê xweş zanî. Lê ez nebawer im ko bikî jî, win wîna di nav xwe de nahewênin. Di heftîkê de winê hêlin ko malik lê li mîratê bigerî.

-Lo bavo, got Qasim. Ez razî, yên ko didin razî, di ka bêje bê tu çi dixwazî?

-Ezê çi bixwazim, got Keya. Bixwazim, bixwazim qey çayekê ji te bixwazim. Ew jî ko tu bidî malî ava. Ko tu nedî, jixwe em weke hev.

-Ha wilo lo. Nexwe zarono yek ji we bere rabî, çayekê ji me ra çêkî, de devê me vala nemînî, got Qasim. Ko em vala dimînin, em li bin hertiştî dike-vin.

Vê sibahê kesik ji gundiya nehata bû mala ko Qasim lê dima. Pêwanê dilê wî neva ko ji nav livîna derkevî. Ko li derî nehata xisitîn, hey tiştik li kirinê nebû, zû bi zû nedirabû jî. Bêyî dilê xwe ji livînê derket. Çû derî ji yê hatî ra vekir. Rê da Keya û sê gundiye pêra, de bibhurin hindiru. Livînê xwe da hev, piştî ko cih şanî wana da.

-Emê herana deverekê, got Keya. Me diva bû ko tu jî bi me ra bêyî. Tu jî kesekî darîçav î. Wê arî-kariya te jî gihêjî li pêkanîna wî karî. Hey îroj ka-rê te nîne.

-Cihê ko win herinê ne dûr bana.

-Emê herana Gundik Hacı Mirad. Dîsa Hacı û kurê xwe yî mazin li hev xera bûne. Berî nûha em carekî din çûbuñ. Lê me wana li hev neanî. Hacı dîsa xeber şiyandivê ko em herin. Tu jî bi me ra bî, heye ko bi ya te bikin.

-Ezê ne bi lingê xwe, bi serê xwe bêm. Ez bibi-hîzim ko wî hewalik li Hacı hatiye, ma dibî ko ez neçim. Em ne nasê roj û miha, yê sala ne. Ma min hindik dan û sitandin pêra kir, ji xeynî dan û sitandina ko em bikin. Gelo çi hawala wana ye?

-Ser pêmayîya Hacı Mirad ew û kurê xwe li hev ketine.

-Ne Hacı sax e. Pêmayîya çi. Ma kes di saxîya bavê xwe de pêmayî jê xwestiye. Ko daxwaziya ci-hêbûnê bikirana, yek kari bû tiştêkî di nav wan de bêjî. Lê nûha emê herin çi bêjine Hacı.

-Tu di wê yekê de rast î. Lê ne wilo ye. Ev pêmayî ne ya Hacı ye. Ya bavê Hacı ji malê bê tiştêkî avêti bû. Bedlik livîn jî nedabûyê. Hacı Mirad, nevyê xwe Ferhad nedabû bavê wî. Wîna li cem xwe hişti bû. Weke kurekî xwe wîna mazin kiri bû. Dema ko Hacı Mirad mir, tev mal û milkê xwe da Ferhad. Tiştik jî kurê xwe Hacı ra nehişt. Lê Ferhad bi ya bapîrê xwe nekir piştî mirina wî. Ew û bavê xwe, weke du bira di ser mal û milkê bapîrê xwe ma. Heta doh pêrkê weke du bira bihevre bûn. Bê çi bû, çi qewimî, rahiştine hevdu.

-Nexwe wilo. Wala Ferhad xortekî bieqil bû. Çima vana dikî. Ma gundik sihhê û nivê gundê Tîru-wa têra wana nedikir. Ma dost û dijminê xwe neanîn ber çavê vîna nû derketim. Bi zikê birçî ezê herime ku derî.

-Tu nexwî çêtir e, got Keya. Nû ko em çûn, wê Hacı berxekî ji me ra bidî gurandin. Hingî tê çêtir bixwî.

-Ev jî rast e, lê divê ko tiştina bixwim. Li ber birçîtîyê qels im.

Piştî têrbûna Qasim bi rê bûn. Berî nîvro li gundê Gundik Hacı Mirad bûn.

Institut kurde de Paris

Gund, di du rexê newaleke serjêr hatibû avakirin. Mendera Çelebî li taxa gund î milê çepê, li serê gund bû. Menderê ji avayiyê serê gund bilindtir bû. Her demê şevê havîni ba xwe lê digirt. Pêwanê serê menderê êvara gelek hînik bû. Kelkela germa rojê havîna zilamê bendê Çelebî, piştî şîva dihatin ser banê menderê.

Ji terqîna sibaha ve heta êvara li zevîya, li serê çîya, li nav dar û devîya xelkê gund ji germê diqelîyan. Wê çavê wana lêbî, de berî kêlikî din bibî êvar, de herin ser banê mendera Çelebî, xwe hînik bikin. Heta derengîya şevê ji xwe re li wir bin. Piştra bela bibin malê xwe.

Çelebî berî ko bibhurî malê, dît ko wî çend kes dîsa li ser mendera wî ne. Ji devê deriyê hewşê vejerîya. Zîvirî derenca pişta menderê. Derket serê bîn. Yê li serê bîn bi hatina Çelebî ra ji ber rabûn. Çelebî destê xwe ji wana ra hilda. de runin. Çû ser merşa devê derenca hewşê raxistî runişt. Xwe pal da ser balgihê ko danîn ber tihêla wî.

-De biaxivin, got Çelebî bi ken. Hey berî ko ez bêm win di derheqî tişteki de diaxiftin. Ji cihê ko win lê mayî bidomênin. Ez jî ji xwe re guhdarî bikim.

-Cihê ko tu lê axaftin li me nakevî, got yek ji yên li wir. Heta derengîya esrê em li derî gundin. Emê çi bibînin de qala wê bikin. Tu li gundî û her tiştî dibîni, an dibihîzî.

-Ez îşev ji axaftinê wastiyam, got Çelebî. Ya baş ew e ko win bêjin, ez guhdarî li we bikim. Heta hingî ezê bihna xwe berdim. Ko talfiya xeberdanê giha min, hingî ezê dest pê bikim.

-Em li ser tiştî ko Ferhan kirî diaxiftin, got yekî ji wana. Ma ya ko wî kirî, karê kurebava ye. Emê bêjin nehişt ko hine weke me sewalê xwe bibin ser sarince avbidin. Em ew li ku bî, emê peşkek av ji sewalê xwe re pêk bînin. Wê ji sê çar sewala çi derkevî. Em karin ji çalê ava vexwarina xwe jî wana avbidin. Lê yên ko zeviyê wana li dora sarincê wê çi bikin. Der ji avdana sevala biqere, peşkek ava vexwerine nahêlî ko bidin wana. Emê bêjin, ava vexwarina xwe ji malê xwe birin. Bi wî awayî mîneta wî li xwe nekirin. Lê ew sewalê bêdev û bêziman wê ji têhna çi bikin. Ne wê ji têhna biqelin. Çi heqê wî li wana heye. Peşkek av li çiyê nema. Çal hemu ziwa bûn. Ava mayî jî di sarincê de ye. Ferhan zilamekî xwe danîye ser sarincê. Nahêlî kesik ji benda me sewilîk av jê dagirî. Hebî nebî kes û sewalê benda wî. Sarinca ya wî an ya yekî ji benda wî bana, dîsa xem nedikir. Menê bigotana sarinc ya wana ye, kesê ne bi dilê wana, karibûn av nedinê. Lê sarinc ya gund e. Heqê tev gundîya têda heye. Lê wî bi darê kotekê ew ava sarince bikar tînin.

Navê Torê û mehteşîyê bi hev re tê gotin. Kezaba Toriya her havîn li ser peşkek ava qerisî dişawitî. Ne gundik an du gund. Di bîst û pênc kîlometir çarçik de cihê heyî, tevlu gund û bajar, hemu ji bêavî dikalin. Ew tu bêjî qurtik av ji binê erdê dernakevî. Her mal, her gund û bajar têra xwe çal, bîd û sarinc kolandine. Li hewşa xwe, li

ber zevî û razê xwe, li çîya. Li baranê dimeyzênin. De bibarî. de çalê wana ji ava baranê bê dagirtin. Ji barankê heta bara din, ew ev e. Ew genî bibî, ew kurm biavêjiyê, ew biqedî. Ko ew jî nebî, Torî ji Torê diterqin. Malê xwe bar dikin, diçin cihne dûr î avî. Li wada dimînin heta dema baranê.

-Ji xeynî wê, ti keda wana têde nîne, got yekî din. Berî her tiştî, sarinc di nav zevîyê me de ye. Berî baranê me sarinc ji waqas kevir û axa binê paqij kir. Me cuwê vekir. Ko ne ji me bana, dilopik av nediket sarincê. Dema ko ev kar dikirin, ew li ku bûn. Piştî tev çalê li çiyê çikîyan, sarinc hate bîra wana. Tu ji wana bipirsî, wê bêjin em li ber hev bûn, menê çawa karî sarincê bi hev re bikirana. Lê dema ko me sarinc baqij dikir, bere ew jî çalê dora sarincê baqij bikirana. Ma menê bigotana çima win wana paqij dikin. Me tişteki wilo bigotana, hingî heqê wana hebû. Destê xwe nedan wana jî. Çalê taxa xwe yî li çiyê bitenê paqij kirin. Dîsa me çalê vê taxê paqij kirin. Kî ji me heta îroj çû ser çalê taxê wana. Dema ko di çalên wana de av nema, vegeyîyan çalê me. Ko av di wana da jî nema, vêga vegeyîyan sarincê. Bi kurtayî, dilê wana çawa bixwazî, wêna dikin. Emê bi sad lavlavî sewilik av ji sarincê dagirin. Ne ev nabî lo. Ne karê kurebava ye.

-We herduwa jî rast got. Win weke mêrxasa axiftin, got Çelebî. Di ka were vê axaftinê bi wana bidine gotin. Ne nabêjin. Win dibînin ko zordestîya li me dikin. Wî hatine dest danîne ser sarincê. Bi lavlava, bi xêre dê û bavê win dibînin ko tiştik naçî serî. Divê ko em tişteki bikin. We, wî tiştî negot. Di ka wêna jî bêjin.

-Tiştik li kirê hebû, got yekî din. Dema ko şivanê te û şivanê wî li ser sarincê pevçûn, te sewalê xwe ji ser sarincê nekişandana. Bere hingî tiştê ko bibuwana, bere bibana. Lê wî te sewalê xwe ji wir kişand. Te hol ji wana ra hişt.

-Pevçûna çî, got Çelebî. Tu pevçûn û lêdanê weke hev digrî. Navê ya buyî ne pevçûn e. Heta

ko ji wana hat li şivane min dan. Li ser pîya ji lêdanê dihejîyan. Têra wana li wana xisti bûn. Ma min ji kêfa xwe wana ji ser sarincê kişand. Cuwamêra bi darê zorê ji vir berdana me. Çend kes ji me çûbûn hawara şivana. Têra wana jî li wana xisti bûn. Ne we bi çavê xwe dît.

-Şivan û yên çûn hawara wana, got yekî din. Çima çend kes ji wana li wir dirêj nekirin. Meyzandin ko ew ji wana nayê, hema bere xwe bi wana bidana kuştin. Ma ew jî ji wana nedihat. Helbet wê hin derketena de heyfa wana hilênî.

-Ma win dibêjin me der ji wana qerîyaye, got Çelebî. Dîsa heyfa lêxistina wana li wana namînî. Win nabêjin çima ji êvarê ve tu li nav gundî. Siba emê hevdu li ser xeramana bibînin. Emê bibînin bê destdanîna ser sarincê, lêdana şivana û yên ko çûn hawara wana çawa ye. Ez çûme mala we jî. Lê min we li mal nedît. Minê bigotana we jî. De win jî vê biryara me zanibin.

Ser vê xebardana Çelebî, devê yên li serê bên di cih de hate girtin. Serê wana kete ber wana. Nema zani bûn bê çi bêjin. Hew xeber ji devê wana derket. Tiştê ko wê siba bê serê wana, yeko yeko di ber çavê wan de bihurî. Nema li hinikayîya şevê gerîyan. Divan ko kêlik berî kêlikê rabin herin malê xwe. Dibin çavê xwe de li hevdu meyizandin, de yek ji wana rabî, de ew jî di payde rabin. Çelebî ser qelqa wana, tê derxist. Bê axaftin ji cihê xwe rabû, di derencê de xwe berda xwar. Yên din yeko yeko bêdeng belayî malê xwe bûn.

Wê rojê mamoste Heval paqijîya mezela xwe yî razan û runiştinê, şuştina xwe û cilê xwe qedand. Çû çayeke xwe çêkir. Di hindurêwê mezê de çend serî çû û hat. Ber masa xwe yî xebatê runist. Pirtuka ji doh ve dest bi xwendinê kirî vekir. Bi vewxwarina çayê ra dest bi xwendinê kir. Qederekê xwend. Dîsa rabu di hindiruwê mezê de çend serî çû û hat. Kir ko tiştina binivîsî. Çelebî kete hindiru di vê navivê de.



-Rojbaş mamosteyê delal, got Çelebî, berî ko rahêjî destê wî.

-Rojbaş Çelebî. Fermo bibhure rune.

-Va ez runiştîm, got Çelebî, piştî ko li ser sandaliya nîşe dayê runişt.

-Hema ez dibêjim tê çayekê jî wexwî.

-Ko tu bidî min, çawa venaxwim.

-Ko tu xwarina ji min nexwazî, got mamostê bi ken. Çay sehl e.

-Lo bavo bere xwarin ji te ra hebî, ez ti xwarina navim, got Çelebî, piştî ko mamoste rabû de çayekê jêra bênî.

-Ev çend salin ko ez bixweser im, got mamoste li vegeerê. Mere ko ji min bê ez xwarinkê çêkim. Dikim nakim ji min nayê. Ez ji xwarina tiştê ziwa, wexte ziwa bibim.

-Ne em dibêjin yekê xwe bêne. Tu bi ya me nakî. Ez dibêjim carna wêra mala min xwe têr bike. Tu li xwe nanihî ko bêyî. Tu qîma xwe bi xwarina me nayênî. Di ka bêje ez çi bikim.

-Ne ko ez qîma xwe bi xwarina mala te nayênim. Ez jî yekî weke te. Bê wê çi xwar ezê jî bixwim. Lê ne roj û mih in. Zivistanik û beharikê iz li gundê we me. Nabî ko ez bêm bêjim ko min têr bikin. Ew nabî. Lê ya baş ew e ko win yekê ji gundê xwe bidine min.

-Fermo. Va keçikê gundê me li ber te ne. Lê vêna xweş zani be ko em xweşikê xwe nadin te. Ew yên me ne. Ji yên din bê te kijan xwest, ser çava.

-Heyla tu çavê min î. Nexwe yên xweşik ji we ra. Hema bere yen din jî ji we ra bin. Ezê çi bikim ji wana.

-Ne min henek kir. Xweşikê me jî fidî çavê te.

-Çavê te sax bî Çelebî. Min jî bi heneka got.

-Min jî tê derxist ko te henek kir. Nexwe min ew tişt digot.

-Xem nakî. Carna henek jî baş in. Lê tu çima xwîya nakî. Ev çendikê tu li ku yî.

-Ez ne li deverekê bûm. Li gund bûm. Lê min serî li te neda. Iroj tu hatî bîra min. Min zani bû ko îroj zarok li dora te nînin, tu jî li malê yî, min got ezê herim serîkî lêxim. Bê çi dikî, çawa ye. Ezê berî nûha jî bihatana, lê gurdîyê me ji welatê der vegeyîyan, min serî li wana dida. Tu zanî ko gundîyê me serrê beharê ji gund derdikevin. Havînekê ji xwe re li bajarne din kar dîkin. Payizê divegerin. Çendik ji wana man. Ew jî wê îroj, siba vegevin.

-Min jî vegeva wana bihîst. Nêra min jî li çûyina ba wana hebû. Te divê piştî nivro em bi hev re herin serîkî li wana bidin.

-Tê qenc bikî ko serîkî li wana bidî. Wê kêf-xweş bibin. Lê ko tu neçî jî dibî. Tu kesekî xwedî-kar î. Ti gazina ji te nakin ko tu neçî jî.

-Bi çûyina min lingê min namehin. Iroj li kirinê tiştik jî nîne. Ko serîkî li wana bidim, baş e. Deverê dîtî, tiştê hatî serê wana wê ji min ra bêjin. Gelo ji kar tiştik di destê wana de maye?

-Gerek mabî. Ma ji bonî çi ev havînekê li derve ne. Ew e. Têra aboriya xwe yî zivistanekê bînin, besî wana ye. Zilamê Kurmanc wê çi perê zêde bikî. Ko perene zêde ketin destê wana, yan wê jinekê biravênin, yan wê kesekî bikujin. Dîsa ya baş ew e ko perê hindik bikevin destê wana.

-Tu di vê yekê de jî heneka dikî. Nexwe çima perê zêde bere nekevî berîka wana. Hingî hewceyîya wana î derketina derve namîni. Wê bi wan pera sewalne xwe kirin. Ew hirî ye, kej e, run e, panîr e, sixilê wa ye, eyarê wa ye. Wê firoşin. Weke insana wê li mala xwe, di nav zarokê xwe de mînin. Vaqas rebanîya, şepirzetîya nakişênin.

-Kî? Wê gundîyê me vana bikin? Bi hêdfika bêje de kesne ko me nasnakin, nebihîzin. Nikarin

zarokê xwe xwedî bikin, wê sewala xwedî bikin û vaqas tişta ji wana bisitênin. Di ka bere pêşî zikê xwe têr bikin, piştra.

-Dema ko tu kerîk paz xwedî dikî, ew çima nikaribin çil pêncih sewalî xwedî bikin. Çi yî te ji wana zêde ye. Biqasî şivanê. te jî nayên ma. Ev yek. Yan diduwa. Ko ew hebin wê zikê wana û zarokên wana têr bibin. Zik ji ber xwe tèn nabî. Ji bedêla ko herin hevînekê karê xelkê bikin, wê karê xwe bikin. Ma tu û ew kesên ko karê xwe bi wana didin kirin, win destê xwe didin tiştêkî. Ne ew kar dîsa ji aliyê wan gundiya tèn kirin.

-Tu di vê yekê de çewt î. Kirina karê xelkê û pêkkirina karê xwe ne weke hev e. Ez wî mêrî bibînim ko karê li dest pêk bênî. Nûha kerîk sewalê min hene. Ne ji zevî, raz û werzê min bana, ma min kari bû ez wanên xwedî bikim. Enceq bi hatina herdu ciha ez jî bin barê wî sewalî dirabim. Ew, wê bi kîjan heyîne xwe sewala xwedî bikin. Ko zikê wana têr, ne tazî bin, besî serê wana û bavê wana ye.

-Ez jî nabêjim bere di derbekî binin xwedîyê kerîk paz. Hino hino? Isal deh, sala bê bîst. Ji bonî xwe dikirina sewal ne hewce ye ko zevî, raz, xerz û werz hebin. Va evqas çiya li ber wana ye. Di beharê de li her deverî geya heye biqasî ko tu nexwazî. Bere wana biçinin, hilênin zivistanê. Havîn û behara jî, dîsa biqasî ko tu nevê çêrî.

-Ev çiyayê ko tu dibînî têra sewalê min û Ferhan enceq heye. Li ku ma sewalê gundiya. Emê bêjin çiya têra teva kir. Ne, divê ko her tim bi wî sewalî ve girêdayî bimînin. Hingî wê kî herî karê derve. Ne ew sewal çend sala têra wana nakî. Wê hingî çî bikin. Ev ne mamostetîya te ye ko zarok bèn li ber te runin. Tu tiştina bêjî wana û bere herin malê xwe. Ne debirandin û ne hewandin.

-Ew kar ji mamostetîya min gelek sehtir e. Ma tu zanî ez di çend sala de bûm mamoste. Ew ne pêwist e ko yazdeh salê xwe bidin vî karî. Erê

wê çend sala zehmetî bikêşênin, lê piştra we derkevin farahîyê. Her tişt bi vî awayî pêktê, got Heval berî ko rabî herî çayê xwe û Çelebî ji nûve dagirî.

-Di ka pêşî bere bibin xwedî sewal, piştra emê li ser vî tiştî biaxivin. Ka bê tu çawa yî, wêna bêje.

-Ha wêna bêje, got Heval ser vegeê em kesna betal in. Nexwe divê ko axaftina me jî ya batalîyê bî.

Çaya Çelebî danî ber. Rahiştê çaya xwe û çû ber şibaka mezelê. Çend qurt lê da. Di vê navîyê de sê, çar zilam bi baz hatin xermanê binya dabis-tanê. Hine din, di pay wan de hine din hatin. Xerman ji zilam tiji bû. Bune du bend û qîr dane hevdu. Bi kevira penihtine hevdu. Ji alîkî pevdiçûn, ji aliyê din, xeber digotin hevdu û wasifdanê xwe didan.

-De vêca, got Heval. Kura gundîyê te rahiştine hevdu. Şerekî zor bi hev re dikin.

-Guh mede wana, got Çelebî. Qey bêriya şer kirine. Bere bihna xwe li hevdu berdîn.

-Ne, ne karê bihnberdanê ye. Bi kevira hevdu dikujin. Her kevirik ji berikî tifingê xeraptir e.

-De der ji xwe biqere bajarîyo. Ma wê bi çi pevbiçûwana. Weke we bi sixêfa ma. Helbet wê bi kevira pev biçin. Şer û pevçûnê me gundîya wilo ne. De ji xwe re bibîne. Ko tu vegeerîyayî bajêr, ji bajarîya ra bêje.

-Kura ev ne dema heneka ye. Wê hevdu qelênin.

Mamoste Heval di cihê xwe de nederawestî. Serî kêlîkekê serê xwe ji şibakê derdixist. Dîsa xwe dikişande hindîru.

-Hawara gidî. Ma kes nîne ko vana navcî bikî. Ha ye ko hevdu bikujin.

-Ne min gote te. Guh nede wana. Tu ji xwe re li wana meyzêne. Bê çawa hevdu dibin û tênin.

Heta ko hina ji hevdu nedin erdê, der ji hevdu naqerin.

Tebata mamoste Heval di hindiru de nehat. Bi lez derkete derve. Çû, di nivê xermanan de rawestî. Kete nav cihê şer û herdu destê xwe rakire hewayê.

-Birano, got bi dengekî bilind. Der ji hevdu biqerin. We hevdu kuştin gîdî. Win çî ji hevdu divên.

-Mamoste, got yek ji nav pevçûnê, bi dengekî bilind. Der ji me biqere. Ji nav me derkeve.

-Ez ji nav we dernakevim, got Heval. Va li vêdê rawestî me. We divê min bikujin.

-Mamoste, got dengekî ji aliyê din. Tu xwe bide alîkî. Wê derbin li te bikevin.

-Lo seheta we nexweş, got Heval bi xwedana alîkî. Bê wê bi pevçûnê çî bigihî destê we. De pev biçin.

Bi baz ji nav wana derket. Kevirik li serê yekî ji wana ket di vê navîyê de. Qerpên ji serê zilê hat. Di cihê xwe de zîzîkî û di cihê xwe de ket. Weke mirîşka serjêkirî, di çihê xwe de diparpitî. Heval gavê xwe şidand. Yekser kete hindiru. Bi hêrs li Çelebî meyzand. Dîsa çû ber şîbakê.

-Va miradê te bû, got Heval. Va yek ji wana ket. Bere dîle te rehet bibî.

-Tu neçûwana çêtir bû, got Çelebî. Navçîkirina wana ne karê te bû. Dema veqetanê ew çêtir ji herkesî zanin.

Ev rast e, got Heval. Ma bi min pevçûn, de bi min ji hev veqetin. Min nûha tê derxist. Hatina te yî vêdê, ne dîtina min bû. Te va ko xwe li vêde veşêrî. Dema ko ji te hat pirsîn, tu bêjî, ez li cem mamoste bûm. De ez jî şahidîyê ji te ra bikim tu hatî vir. Kî zanî bê nûha Ferhan jî di kîjan qulê de ye. Ew jî guhdarî talîya şer e. Ew jî nûha berbendî ketina kesna ji wana ye.

-Nûha tu çî dibêjî xwedêhebîna. Tu ji gundîya

qehirî. Tu suravka wana ji serê min derdixî. Ya din. Ko bihatana ya xweveşardinê, ma cihne din nebûn ji xeynî cem te. Ko tu neveyî jî, ezê rabim herim. Ma dever nînin li çûyinê.

-Jixwe tê herî. Piştî pevçûnê tê li vir çî bikî. Karê te û Ferhan esas piştî pevçûnê dest pê dikî.

-Berî ko tu li min bixî, ez rabim herim bavo, got Çelebî.

Bi ketina zilêm, pevçûn di cih de bela bû. Di çend daqîqan de xerman vala bûn. Du zilam bitênê li ser serê zilamê ketî mabûn. Gavakî din du kes din tevlu çardarê hatin. Bi wan ra Heval jî çû ser serî birîndar.

-Mamoste, got yek ji wana, bigurî. Ma tu nikarî dermanne li serê wî bidî.

-Birayê delal, got Heval. Ev nekarê dermanê min î serêşê ye. Tu nabînî, serî wîna pelixandin e. Qey ez dora birînê bijom û bipêçim. Tiştêkî din ji min nayê. Divê ko win wîna bigihênin ser doqtor.

-Hema ew bes e. Ko tu wê jî ji me ra bikî, malî ava. Ma bajar li vada ya ko em wîna di cihde bigihênine doqtorna. Ne bi payayî yazdeh seat in. Ma emê wîna ser mila çawa bibin heta qonaxa rojekê.

Heval vegeşîya mala xwe. Rahişte tiştê hewce. Di pay wan de çû nava gund. Ji xeynî zarowa, di nav gund de kesik xwîya nedikir.

-Nûha, got Heval di ber xwe de. Her bend di mala Çelebî û Ferhan de civîn e. Her yek ji wana hesabê perê ko wê di vê riyî de herî dikî. Wê bartîla bidin kî û li herkesî çiqas dikevî. Nûha wana bêş didin. Çawa bibî pevçûnek hati bû kirin û kesik li kuştinê derbik xwarî bû. Çawa bû hêj ji karê derve nû vegeşîya bûn û têra herduwa pere di berikên wan de hene. Heta ko berîka wana vala nekin, kengî rehet dibûn.

Li vegeşê kes ji herdu mala bi serîkî tawandî belayî mala xwe dibûn

## NAVEROK

Paşmêr.....	5
Ger.....	19
Dema Havînî.....	31
Xwînî.....	40
Qolinc.....	50
Jiyana Şepirze.....	65
Beşdarê Kedê.....	75
Davik.....	83

*dewdikere*

nivisandin: TORÎ  
berhevkirin: dengê KOMAL

Siyamend û Xecê  
Ehmed Begê û Xalit Begê  
Fatima Salih Axa  
Eloyê Şêxani  
Menca Eliyê Salim Axa  
Ehmed Axayê Milî

Xezala Kurda  
Musu  
Narencîyê  
Çiçeka Cînî  
Seyrê

## SOL BİRLİK ÜZERİNE

### SOSYALİST DÜŞÜNCELER

N. B O R A

- TKP'nin 1927 Tevkifatı ve muhbir genel sekreter
- Komüntern'in V.Kongresinde TKP'nin burjuvazi ile işbirliği siyaseti
- Kemalizm,TKP ve TİP
- Milli Demokratik-**Ulusal** Demokratik
- Doğulu Sosyalistler-Yön felsefesi
  
- Kürdistan Devrimi
- SBKP Çizgisi
- Pro-Sovyetizm,Türkiye ve Kürdistan
  
- Kürdistan Devrimine Karşı işlenen Suçlar
- DDKD-KİP,ÖY-TKSP,TKDP-KUK
  
- DDKD-KİP Örgütlenmesinin İçyüzü
- ÖY Niçin Bir Yaban Otuydu
  
- Kürt Solunun Labaratuvarı:İsveç Kürt Dernekleri Federasyonu
- KOMKAR Rezaleti
- Stockholm Konferansı
- Demokratik Kitle Örgütlerinde Sol Birlik
  
- Reformist Antifaşizmin Mantıkî Sonucu Olarak Sol Birlik
- Sağ Kanat Sosyalistlerinin İdeolojik ve Politik Muhtevalarının Özü Olarak Sol Birlik
  
- Demokrasi Kuş Mudur-Çiçek Midir
- Burjuva Demokrasisi-Sosyalist Demokrasi





Di sala 1974'an de dest bi jiyana nê di rêzê de bûn, nikaribûn bêne çap xwe ya weşanê kir. Navenda wê li kirin, ji ber ku ji bo wan pirtukan Enqere bû û li bajarên wek Stanbûlê, çapxane peyda nedibû. Bi vî awayî İzmir, Bursa, Diyarbekr, Edene, Bitlis Komal nikaribû karê xwe bidomîne.

Li hember serokwezîrtiyê ya weşanxane 13 dawan hatibû vekirin wê, derxistin û belavkirina weşanan Piştê ku li ser pirtuka "Dosya ya bû. 23 pirtûk weşand. Van pirtukan Dawayên DDKO" ceza hate dayin,ber- yan bi biryarên dadgehê, yan ji bi pirsiyarên weşanxane R.MARAŞLI û daxwaza polêsê hatin komkirin. Li Z.GÜNAY bûn. Li hember Maraşlı 8 hember berpirsiyar, xebatkar û xwen- dawanên wê gelek caran dawa hate wekirin. Di çaxa serokwezîrtiyê Bü- lent Ecevit de, hemu büroyên wê ha- tin girtin û mor kirin. Berpirsiyarên wê hatin girtin. Xebata weşanxane û Z.Günay ji li Stanbûlê girti nin. Mehkemeyên wan li dadgehên leşkeri westandin. Pirtukên ku ji bo weşandi- de didomînin.

## dengê komal

Bi armanca programa Komal, ku xebata wî ya li Tirkîye ji holê hatibi rakirin, li Ewropa pêkbîne dest bi xebata xwe kir. Demekî li Elmanya xebata xwe domand. Niha ji li Swêd kar û barên xwe didomîne

- 24/01 Faşizm, **Rızgari**
- 25/02 12 Eylül Darbesinin Anatomisi, **Rızgari**
- 26/03 Generallerin Kanlı Yönetimi Devam Ediyor (T)
- 27/04 Filistin Faciası, **Dengê Komal**
- 28/05 Ayrı Dur-Ortak Vur, **Dengê Komal**
- 29/06 Unesco'ya Mektup, **İsmail Beşikçi**
- 30/07 Generaller Yargılanmalıdır, **Şerafettin Kaya**
- 31/08 Direnen Diyarbakır, **Dengê Komal**
- 32/09 Savunma, **İsmail Beşikçi**
- 33/10 Sancı, **Orhan Kotan**
- 34/11 Dogmalar Tabular Fanatizm vs., **N.Bora**
- 35/12 Ein Wissenschaftler im türkischen Gefängnis İsmail Beşikçi, **Dengê Komal**
- 36/13 Qolinc, **Tori**
- 37/14 Tu, **Mehmet Uzun**

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

"Ew in ko ji hazar salan  
Li ser serê me bela  
Di enîya me de sixêf  
U kelemçeyên sitûr in  
Li ser destê me yî bihûner de."  
(O.K.)

Ez karim bêjim ko kurtayîya têxistiyên  
çîrokên min di vê helbestê de hatine gotin.  
Li gotinê tişteke dimînî. Ger ko kes nivis-  
kar, nemase Kurd bî, dil dabî serhildan û  
liberxwedana gelê xwe, ew çî biki, di kî-  
jan rewşî de bî, wê dilê vî her tim biqo-  
linc bî. Nikarî xwe ji vê qolincê rijgar bi-  
kî. Wê bi vê qolincê bitevgerî, wê bi vê  
qolincê bijî û bi vê qolincê xwe li bin gu-  
hê kûl û belaya bixî. Bi vê qolincê wê bi-  
rewerî tîj bibî û di talîyê de, weke hoza-  
nê Kurd î şoreşger Orhan Kotan gotî, "Bi-  
rewerî wê li taniya zindana bêxistin".

TORI



K.L.